Arşîva Bîra Kurdan: Ji Michel Verrier gotara bi serenavê “Ji kurdên Iraqê re xweserîyeka çawa?“ (2004)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Kanûna pêşîn 2012 - Hejmar 37 · www.diplo-kurdi.com · info@diplo-kurdi.com · 20 Rûpel

**Jerome Karabel**
Serketina Obama bûyereka dîrokî bû, lê ev serketin li gor encamên hilbijartinan xwe naspêre piranîyeka baş a dengan. Berê serketinên bi vî rengî dihatin maneya guhertineka mezin a siyasetê…
▶ R. 6

**Perry Anderson**
Ewropa ji Şerê Cîhanê yê Duyem û vir ve di kûrtirîn û dirêjtirîn westarîya aborî re derbas dibe. Dewletên xwedî hikûmetên lawaz di bin zexteka wisa de ji hev ketin û rûxîyan…
▶ R. 7

**Agnès Sinaï**
Ajansa Navteweyî ya Enerjîya Atomî li paytexta Awusturya Vîyanayê, li derdoreka bajarê nû yê di navbera rêyên dikevin otobanê û jê derdikevin, di metroya li ser erdê de bi cih bûye…
▶ R. 12

**Anne-Cécile Robert**
Li Afrîkaya Rojava, piranîya welatan di nav aşîtîyê de jî bijîn, sedemên krîzên belavbûyî lê gelek in û îhtîmalên rûdana beîstîqrarîyê rewşa van krîzên belavbûyî girantir dike…
▶ R. 16

**Leila Farsakh**
Agirbesta li Xezzeyê ku Misirê navbêykarîya wê kir, rewşa Hamasê hem li herêmê û hem jî li hundir xurt kir. Li hêla din, NYyê jî serlêdana Filistînê ya ‘dewleta ne-endam’ nirxand.
▶ R. 18

# Bihara ereban, Sûrîye û kurd

Doç. Dr. Abdullah Kiran *

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, bi pêşkêşîya dewletên serketî, di demeka bi qasî 17 mehan de sînorên Îrlandaya Bakur, Yogoslavya û Rojhilatê Navîn hatin kifşkirin. (1) Bi taybetî sînorên ku li Rojhilatê Navîn hatin kişandin, hê ji destpêkê ve pirsgirêk bûn, belê desthilatên siyasî yên ku ji bo îdarekirina van welatan ji alîyê hêzên mandator ve hatin bicihkirin, yekcar serêşî bûn. Dewletên wekî Îngilistan û Fransayê, çaxê bi awayekî fermî dev jî desthilata welatên herêmê berdan, ji bo ku siyaseta xwe ya rêvebirina van welatan bi awayekî nesererast (indirect) berdewam bikin, li van welatên jêvekişiyayî desthilatên hindikanî yên ku ew ê hergav ji wan re dilsoz bimînin anîn ser kar. Li welatên wekî Iraq, Sûrîye û Libnanê, şûna ku rejîmên meşrû yên ku hêza xwe ji piranîya gel dîstînin bên danîn, desthilatên van welatan ji nav hindikanîyên welat hatin bijartin û tayinkirin. Bi vî awayî îdareyên van welatan hem bi hêzên ku berê li van deran mandator bûn re dilsoz man û hem jî ji bo ku bikaribin li ser kar bimînin siyaseteka zordar û totalîter pejirandin. Îcar siyaseteka weha hem li gor berjewendîya hêzên rojavayî bû û hem jî bi ruhê Şerê Sar re li hev dikir. Belê van sînorên bi vî cûreyî tu cara aştî û aramî neanîn herêmê. Sedemeka bingehîn a şer, pevçûn û xwînrijandina li Rojhilatê Navîn ev sînorên ha ne.

Rejîmên hindikanî yên ku ji alîyê hêzên mandator ve hatin ser kar, li Rojhilatê Navîn bi dehan salan serwerîya xwe ajotin. Li Libnanê, piştî şerekî sîvîl ê ku tam panzdeh salan ajot û hema bêje tevahîya welat tar û mar kir, dawî li serwerîya maronîyan hat. Iraq ji sê wîlayetên bermayîya osmanîyan hat avakirin. Her sê wîlayet jî bi awayên dînî û etnîkî, ne di wê keys û rewşê de bûn ku jê welatek yekpare bê avakirin. Wîleyata Mûsilê ji kurdan, ya Bexdayê ji sunîyan û ya Basrayê jî ji şîîyan pêk dihat. Her sê der jî bi awayên civakî, siyasî û desthilatî xwedan tecrûbeyên cihê bûn. Belê îngilizan ev derên ha wekî pîne bi hev ve girêdan, navê Iraqê lê kirin, desthilatek sunî anîn ser kar û Mîr Feyselê Hîcazî wekî padîşah danîn ser welat. Melîk Feysel û peywirên wî heta sala 1958an, heta ku bi derbeyeka leşkerî ji desthilatê bên dûrxistin Iraqê îdare kirin. Derba leşkerî dawî li desthilata wan anîbû, belê sunîyên ku %25ê civatê pêk dianîn hê jî li ser hikimê bûn. Rejîma sunî ya li Iraqê heta sala 2003an li ser kar ma û pîşt re bi saya Amerîka dawî li desthilata wê hat. Belê vê carê li welat şerek sîvîl di navbera sunî û Şîîyan de dest pê kir, ku hê îro jî berdewam e. (2)

Îcar ya ku hat serê Libnan û Iraqê, ne dûr e ku were serê Sûrîyeyê jî. Bihara Ereban a ku di 17ê çirîya paşîn de li Tûnisê dest pê kir, heta niha li welatên wekî Tûnis, Misir û Lîbyayê dawî li rejîmên kevin anî. Xên ji Lîbyayê, li derên din bêyî ku zêde xwîn birije û hewcedarî bi têkûlbûna hêz û dewletên derve hebe, desthilatên siyasî guherîn. Gava ku cara pêşîn di 15ê Adara 2011an de bûyeran li Sûrîyeyê rû dan, gelek kes fikirî ku ew ê rejîma Bişar Esad nikaribe zêde li ber xwe bide û di demeka nêzik de bikeve. Li gor texmîna Rîad al Shaqfa, ku Serokê Rêxistana Birayên Misilman ên li Sûrîyê ye, tenê çend meh jîyê rejîma Bişar mabû û ew ê biketa. Wezîra Karê Derve ya Amerîka Hillary Clînton navê “mirîyê ku dimeşe” li Esad danîbû û li gor texmîna Wezîrê Parastinê yê Îsraîlê, ew ê Esad bi tenê karibûya çend hefteyan di ber xwe bida û dû re biçûya. Ji xwe Serokwezîrê Tirkîyê Tayyip Erdoğan hê di Hezîrana 2011an de rejîma Esad devreyî hiûqî îlan kiribû û li bendê bû ew ê tafilê bikeve. Belê ev gotinên ha ji hêvikirinê wêvetir neçûn. Heta niha di navberê re 20 meh derbas bûn, lê hê jî Esad di ber xwe dide û kifş e ku nîyeta wî ya berdanê jî tuneye. Şerê li Sûrîyê her çiqas dîçe bêtir belav dibe û eşkere ye ku potansîyela derbasbûna welatên cîran jî di nav xwe de dihewîne. Kuştina sîvîlan, rûxandina welat û koçberîya bi sed hezaran, bivê nevê bangên têkilbûna ji derva jî tînin rojevê.

▶ R. 4



Mohammad Ismail: **Bênav**, (Detay)
mirekeb li ser kaxeza rengîn, 70 x 50 cm

Hevpeyvîn

# Salih Muslim: Hêzên me ji bo her cure geşepêdanê amade ne!

Ali Güler

Serokê PYDyê û endamê Destaya Bilind a Kurdî **Salih Muslim** dîyar kir ku li Sûrîyeyê hêza herî bi rêxistînî kurd in û bi pêkanîna hêzên parastinê li herêmê gele xwe diparêzin. **Muslim** got, em ê li dijî êrişên Tirkîyeyê jî bi heman metodê bersiv bidin.

Serokê PYDyê û endamê *Desteya Bilind a Kurd* **Salih Muslim** ku li Başûrrojavayê Kurdistanê bi navê **'Bavê Welat'** tê nasîn ji bo hin pêwendî û hevdîtinan hat Almanyayê. **Muslim** bûyerên li Sûrîyeyê rûdidin wekî alozî tarîf kir û îdîa kir ku li tevahîya welat berxwedaneka cîdî tuneye û got grûpên li ber xwe didin jî belavbûyî ne û ji hev bê haydar têdikoşin. **Salih Muslim** bal kişand ser rewşa kurdan jî û wisa got: *“Em bi sazîyên xwe û bi hêzên xwe yên parastina gel hêza herî birêxistînî ya Sûrîyeyê ne. Ev hêzên parastinê bi armanca ku gelê kurd ji her cur xetereyan biparêzin hatine avakirin. Ger Tirkîye an jî hêzeka din êrişî herêma me bike em ê bi heman metodê bersiv bidin.”*

**Li Sûrîyeyê û Başûrrojavayê Kurdistanê niha rewş çawa ye?**

Li Sûrîyeyê rewş niha gelek krîtîk e, ji bilî dengê çekan tu deng nayê bihîstin. Li Kurdistanê jî rewş hinekî aramtir e. Lê em nizanin di dahatîyê dê çi biqewime, rûdanên çawa pêk werin. Ji niha de texmînkirin bê îmkan e. Rewş gelek tevlihev û aloz e.

**Li gorî we li Sûrîyeyê dê di dahatîyê de rûdanên çawa pêk werin?**

Tevlihevî û alozîyeka gelek cîdî heye. Ji destekî zêde dest hene li nav Sûrîyeyê. Ji El-Qaîdeyê heta grupên curbicur ên mixalif. Her grûp bi serê xwe li dijî rejîmê têdikoşe. Çi yekhevîyek û çi jî biryareka hevkar heye. Ji ber vê yekê ji niha de tiştek texmînkirin ne mimkin e. Lê em li hewaya welat û geşedanan binêrin, wisa xuya dike parçebûna Sûrîyeyê di rojevê de ye. Lê **Beşar Esad** jî dev ji desthilatîyê bernade, li ber xwe dide. Bi kurtasî ji bo dahatîya Sûrîyeyê tiştek gotin gelek zehmet e. Tiştê ku bi tenê tê zanîn jî her roj mirina bi sedan kesan e.

**Di nav vê rewşa tevlihev de rêxistinîbûna kurdan di çi merheleyê de ye?**

Hem ji alîyê sîyasî ve û hem jî alîyê leşkerî ve em rêxistinbûnîya xwe ji her alî ve pêşve dixin. Em bi awayekî vekirî dikarin ragihînin ku hêzên me ji bo her cur geşepêdanên ku li Sûrîyeyê rûbidin amade ne.

**Gelo li herêma kurdan niha sazîyên dewleta Sûrîyeyê û artêşa Sûrîyeyê çalakîyên xwe didomînin?**

Rejîma Sûrîyeyê hemî hêzên xwe paşve kişandîye. Di hin herêman de hêzên gelek biçûk mane, lê ew jî vekişîyane sazîyên xwe. Nikarin tu tiştekî bikin. Bi rastî dewlet naxwaze li herêma kurdan jî enîyek şer li dijî xwe vekê. Tenê li Qamişlo û hin deverên biçûk çend teqînên biçûk pêk hatin. Ew bûyer jî di navbêra hêzên dewletê û *Artêşa Azad a Sûrîyeyê* de rûdan. Li derdora sînorê Tirkîyeyê jî bûyerên bi vî rengî diqewimin. Teqînên li Akçakaleyê (Kanîya Xezalan/Til Ebyed) di encama van şeran de bû. Lê niha di navbera hêzên me û artêşa dewletê û hêzên mixalîfan de tu şer neqewimîye heta niha.

**Li gorî we li paşxana teqîna Kanîya Xezalan (Akçekale) kîjan hêz heye?**

Li ser xetên sînorê di navbêra hêzên dewletê û grûpên mixalif de her roj şer derdikeve. Herdu alî jî çekên giran bi kar tînin. Lê em nizanin guleyên topan ên tên avêtin aîdê kîjan hêzê ye. Ez texmîn nakim ku ev êriş jî bi hişmendî çêbûbe. Lê divê ez vê yekê jî bejim; bi qasî ku em dizanin topên ewqas mezin tenê di destê dewletê de hene.

▶ R. 3

www.arsivakurdi.org

*EDITO*

# Li Xezzeyê her tişt hêsan e...

SERGE HALIMI

*Tu welatê dinyayê qebûl nake ku roketên ji derveyî sînorên wê avêtî bi ser welatîyên wê de bibarin.*" Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi danezana vê tesbîta eqlê selîm, li filistînîyên Xezzeyê nedifikirî, li wan filistînîyên ku qurbanên bombe yan jî fuzeyên îsraîlî ne, yên ku carinan ji F-16an yan jî helîkopterên Apache yên li Amerîkayê hilberandî tên berdan.

Ji salan û vir ve bi birêkûpêkîyeka tûj û dijwar, heman şaşî bi teql û hêdî têkîlîya bûyerên li filistînî îfade dikin. Pêşî ya ku pirgêsinîkirina çîrokeka êdî bawerî pê nayê pêk tê, di vê çîrokê de "terorîzma" yên dor li wan girtî "bersiva" yên dorê li wan digirin teqez rewa dike. Paşê, cezanebûn û destpênebûna şervanekî bi xurtbûneka pir zêde ya eskerî gurçûpêçkirî yê ku hema berîya handaneka eskerî û çekdarî bide destpêkirin, rengê mexdûran dide xwe. Ya rastî, ya ku nirxê xwezaya demokratîk pêk tîne, ango hikûmet, rastgirên tundraw ên nijadperest dihewîne ku di desteya wezîran de wezîrê karê derve yê heyî nûnerîya wan dike.

Gelo Bihara Erebî wê evqas kêm tişt biguhertana heke li Rojhilatê Nêzîk çar salan piştî operasyona "Risasa Qalibkirî" bi tenê yek senaryo karîbûya ji bo Xezzeyê pêk were? (1) Hussein Agha û Robert Malley veguherîna herêmê ji 2011an vê analîz kirin û elaqeya kêm a şiroveyên fenomenê yên adetî derxistin holê: "*Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hevgirên Iraqê ne ku bi xwe hevgira Îranê ye û ew jî pişta rejîma sûrîyeyê digire, Dewletên Yekbûyî dixwazin vê rejîmî hilweşînin. Dewletên Yekbûyî herweha hevgirên Qetarê ne jî ya ku Hamasê fînanse dike, ew hevgirên Erebistana Suûdî ne jî ya ku selefîstan fînanse dike, îlhama cîhadîstên ku biryardar in amerîkîyan bikujin.*" (2) Qet nebe li Xezzeyê tiştan pêşî hêsan xuya kir... Ji ber ku pişta namzedê komarparêz Willard Mitt Romney girt, û bi têkçûna wî re lawaz bû, Benyamîn Netanyahû ew hesab kir ku li ser pişta filistînîyan rewşa xwe ya ji bo hilbijartinan baştir bike. Ango, ew weha fikirî, bombekirinên bajarên îsraîlî wê ferz bikin ku careka din Hamas were cezakirin, li gor wî ev yek wê pêşîyê li Hamasê negire. Wî bi tenê "ji bîr kiribû" ku avêtina roketan ji Xezzeyê 10ê sibata 2002an dest pê kiribû, ango serdemeka ku erdên filistînî hê... ji alîyê Îsraîlê ve dagirkirî bûn.

Di vê bûyerê de helwêsta Ewropayê tevgera wekî şaxekî dîplomatîk ê Tel-Avivê bû. Û Franseyê bi tenê li vê rêzê hêz zêde kir. Destpêka çirîya paşîn, li pêşîya serokwezîrê îsraîlî, serokkomarê Franseyê François Hollande got, karekî bikêr e ku mirov erza Birêveberîya Filistînî bişkîne, lewma li gor wî ew pir dildar e "*here li Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li tiştê ku ew di hevdîtinan de bi dest naxe, bigere*". (3) Gelo wî tam behsa kîjan hevdîtinan dikir? Çend rojan piştre, wezîrê karê derve [yê fransî] Laurent Fabius bi kurtî bi van peyvan sedemên krîza Xezzeyê rave kirin: "*tevahîya dawîya hefteyê rokêt avêtin Îsraîlê; û li ser vê, Îsraîlê bersiv da.*" (4) Gelo întîhal û dizîya daxuyanîyên fermî yên amerîkî veguherî çarenûsa dîplomasîya fransî?

(1) Gotara li jêr bixwîne: "Abandon de peuple / Terikandina Milet", *Le Monde diplomatique,* sibata 2009an.

(2) "This Is Not A Revolution / Ev ne şorişek e", *The New York Review of Books,* 8ê çirîya paşîn a 2012an.

(3) Gotara li jêr bixwîne: Alain Gresh, "Palestine : Hollande en recul par rapport à Sarkozy / Filistîn: li gor Sarkozy Hollande berepaş diçe", blogên Diplo, 2yê çirîya paşîn a 2012an. Herweha gotara Leïla Farsakh jî bixwîne: rûpel 8.

(4) RTL, 15ê çirîya paşîn a 2012an.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 100 cm



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 100 cm

# Jacques Rancière, huner û siyaset

ALIOCHA WALD LASOWSKI

Çawa mimkin e ku demokrasîyek destûrê bide merivî ku xwe bigihîne nivîsên çandê û axaftina siyasî azadtir bibe? Divê meriv çawa bike da ku li dibistan yan jî li kar dengê xwe yê şexsî, û di qada têkoşînên civakî de dengekî kollektîf bide bihîstin? Divê kîjan rêbazan bi kar bîne? Da ku bersiva vê pirsê bide, ji sih salan û vir ve Jacques Rancière sînorên adetî yên ku ya siyasî û ya ne-siyasî ji hev dûr dixin, diguherîne. Nivîskar *dissensus*ê, yanî karê mejîyê ku hîyerarşîya civakî û normalkirina wê dixe ber lêpirsîne binxêz dike da ku fêm bike ka çawa ev qanûnên di siyaset û di hunerê de li me ferz bûne, derketine holê. Du berhem hene yên ku destûrê didin merivî armancên vê helwêsta wî baştir fêm bike: di *Aisthésis* ê (1) de, nivîskar analîza azadbûnê di nav hunerê de amade kiriye, berhema din hevdîtineka deqerû ya bi navê *La Méthode de l'égalité* (2) e. Ew zextê li ser fikrên siyasî û estetîk ya yekbûna hunerê dike û wê dixe ber lêpirsîne.

Di *Aisthésis* ê de, ku dişibe dewama xwezayî ya pirtûka wî a bi navê *La Nuit des prolétaires (Şeva proleteran)* (Fayard, 1981), Rancière bi bîr dixe ku naskirina afirandineka hunerî girêdayî pîvanên xwe tê de dîtinê û yên fêmkirina serdemekê ne, ew in yên ku biryara hunerîbûn û ne hunerîbûna berhemekê didin. Nivîskar behsa sê qadan dike: exlaq (huner di xizmeta fikrên dînî yan jî civakî ne, û bi roleka perwerdeker radibe), temsîl (otorîteyeka çandî hunerîbûna berheman nas dike) û estetîk (wexta di sedsala 18an de huner derîyê xwe ji bo tecrûbeyên nû vedike). Lê nîvîskar li ser qada estetîkê zêdetir disekine û behsa 14 bûyeran dike ku di navbera 1764 û 1941î de deng vedidin, di demên cudakirinê yên hunerî û yên ne-hunerî de ji holê radibe: bi saya Şorişa Fransî vekirina muzeyan li gel, bûyerek e ku rê li ber ji nû ve şirove kirina çandî ya dema bihurî vedike; ketina wêne û tiştên "ne xweşik" ya nav hunerê, ev yek bû sedema nîşandana tiştên ji rêzê -bi vî rengî, Emile Zola di pirtûka xwe ya bi navê *Le Ventre de Paris (Ûrê Parîsê),* ku berhemeka mezin ya bîranîna modernîteya sala 1874an e, behsa lehengekî bi navê Claude Lantier dike. Ew resamek e ku li taxa Les Halles, li hemberî refên goştê beraz û sosîsên li ser wan raxistî matmayî dimîne. Di berhema xwe de nivîskar herwiha behsa Stéphane Mallarmé dike ku sala 1893yan li şanogeha Folies Bergères li lîstikeka şanoyê temaşe dike. Lîstik rêzeka cambaz û qeşmeran nîşanî gel dide, yên ku fikra sabît ji serdema klasîk ve mayî ya mentiqê mimkinbûna tiştan û mentiqê bi zarê kesî kirinê li alîyekî dihêlin. Ev fikir nirxên ji serdema klasîk ve serdest in pêk tînin û çarçoveya şanoya heyî û ya nîzama civakî dîyar dikin. Sînemayê ev fikrên kevin li paş xwe hiştin, wekî nimûne bi Charles Chaplin û Charlotê wî… (3)

Lê belê, gelo meriv dikare bibêje tecrûbeya qadên nû yên hunerê destûrê dide qada siyasî ji nû ve were çêkirin û çawa destûra vê yekê dide? Li gor Rancière, hunerekî hişyar/ siyasî ku îdîa dike dengê civakekê bi awayekî seranser temsîl dike, hunerekî ku îdîa dike dengê azadîya gel temsîl dike, bikêrhatîbûna modela siyasî û helwêstên wê di cih de betal dike. Wisa xuya ye ku fêmkirineka nû ya tiştê tê hiskirin û ya tiştê tê fikirîn bi saya destwerdana ya bîyanî û ji derve tê derdikeve holê û qada tiştên mimkin diguherîne. Bi heman rengî, di mijarên civakî de, siyaset bi xêra zihnîyetên nû yên agahîyan dikare ji nû ve derkevin holê; lê belê ev têgihiştinên nû yên li siyasetê, yên dûrî modela desthilatdarîyê ne, encama "ya ku meriv dikare navê xebata xeyalê li wan bike" (4) ne –ya ku bê guman divê were analîz kirin jî ev e.

(1) Jacques Rancière, *Aisthesis. Scènes du régime esthétique de l'art (Aisthesis. Sahneyên rejîma estetîka huner),* Galilée, Parîs, 2011, 330 rûpel, 32 euro.

(2) Jacques Rancière, *La Méthode de l'égalité. Entretien avec Laurent Jeanpierre et Dork Zabunyan (Rêbaza wekhevîyê. Hevdîtin bi Laurent Jeanpierre û Dork Zabunyan re ),* Bayard, Montrouge, 2012, 332 rûpel, 21 euro.

(3) Rancière paşê bala xwe dide sînemayê. Binêre li *Bela Tarr, le temps d'après (Bela Tarr, dema piştre),* Capricci, Nantes, 2011, 96 rûpel, 7, 95 euro.

(4) *La méthode de l'égalité (Rêbaza wekhevîyê), li jor navê vê çavkanîyê bihurî.*

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

**Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)**
Ji alîyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Nedîm Baran
Semra Polat

**Revîzyona Wergeran**
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €**

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# Salih Muslim: Hêzên me ji bo her cure geşepêdanê amade ne! (Dewama rûpela 1)

**Tê îdîakirin ku têkîlîya PYDyê (Partîya Yekîtîya Demokrat) bi Beşar Esad û rejîma Sûrîyeyê re heye. Gelo ev îdîa rast in?**

Îdîayên bi vî rengî ji destpêkê de tê bilêvkirin. Ez dixwazim di derheqê vê yekê de tiştekî bibêjim; Dewleta Tirkîyeyê û Sûrîye ev 12 sal in, tu tişt nema ku li ser me neceribandin. Ev 12 sal in, di îşkencexaneyên dewletê de em bi îşkencê re rûbirû diman, em dihatin girtin û dihatin kuştin. Gelek şehîdên me hene. Bi taybetî gelek ji kadroyên PYDyê di vê pêvajoyê de şehîd bûn. Me tu dem destê kujerê xwe ranemûsa û em ranamûsin jî. Ji ber vê sedemê çavkanîya vê îdîa û propagandayê Tirkîye ye. Ev 12 sal in, yê ku rejîma Sûrîye êrişî ser me dikir Tirkîye bû, îro jî ev siyaset berdewam dike. Armanca vê propagandayê ew e ku me ji hêzên mixalif bi dûr ve bixin. Bi vê metodê dixwazin me li derveyî statuya ku di dahatîyê de li Sûrîyeyê pêk were bigirin. Ya rastî li seranserî Sûrîyeyê hêza yekane yê ku li dijî rejîmê bi metodên demokratîkî têdikoşin kurd in. Yên her roj xwepêşandanan li dar dixin û dixwazin rejîma Esad têk biçe em in. Em niha pêşengîya şoreşê dikin. Ev îdîa neverok vala û derew in.

**Îdîayeka din jî tê gotin ku PYD di nav Desteya Bilindi a Kurd de bi tesîr e û tehde û zorkerîyê li partîyên din dike…**

Ev bi salan e em amadeyîyên xwe dikin, ji hêzên parastinê ên sîvîl bigire heta gelek sazîyan. Dema me ev amadeyî dikirin, herkesî digot, PYD bi dewletê re hevkarîyê dike. Lê îro jî dibêjin, " ew xebat û çalkîyên wek pêk dianî rast û di cih de bûn." Belê em li ser zemîna ku me bi salan e ava kiriye bang li hemî hêz û partîyan dikin; werin em hemî tev bi hev re bixebitin. Fermo… Îro xebatên tên kirin û sîyaseta tê birêvebirin, dîyar dike ku desteya bilind bi çi metodên demokratîk xebatên xwe dimeşîne. Jixwe hemî sazîyên ku hatine avakirin, ne alên PYDyê ala û flamayên desteya bilind li ba dikin. Biryar û sîyaseta ku tê birêvebirin ji alîyê desteya bilind tê tayînkirin. Hemî xebat di vê çarçoveyê de dimeşe.

**PYD li dijî grûpên kurd ên mixalif tehde û şîdetê bi kar tîne?**

Me tu kes tehdit nekirîye û em tehdit nakin jî. Lê divê ez vê rastîyê jî bibêjim, îdeolojî û sîyaseta me ji yê hemî partîyan cuda ye. Mixalifên me hene. Lê ev nayê wateya ku em wan tehdît dikin. Ev îftira ye. Yên van îftirayan li me dikin bila herin li dijî hêzên taybet ên Sûrîyeyê û Tirkîyeyê têbikoşin. Bila bi van listîkan di navbera hêzên kurdan de nakokîyan dernexin. Em her roj çalakîyan li dar dixin, têkoşînê dikin. Em hêzeka cîdî ne û ew heza me heye ku daxwazên xwe bi kar bînin. Ger em tiştek bikin, em ê bi vekirî bibêjin me kirîye. Ji tu kesî tirsa me tune ye. Kiryarên ku me nekirîye jî em ê bibejin "me nekirîye". Em xwedîyê vê wêrekîyê ne.

**Li Başûrrojavayê Kurdistanê çend şervanê yekîneyên parastina gel hene?**

Hêzên Parastina Sîvîl û Yekîneyên Parastina Gel –YPG- hene. Bi hezaran çekdarên van hêzan hene. Hejmar dayîn bêîmkan e. Hemî hêzên çekdar talîmat û fermanan ji desteya bilind werdigirin. Di serî de sînorên Tirkîyeyê, hemî sînor ji alîyê van hêzan ve tê parastin. Ev hêz gelê me jî diparêze.

**Di destê van yekîneyan de çi cur çek hene?**

Belê çekên wekî top, tank , balafirên şer di deste me de tunene. Lê çekên wekî kalaşnîkof, biksî û doçka gelek çekên me hene.

**Hûn van çekan ji ku derê bi dest dixin?**

Gelê me alîkarî dike. Yekîneyên parastina sîvîl çekên xwe bi xwe temîn dikin. Çekên wan bi xwe hene. Lê YPG, perê wan heye û ew bi xwe bi dest dixin. Lê bi çi awayî bi dest dixin em jî nizanin. Ji xwe li Rojhilatê Navîn di vê babetê de tu tengasî û problem tuneye. Ger perê te hebe tu dikarî bi hêsanî çekan bi dest bixî. Li sûkê jî tu dikarî çekan bikirî.

**Tirkîye êrişî Sûrîyeyê bike dê helwêsta we çi be?**

Vê deme mercên navneteweyî derfet nade vê yekê. Lê dikarin êrişî hêzên me yên nêzîkî sînor bikin. Dibe ku bûyerên wisa biqewimin. Li çi gelê me û çi jî gele Sûrîyeyê ji sedî sed ji Tirkîyeyê hez nakin. Ji ber sedema helwêsta êrişkar a Tirkîyeyê jî ne rehet in. Ger Tirkîye êrişek wisa pêk bîne dê gele me jî bersiva pêwîst bide.

**Bersiveka çawa?**

Bersiva me dê bi metodên me be. Bila şika tu kesî tunebe.

**Hêza we heye ji bo vê bersivê? Hûn bi xwe bawer in?**

Balafirên me tankên me tuneye. Lê hêza me ya berxwedanê û bawerîya me heye.

**Di rojên çûyî de hêzên Tirkîyeyê êrişî ser yekîneyeka we kir. Hûn vê bûyerê çawa dinirxînin?**


Belê êrişî yekînîyeka me ya dewrîye kirin. Di encamê de hevalekî me şehîd bû, du hevalên me jî birîndar bûn. Ez dixwazim li vê dere bi awayekî vekirî bibêjim, ew bûyer dê bê bersiv nemîne. Tu êriş dê bê bersiv nemîne.

**Têkilîya we bi hikûmeta herêmê ya başûrê Kurdistanê re çawa ye?**

Têkilîyên me bi hemî kurdan re baş e. Di navbêra me de pirsgirêk tuneye. Hemî hêz û sazîyên kurdan piştgirîya me dikin. Gelê kurd ji bi me re ye.


* Rojnamevan

Wergera ji tirkî: Nedim Baran



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxezê, 50 x 70 cm

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



### MOHAMMAD ISMAIL

Wênesaz Mihemed Îsmaîl (Mohammed Ismail) sala 1971î li başûrê Kurdistanê ji dayîk bûye. Hunermend Îsmaîl, ji sala 1991î heta 1995an li bajarên Hewlêr û Silêmanîyê pêşangehên xwe yên şexsî yên pêşîn li dar dixe. Ji bilî hunera wênesazîyê li ser elektrîkê perwerdahî dibîne. Herweha, di navbera salên 1992-1995an de, di kovara bi navê *Hengê* de wek şêwirmendê teknîkî dixebite.

Mihemed Îsmaîl, pêşangeha xwe ya yekem di sala 1991î de li Hewlêrê li *Salona Mîdyayê* vedike. Ya duyem jî dîsa li heman pêşangehê bi bêşdarîya wezîrê çandê yê wê demê Şêrko Bêkes li dar dixe. Hunermend dûre pêşangehên sêyem û çarem jî dîsa di salên 1994 û 1995an de li Hewlêrê li *Salona Serdem a Navendî Roşinbîrî* li dar dixe.

Mihemed Îsmaîl, di sala 1996an de pêşangeheka xwe ya din li *Galerîya Silêmanîyê* bi piştgirîya Yekîtîya Hunermendên Kurdistanê li dar dixe. Îsmaîl, di tabloyên xwe yên wê demê de wek naverok cîh daye şerê birakujîyê. Di sala 1996an de ji ber sedemê şerên navxweyî yê li Kurdistanê dev ji karê xwe berdide û wek gelek ciwanên kurd yê wê demê welatê xwe diterikîne û berê xwe dide Stenbolê. Li Stenbolê sê salan dimîne û dûre diçe Almanyayê. Niha li Holandayê dijî. Endamê *Yekîtîya Hunermendên Kurd û Sendîkaya Çandê ya Holandayê* ye. Îsmaîl, herweha endamê *Civaka Dildarên Astronomîyê ya Kurdistanê* ye jî.

Mihemed Îsmaîl, piştî ku derdikeve derveyî welêt di sala 1998an de pêşangeha xwe ya heftem li Stenbolê, li *Muzeya Çapemenîyê* li dar dixe. Di sala 2001î de pêşangeheka din li bajarê Liverpool yê Îngilitereyê di *Galerîya Dominoyê* de li dar xistîye. Di sala 2004an de jî pêşangeha xwe ya nehemîn li Holandayê li *Galerîya Dorie Haarman* pêk anîye. Ji bilî vê, hem li welêt û hem jî li derveyî welêt beşdarî gelek pêşangehên komî yên hunerî bûye. Niha li *Akademîya Hunerên Bedew ya Gerrit Rietveld* perwerde dibe. Hunermend Îsmaîl, di tabloyên xwe de zêdetir boyaxa akrîl û mirekebê bi kar tîne.

# Bihara ereban, Sûrîye û kurd... (Dewama rûpela 1)

### Beşdarîya hêzên derve

Hê çend meh di ser serhildan û gengeşîya Sûrîyê re derbas nebûbûn ku Tirkîyeyê acizî û nerazîbûna xwe ya li hember rûdanan bi zimanekî hişk xuya kir. Hê di hezîrana 2011an de Tirkîyeyê pêşnîyarîya di nav axa Sûrîyê de avakirina "kembera ewlehîyê" (buffer zone) derbirî û bi vî awayî di qada navnetewî de li rêyên piştgirîya vê yekê gerîya. Di kanûna pêşîn a eynî salê de Wezîrê Karên Derve yê Fransayê Alain Juppe jî, bi armanca ku alîkarî ji qurbanên sîvîl re were kirin, derman û xwarin bigihîje wan, ji pêşnîyarîya di nav sînorên Sûrîyê de li ser vekirina "korîdorek merivî" peyivî. Îcar berpirsîyara Komîsyona Bilind a Mafên Merivî ya Neteweyên Yekbûyî Navi Pillay jî, di 2yê çirîya paşîn a 2011an de, di axaftina xwe ya ku ji Konseya Mafên Merivî re kir, bal kişand ser rewşa Sûrîyeyê got ku "ji bo parastina gelê Sûrîyeyê, divê civata navnetewî bi lez û bez tev bigere û hin tedbîrên kêrhatî bigire." Ev ne cara pêşîn bû Konseya Mafên Merivî bal dikişand ser rûdanên li Sûrîyeyê, hê berê jî Konseyê kişf kiribû ku rejîma Esad li hember merivatîyê sûcdar e. (3)

Di dema ku civata navnetewî li benda têkilbûna derve ya Sûrîyeyê bû, fikra têkilbûnê di Konseya Ewlehî ya Netewên Yekbûyî de têra xwe piştgirî nestand. Rûsya û Çînê du caran li ser hev biryara Konseya Ewlekarîyê ya ku tê de gazî li Bişar Esad dihat kirin, da ku îstifa bike, red kirin. Di kanûna paşîn a 2011an û di Sibata 2012yan de jî Rûsya û Çînê bi hevûdin re nehiştin ku Konseya Ewlehîyê biryarekê li dijî hovîtîyên rejîma Sûrîyeyê bigire. Li gor her du welatên ku endamên daîmîyên Konseya Ewlekarîyê ya Netewên Yekbûyî ne, têkilbûna derve ya Sûrîyeyê bi riknê serwerîya netewî li hev nake û herweha ev yek binpêkirina hiqûqa navnetewî ye jî. (4) Bêguman ev helwêsta Çîn û Rûsyayê bi tu awayî ne bi dilê wan welatan bû yên ku alîgirên têkilbûna navnetewî bûn. Gelek kes vê siyaseta her du welatan bi hesab û berjewendîyên wan ên li ser Rojhilatê Navîn ve girêdidin. Jixwe ji mêj ve, hê ji dema ku Suriyeyê teze serxwebûna xwe ji Fransayê girtibû vir ve têkilîya her du welatan baş bû. Bi taybetî piştî 1950yî di gelek warên cihê de danûsitandina Sûrîyeyê û Sovyetê baş bû û herdu jî wekî du welatên nêzik dihatin zanîn. Îcar di sala1963yan de, gava ku Partîya Baasê hat ser desthilatê, her du welat bi awayê îdeolojîk jî nêzikî hevûdin bûn.

Îro bi taybetî sê welat, ango Rûsya, Çîn û Îran bi hişkî li hember têkilbûna derveyî ne û li gor wan li Sûrîyeyê, li hember dewlet û rejîmê serhildanek rû daye û mafê dewletê heye ku vê serhildanê bipelçiqîne û di demeka kurt de li ser axa welatê xwe aştî û aramîyê pêk bîne. Belê dewletên ku alîgirên têkilbûna devreyî ne, di serî de Tirkîye, Erebistana Seûdîyê û Qatar berevajîyê vê yekê difikirin û li gor wan civata navnetewî, di pirsa têkilbûnê de gelek dereng maye. Ev her sê dewlet têkilbûna dervayî diparêzin, belê naxwazin bi tena serê xwe çareserîyekê ji vê yekê re bibînin. Ew dixwazin ku Amerîka an jî NATO dest bavêje vî karî. Belê Amerîkaya ku hema bêje ji bûyera têkilbûna Lîbyayê poşman bûye, kifş e ku dil nake rasterast têkeve nav vî karî. Xuya ye ku DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka) ne aligira têkilbûna derveyî ye, belê bêyî ku berspirsîyarîya kar bigire ser milên xwe û ev bar li ser pişta wê bimîne, ramana ji ser kar xistin an jî ketina Bişar Esad diparêze. Eger rejîm ji alîyê mixalefeta hundir a Sûrîyeyê ve bê xistin ew ê DYA bi vê yekê şa bibe. Sedemên ku DYA dixwaze rejîma Sûrîyeyê ji ser kar bikeve ev in: Berî her tiştî Sûrîye bi Îranê re hevparek stratejîk e, dijminatîya Îsraîlê dike û hergav piştgirî dide hêzên filistînî yên ku li dijî Îsraîlê şer dikin. Bi ser de Sûriye li hember têkilbûna DYA ya Iraqê jî bû. Loma DYA dixwaze ku rejîma Esad bikeve, belê hin şikên wê ji têkilbûna derveyî hene. Ew ditirse ku têkilbûnek derveyî rewşa gelê Sûrîyeyê nebaştir û xerabtir bike, şerekî sîvîl û mezhebî li seranserê welat belav bibe. Çimkî Esad û alîgirên wî, bi taybetî beşê civata Sûrîyeyê ya ku piştgirîya wî dikin wekî parastvanên rejîmê bi rêk xistine. Li Sûrîyeyê ne tenê leşker û polîs, dadgeh, ekonomî û hema bêje her tişt weha hatiye pergalkirin. (5)

Sedemek din ê bê ka çima gelek welat xwe ji têkilbûna derveyî dûr dixin jî mixalefeta Sûrîyeyê ye. Ev mixalefeta ku ji gelek grûpên dijber û antagonîstîk pêk tê, bawerîyê nade derve. Çimkî li welat, di serî de Artêşa Azad a Sûrîyeyê, gelek grûpên cihê li hember rejîmê şer dikin, ku hin ji wan bi radîkalî û cîhadparastîya xwe tên nasîn. Jabhat an Nusra (Enîya Rizgarîyê), Ahrar al Sham (Azadîya Sûrîyeya Mezin) El Qaîde û gelek grupên cihê yên ku ji derên wekî Tirkîye, Afganistan, Çeçenistan, Pakistan, Lîbya, Iraq û heta ji Îngilistanê hatine û li Sûrîyeyê şer dikin, hene. Artêşa Sûrîyeyê ya azad bi qasî % 60î hêzên şervan di bin baskên xwe de civandîye, belê grupên din, bêyî ku guhdarîya kesî bikin, bi serê xwe tev digerin. Mesela DYAyê di serî de piştgirîya mixalefetê dikir, belê piştî ku hay jê çêbû hêzên wekî El-Qaîde û grupên cîhadparêz li welat çalak in, hingê piştgirîya xwe sist kir, heta nehişt û bi zanîn bû asteng ku ji navendên wekî Doha û Rîyadê çekên giran ji mixalefetê re werin. Çimkî DYA, El-Qaîdeyê wekî rêxistineka terorîst dibîne û ji bo xwe dijminek bingehîn dihesibîne. Eger DYA mecbûr bimîne ku di navbera rejîma Esad û El- Qaîdeyê hilbijartinekê bike, bêşik ew ê rejîma Esad bixwaze.



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, mirekeb li ser kaxezê, 50 x 70 cm



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxezê, 70 x 50 cm

### Kurd bûne kevirê rikin

Bişar Esad ji bo ku kurdan ji serhildanê dûr bixe û bi vî awayî enîya şer a li hemberî xwe firehtir neke, hê ji destpêkê ve gelek siyasî tev gerîya. Wî gelek baş dizanibû ku ew ê helwêsta kurdan qedera şer kifş bike. Loma ji bo ku li derveyî serhildanê bigire, wî dest pê kir mafê nasnamê ji sed hezaran kurdên ku bênasname bûn re nasî. Çimkî di sala 1962yan de, rejîma Sûrîyeyê bi behaneya ku ew li ser axa Sûrîyeyê nehatine dinyayê û koçer in, mafê hemwelatîbûnê ji 120 000 kurdan stand. Hingê Sûrîye bi vê yekê jî qîma xwe neanî, di sala 1973yan de hemû kurdên ku li ser sînor rûdiniştin ji ser axa wan rakir û ereb li cihê wan bi cih kir. Bi vê yekê Sûrîyeyê kurdên bakur û kurdên nav sînorên xwe ji hev diqetandin û li ser sînor "kembereka erebî" ava dikir. Îcar kurdên ku haya wan baş ji siyaseta Sûrîyeyê hebû, nexwestin ku car din hesabên şaş bikin û ji êrişên dewletê re bibin armanc. Wekî miletek bêdewlet, baş dizanibûn ku gava êrişek hovane bê ser wan, kesî ku di qada navnetewî de li mafên wan bipirse û wan biparêze tuneye. Tecruba wan a salan vê yekê gelek caran nîşanî wan dabû û dîroka wan a dema nêzik bi nimûneyên vê yekê dagirtî bûn.

Niha çend sedemên ku kurd xwe ji mixalefeta Suriyeyê dûr digirin hene. Berî her tiştî mixalefeta Sûrîyeyê ya ku bi piranî ji rêxistina Birayên Misilman û neteweperestên ereb pêk tê, bi tu awayî xwe nade ber daxwazên netewî yên gelê kurd. Ya din kurd jî vê carê naxwazin fersenda ku hatîye ber derê wan birevînin. Bêguman ev fersenda dîrokî, fersenda xwe îdarekirinê ye. Ne tenê kurd, hemû kes dizane ku kurd xwedî pozîsyonek wusa ne ku dikarin çûyin û qedera şer kifş bikin. Îro ew li kîjan alîyî bisekin, wê ew alî kar bike û di encama şer de bi ser bikeve. Civata Henrî Jackson a ku li Londrayê ye û wekî navendeka siyaseta derve dixebite, di lêkolîna xwe ya li ser Sûrîyê de destnîşan dike ku kurd dikarin qedera vê serhildanê kifş bikin. Bi ser de kurd dizanin ku helwêsta mixalefeta Sûrîyeyê ya li pêşberî wan ne samîmî ye û gava ku ew bi ser bikevin, ew ê helwêsta wan a li dijî kurdan ji ya Bişar Esad xerabtir be. Bi kuştina sîvîlan û hovîtîyên xwe, mixalefeta Sûrîyeyê ji rejîma Esad kêm namîne û ji zû ve ye ku rêxistinên sivîl ên mafên merivî jî bal dikşînin ser vê yekê. Eger mixalefeta Sûrîyeyê bi ser keve, ji bo ku desthilateka otorîter li ser axa kurdan jî pêk bîne û mafên wan ên bingehîn nenase, ew ê şerê kurdan bike. Loma divê kurd ji niha ve xwe ji şerê mixalefeta Sûrîyeyê re amade bikin. Rast e, Bişar tu caran ne demokrat bû, belê bi kêmanî di pirsa hindikanîyan de, bi taybetî di derbarê hindikanîyên xirîstîyan de sekûler bû. Îcar sedemek dûrmayina kurdan a ji mixalefetê jî, îhtimala avabûna rejîmek îslamî ya ku ew ê ne himêzkar û xweşbîn be. Bi kurtî kurd vê carê naxwazin bibin alîyê leyistikekaku ew ê winda bikin. (6)

Ya rast di destpêkê de kurdan jî xwest ku têkilîya wan bi Konseya Netewî ya Sûrîyeyê re hebe û heta ew jî bi awayekî tê de xwedî rol bin. Belê hê ji destpêkê ve hemû hewldanên wan pûç û vala derketin. Ereban, ji ber ku xwdenegiravî kurd piştgirîya serhildanê nakin ew tawanbar kirin û kurdan jî ew, ji ber ku ji mafên wan ên netewî re hurmet nîşan nadin sûcdar hesibandin. Gazineka kurdan a ji mixalefetê jî têkilîya wan a nêzik a bi Tirkîyeyê re bû. Di civîna ku di tîrmeha 2012an de li Stenbolê çêbû de, ereban, bêyî ku ji kurdan bipirsin an jî bi wan bişêwirin navê 'Komara Ereb a Sûrîyeyê' xebitand. Kurd bi vê sipartinê razî nebûn, çimkî Sûriye ne tenê welatê ereban bû. Gava dîtin ku kes guh nade daxwazên wan, hingê rabûn dev ji civînê berdan. Piştre di cîvîna ku li Qahîrê çêbû de jî ereb wekî berê tev gerîyan, raman û pêşnîyarîyên kurdan negirtin ber çavê xwe û xwestin ku kurd li pey wan herin. Hingê kurdan ji mixalefetê xwest ku xaleka bi awayê 'Wê gelê kurd bê naskirin' di danezana encamî ya civînê de cih bigire, belê ereban ev yek jî qebûl nekir. Li ser vê yekê kurd rabûn û cardin neçar man ku dev ji civînê berdin. Ereban dixwest ku kurd wan wekî 'kekên' xwe bihesibînin, bêyî ku ji tiştekî şik bikin, li pey wan

herin. Belê tevgerên bi vî cûreyî kurd ji mixalefetê dûr kirin û kurd mecbûr man ku li riyên çareserîyê yên din bigerin. Her çiqas demekê serokatîya KNSê ji alî kurdekî ve jî dihat kirin, hebûna kurdan a di nav vê rêxistinê de hergav sembolîk bû.

Ji hêla din ve siyaseta dewletên cîran jî li ser helwêsta kurdan xwedî rolekî mezin e. Mesela Tirkîye bi tu awayî naxwze ku kurdên Sûrîyê li der û dora PYDyê (Partîya Yekîtîya Demokrat) bicivin, di şûna ku ew ê nêzikî wê bin, nêzikbûna wan a kûrdên başûr tercîh dike. PYD doza otonomîyê dike, herçî PDK ye federasyonê wekî çareserîya pirsê dertîne pêş. Lê dîsa jî Tirkîye, PYD hê bêtir ji bo xwe xeter dibîne. (7) Di vê navê de kurdên Sûrîyeyê jî Tirkîyeyê nêziktirî mixalefeta Sûrîyeyê dibînin û zêde bawerî pê naynin. Li gor PYDyê û piştgirên wê, piştî hilweşîna rejîma Esad, ew ê Tirkîye piştgirîyê bide Birayên Misilman û hêzên sunî yên neteweperest, da ku li Sûriyyeyê dewleteka kukla ya ku di bin bandora wê de ye bide avakirin û di karê rêvebirina welat de bi tu awayî cih nede kurdan. Îcar ne tenê piştgirên PYDyê, hema bêje hemû kurdên Sûrîyê weha difikirin û bawerî bi Tirkîyeyê naynin. Tirsa Tirkîyyê jî ew e ku PYD ji ser axa ku di bin serwerîya wê de ye êrişan bibe ser sînorê wê û ji bo ewlehîya Tirkîyeyê bibe tehlûke. Belê Serokê PYDyê Salih Mihemed Muslim, di hevpeyvîneka xwe ya ku bi Navenda Lêkolînên Aştîyê yên Rojhilatê Navîn re kiriye de weha dibêje. 'Ez bi piştrastî soz didim ku ew ê guleyekî jî ji alî hêzên me yên ewlehî ve bi ser Tirkîyeyê ve neyê berdan. Me civata xwe û nifşên xwe yên nû bi tirs û dijminatîya Tirkîyeyê mezin nekiriye. Belê ez dinêrim ku di nav tirkan de tirs û saweka kurdan heye. Eger ew vê yekê deynin alîyekî em dikarin li ba hev di nav aştîyê de bijîn. Ev ax ji bav û kalên me ji me re ma.' (8)

Li Sûrîyeyê dawî li şer anîn û pêkanîna aştîyê girêdayî du hêmanên bingehîn e; yek faktorên hundir, dido faktorên derve. Faktorên hundir ji dînamîkên Sûrîyeyê yên navxweyî, bi taybetî ji avahîya dînî û etnîkî pêk tên. Eger xetên dînî û etnîkî bi awayekî tûj ji hev biqetîyana û neketana hundirê hev, hingê ji pirsê re çareserîyeka maqûl dîtin ne pir zehmet bû. Belê ji hevqetîn li alîyekî, hema bêje li hemû bajarên navendî yên Sûrîyeyê yên wekî Şam û Halebê komên etnîk û dînî tevlihev bûne û ketine nav hev. Mesela % 70yî nifûsa Halebê sunî ne û % 30yî mayî elewî û xirîstîyan in. Îcar ne sunî, ne elewî û ne jî xirîstîyan di nav xwe de yekpare û homojen in. Her grupek di nav xwe de beş bi beş e. Jixwe gava ku cihêtî li ser bingeha dînî û mezhebî be, bi piranî rastîya etnîkî nayê hesibandin. Ji ber ku sunî ne, niha kurd ji di nav % 70yî de ne. Belê di eslê xwe de, % 10an nifûsa Helebê jî ew in.

Gava ku dor tê ser daxwazên grupên dînî, mezhebî û etnîkî yên Sûrîyeyê, bi awayekî giştî em dikarin daxwazên wan weha formûle bikin: 1) Sûnî; wekî grupa herî mezin, 'demokrasîyeka' li ser bingeha rêvebirina piranîyê dixwazin; ji ber ku yên bi nufûsa xwe herî zêde ew in, dixwazin desthilata welat di destê wan de be. 2) Elewî; dixwazin desthilata xwe berdewam bikin û vê yekê ji bo qencîya hemû welat baş dibînin. 3) Şîî; bi giştî daxwazên wan û elewîyan nêzikî hev in. 4) Kurd, otonomîyeka berfireh an jî federasyonê dixwazin. 5) Cihû û xirîstîyan; ewlekarîyê dixwazin û ji desthilateka sunî ditirsin. (9)

Eşekere ye ku faktorên derve jî bi kêmanî bi qasî faktorên hundir tevlihev in. Ji Amerîkayê heta Asyayê, gelek aktorên herêmî û global ên ku bûyerên Sûrîyeyê ji nêzik ve dişopînin hene. Wekî aktorên global, du kampên navnetewî dertên pêşberî me: Bloka DYA û Rûsya-Rojhilatê Navîn. DYA pêşengîya hin dewletên Ewropa, Tirkîye û Erebistana Seûdî û Qatarê dike. Îsraîl jî dikare li kêleka vê blokê bê nîşandan. Rûsya pêşkêşîya hin dewletên Asya û Rojhilatê Navîn dike. Em dikarin li ba Rûsyayê navê dewletên wekî Çîn, Îran, Iraq û heta radeyekê Libnanê jî bidin. Bi ser ku di eynî blokê de cih digirin, daxwazên DYA, Tirkîye û Îsraîlê ji hev cihê ne. Tirkîye piştgirîya Sûrîyeyeka yekbûyî dike, belê ji bo Amerîkayê ewlehîya enerjîyê, ango petrol û gaza xwezayî ji yekîtîya Sûrîyeyê girîngtir e. Îsraîl jî rejîma Esad, ji bo ewlehîya xwe ji rejîmeka sunî çêtir dibîne. Eger piştî Misirê, li Sûrîyeyê jî Birayên Misilman werin ser desthilatê û sibê li Urdunê jî tiştek weha çêbe, hingê Îsraîl ji her sê alîyan ve di nav çeqneberka rejîmên îslamî de dimîne. Loma di rewşeka weha de, bivê nevê Îsraîl jî Sûriyeyeka ji hev belavbûyî û perçekirî ji bo berjewendîyên xwe çêtir dibîne.

### Lê kurd?

Tevlihevî û gengeşîya Sûrîyeyê fersedeka dîrokî daye destê kurdan. Eger kurd bi aqil tev bigerin, hesabên xwe baş bikin û vê carê rola xwe baş bileyizin, hingê ew ê ji vê rewşê îstifade bikin. Mêzîna (balansa) navnetewî jî li alî kurdan e û herkes dizane ku kurd dikarin qedera şerê li Sûrîyeyê kifş bikin. Belê tiştê esasî qedera wan bi xwe ye û bîhn û hilma wan a ku vê carê jî pişta stûyê xwe bixwirînin û winda bikin tuneye. Bi ser de jî kurd, piştî tecruba Başûrê Kurdistanê, îro bi hêz û hebûna xwe di siyaseta Rojhilatê Navîn de aktorek xudan rol in. Eger kurdên Sûrîyeyê ji niha ve daxwazên xwe baş formule nekin û civata xwe li dora van daxwazan neyin ser hev, dîsa bi pey filan û bêvan kesî bikevin, şikestinek din li pêş wan e. Belê eger bi şehrezayî tev bigerin, guh bidin îrada siyasî ya Başûr, tecruba wê ji bo xwe wekî nexşerêyekê bifesilînin, mil bi mil bixebitin, cihêtîyên xwe yên îdeolojîk deynin alîyekî û li ser bingeheka netewî li hev bikin, vê carê dikarin bextê xwe yê reş sipî bikin. Heke na, Bihara Ereban dikare bibe zivistana wan û bihara ku ew li pey in zû bi zû neyê.

* Berpirsê Beşa Têkilîyên Navnetewî yê Unîversîteya Alparslan a Mûşê

(1) Fisk, Robert, The Gerat War of Civilization, The Conquest of Middle East, Vintage Books, New York, February 2007, s.XXi

(2) Galbraith, Peter w. The End of Îraq, How American Încompetence Created a War Without End, Simon& Schuster Paperback, New York, London, etc. s.7

(3) Michael Weiss "What it Will Take to Întervene in Syria," Foreign Affairs, January 6, 2012

(4) Geoff Dyer, Quentin Peel and Abigail Fielding-Smith "US 'disgusted' with Syria peace plan veto," Financial Times, February 5, 2012

(5) Daniel Byman," Preparing for Failure in Syria," Foreign Affairs, March 20, 2012

(6) Kennedy, Michael ,"Kurds Remain on the Sideline of Syria's Uprising," The New York Times, April 17, 2012

(7) Tol, Gênûl, "Syria's Kurdish Challenge to Turkey" *Foreign Policy*, August 29, 2012

(8) Ergil, Doğu, "Questions and Prejudies" Sunday's Zaman, September 9, 2012

(9) Galtung, Jonah, " Solution oriented conflict tranformation- Syria," The Daily Star, Strategic Issues: 23/06/2012



MOHAMMAD ISMAIL, **Bênav**, mirekeb li ser kaxezê

Bûyera Petraeus, xirabûna rewşê li Rojhilatê Nêzîk, pêdivîya lihevkirina bi Komarparêzan re li ser planeka kêmkirina lihevderneketina budceyê: hê nû hilbijartî û hê dewra wî ya duyem a serokatîyê jî dest pê nekirîye, Barack Obama xwedîyê bernameyeka bi serî ve tijî ye. Ew dikare xwe bispêre kîjan bingeha civakî da ku bi pirsgirêkên li benda wî ne rûbirû bibe?

BI DESTXISTINA DESTHILATDARÎYÊ BI DENGÊN JINAN Û YÊN HINDIKAHÎYAN

# Dawîya "stratejîya başûrparêz" li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê

JEROME KARABEL *

Ji dema destpêka Şerê Navxweyî yê Amerîkî yê berîya 150 salan qewimî û vir ve, bi tenê çar namzedên demokrat piştî dewra yekem careka din wekî serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatin hilbijartin: Woodrow Wilson, Franklin Delano Roosevelt, Bill Clinton û Barack Obama. Ji her çaran bi tenê diduyan % 50î zêdetirê dengan bi dest xist. Yê yekem Roosevelt bû û yê din jî Barack Hussein Obama yê di 6ê çirîya paşîn de hatî hilbijartin bû.

Serketina Obama bûyereka dîrokî bû, lê ev serketin wekî yên dema bihurî xwe naspêre standina piranîyeka baş eşkere di hilbijartinan de. Berê serketinên bi vî rengî dihatin maneya guhertineka mezin a siyasetê ku dikete ser rêya baş –guhertineka ku ne bi tenê dibû sedema koalîsyoneka nû ya siyasî, lê belê ku herweha dibû sedema guhertineka binesazîyê û ya "afirandina nêrîneka nû ya siyasî ya li cîhanê ya serwer, yan jî afirandina zeitgeist-eka (nêzîkatîyeka giştî ya demê)" (1) Belkî jî her du nimûneyên herî eşkere yên serketinên bi piranîyeka mezin a sedsala bîstan ên Roosevelt di 1936an de (% 61- rikberî wî % 36ê dengan standibû) û Reagan di 1984an de (% 58- rikberê wî % 40 stand). Rewşa serketina Obama gelekî berevajîyê wan e –ew mîrasgirê aborîya herî xirab e ji demê Krîza Mezin ve û bi adeta redkirinê ya hişk ya Partîya Komarparêz re rû bi rû ye– ew bi navbereka piçûk ya % 3yê di hilbijartinan de bi ser ket (% 51 ji dengan stand – rikberê wî % 46 standibû)

Eger ev serketin tê maneya "Derketina holê ya Piranîyeka Demokratîk" ku pirtûkeka bi têsîr a bi heman navî ya ku John Judis û Ruy Teixeira (2) sala 2002yan çap kirin, mizgînîya wê dan, ev piranî be, hingê yekê pir piçûk e.

Yek ji encamên herî balkêş ên hilbijatinên 2012an, ji destê Obama nehat ku tevî xebaten wî yên bi qîmet dubeşîya nijadî a ji destpêka dîroka Amerîkayê ve heyî, kêm bike. Dema Obama sala 2008an namzed bû, wisa xuya dibû ku ew yekane kes e ku ji herkesî baştir dikare nijadperestîya siyaseta amerîkî kêm bike –**bi xêra kokên xwe yên spî û reşik di heman demê de, bi xêra aramîya xwe, lebata xwe ya bi rûmet, û bi xêra peymana xwe ya yekitîyê.** Sala 2008an Obama % 43 yê dengên dengdarên spî stand (biqasî ku Clinton di 1996an de stand): Tu namzedê Partîya Demokrat ji sala 1976an ve li cem dengdarên spî ewqas bi ser neketibû. Wê salê Jimmy Carter, ku bi xwe ji Deep South ("Başûrê Kûr") bû, % 47ê dengên dengdarên spî stand. Sala 2012ê ev hejmar daketibû binya % 40ê û navbereka 20 puwanan a nijadperestîyê derketibû holê - % 59ê spîyan dengê xwe dan Romney û % 39ê wan dengê xwe dan Obama. Îro li Amerîkaya spî, pirsgirêka rastî ev e ku her hilbijartin ji bo serokatîyê bi piranîyeka eşkere ya Partîya Komarparêz bi dawî dibe; ji 2000ê ve, dengên Partîya Komarparêz li reqîbê xwe zêde dike tu caran kêmtirî 12 puwanan nebûn (di hilbijartinên 2000î û yên 2008an de) û di dema serketina Reaganê bi piranîya mezin a dengan sala 1984an, kesê spî namzedê Komarparêz tercîh kirin û kirin ku ew 29 puwanan ji reqîbê xwe zêdetir bistîne (wî % 64ê dengan stand û reqîbê wî % 35ê dengan stand).

Dûrketina dengdarên spî ji Partîya Demokrat ji ber sedemên bingehîn ji mêj ve pêk hat, yê herî kêm ji 1964an ve wexta Barry Goldwater, lehengê Partîya Komarparêz bi xêra redkirina Danezana Mafên Sîvîl di hilbijartinan de li Mississippi, Alabama, Georgia, South Carolina, û Louisianayê bi ser ket.

Eger hinek guman dihat kirin ku bikaranîna fikrên nijadparêz beşeka mezin a stratejîya siyasî ya komarparêzan bû ji bo dengên kesên spî bistînin, sala 1980yî êdî dawî li gumankirinê hat, wexta Ronald Reagan ev yek piştrast kir di axaftina destpêkê ya kampanyaya xwe ya ji bo hilbijartinan a li Philadelphia, Mississippiyê bilêv kirî –bajarê ku berîya bi şanzdeh salan şahidî li qetilkirina xebatkarên mafên sîvîl kiribû: James Cheney, Andrew Goodman, û Michael Schwerner. Di vê axaftinê de, Reagan bi kelecan parastina mafên dewletê kiribû. Jixwe "mafên dewletê" bi xwe kodeka kevin a herkesî jê fêm dikir bû ji bo astengkirina mafên sîvîl ên reşikan. Banga Reagan bêbersiv nema.

### Kîjan koalîsyona piranîyê?

Piranîyên mezin ên dengdarên spî kirin ku desthilatdarî di destê Partîya Komarparêz de bimîne heta sala 1992yan, hingê Bill Clinton, ku bi xwe başûrî ye, cihê Partîya Demokratîk guhert û anî navendîrastê. Ya ku Clinton bi dest xist, di her du serketinên wî yên hilbijartinan de, dilsozîya dengdarên reşik e û kêmkirina avantajên Partîya komarparêz e li ber çavên spîyan. Wî ev tişt bi rêya formuleka ku xîtabî daxwazên spîyan dikir, pêk anî, wî soza "bidawîkirina bi rengê em wê nas dikin ya dewlemendîyê" dida (sala 1996an wî ev soza xwe bi cîh anî û li şûna Alîkarîya ji bo Malbatên xwedî Zarokên Piçûk, Alîkarîya Demkin ji bo Malbatên Hewce) û soza piştgirîya wezîfedarkirina 100 000 polêsên nû da. Herweha jê hat ku zirarê bide koalîsîyona komarparêzan, lê jê nehat ku piranîyeka eşkere ya Demokratan pêk bîne.

Sala 2008ê, bi xêra bêhêvîmana her diçû xirabtir dibû di encama şerê Bush li dijî Îraqê de û bi saya rewşa pir xirab a aborîyê, çarçoveya hilbijartinan ji demokratan re gelekî baş bû. Obama kir ku Partîya Demokrat keysa xwe li hilbijartinan bîne, dema ku ew wekî namzed nîşan da û hindik mabû ku bibe yekem serokê reşik ê neteweyê. Ew ji destpêkê ve li dijî şerê Iraqê bû, jêhatîbûna wî ya taybet di retorîkê de, dîroka wî ya naşibe ya tu kesan, operasyona biserketî ku di kampanyaya hilbijartinan de li dar xist û kelecana wî ya milîtanî, kir ku ew biserketî daxwaza kesên piştgirîya wî dikirin fêm bike û bang li gel kirin, bangên ne zelal, lê belê yên ku xeyalên mirovan xurt dikirin ji bo "hêvîyê" û "guhertinê". Hilbijêrên spî yên çîna karkeran, bi taybetî li eyaletên herêma Rust Beltê yên wekî Pennsylvania û Ohioyê, serê xwe li ber banga Obama netewandin û bi awayekî girseyî dengê xwe dan Hillary Clintonê di dema hilbijartinên pêş yên dîyarkirina namzedên partîyan de.

Serketina Obama li dijî Mc Cainê di hilbijartinên giştî yên 2008an de bûyereka dîrokî ya meriv ne li bendê bû ye (kê dikarî xeyal bike ku merivekî reş bi navê Barack Hussein Obama wê bibe serokê Dewletên Yekbûyî?). Di dema dilgeşbûna ji ber hilbijartina yekem serokê reşik ê meriv nedikarî pirsa gelo têsîrekî xirab a reşbûna wî li mezintîya serketina wî kiribû an na (wî % 53yê dengan stand, rikberê wî jî % 46ê dengan). Mamostayê zanista siyasî li Zanîngeha Iowayê Michael S. Lewis-Beck û hevalên wî yên kar, gihîştin vê encamê "di civakeka li ser mijara nijadan kor de, dibû ku meriv li benda standina piranîya dengan a Obama be". (3)

Komeka piçûk a amerîkîyên spî heye –belkî ji 100 kesan ji 3 yan jî 5 kesan pêk tê– ku li gor helwêsta wan a siyasî û îdeolojîk û li gor xisleta wan a demografîk, eger namzedekî din ê demokrat yê wekî Obama lê bi rengê spî hebûya, îhtîmalek e li şûna ku dengê xwe bidin Obamayê wan ê dengê xwe bida wî. Ji ber dîroka tevlîhev a nijadperestîyê ya Amerîkayê, kêmbûna hejmara endamên vê komê tiştek e meriv matmayî dihêle –û hêvîyê dide merivan. Lê pir caran, yên ku encamên hilbijartinan dîyar dikin hejmarên wisa biçûk in, û dibe ku nijada Obama bûbe sedem ku ew ne bi serktina herî mezin a dîroka hilbijartinên serokatîyê ji 1984an û vir ve bikeve Qesra Spî.

### Bang li bîyanîyan tê kirin "xwe bi xwe ji welêt bikin der"

Belê, eger pêşhikimên li dijî reşikan hê jî xisleta siyaseta amerîkî pêk tînin, ew di çarçoveyeka etnîk a ji demên 1960î ve gelekî guherî de pêk tên. Wê demê stratejîya Başûrîyan parçe parçe bû. % 90ê ji dengdarên amerîkî spî bûn; sala 2012an bi tenê % 72yê wan spî ne. Ev hejmar sedema serketina Obama nîşan didin: piştgirîya nedîtî ya amerîkîyên-afrîkî dan wî (% 93), lê ne bi tenê ew, latîn amerîkîyan (% 71) û amerîkîyên asyewî jî (% 73) dengê xwe dan Obama. Heta berîya demeka nêz, bi tenê standina ji dehan çarên dengên dengdarên spî –wekî Obama sala 2012an bi dest xistî- wê bihata maneya têkçûnê. Lê niha % 44ê tevahîya dengên demokrat ji hindikayîyan tê, herçî dengên komarparêzan in bi tenê % 11ê wan ji hindikayîyan tê. Niha meriv pê dizane ku rola dengên hindikayîyan wê di siyaseta amerîkî de her biçe mezintir bibe, edî stratejîya Başûrîyan –ku bingeha desthilatdarîya komarparêzan bû di dirêjîya çaryek sedsala navbera 1968 û 1992yan de–pûç bû.

Lê dîsa jî ne eşkere ye, gelo formula nû ya demokratan wê li ser bingehekî saxlem rêya xwe bidomîne û wê "piranîyeka demokrat ya nû derxe holê" yan na. Latînîyan sala 2004an % 44ê dengên xwe dan George W. Bush, hê berîya demeka pir kurt. Herçî jin in, fikra wan a siyasî ji ya ku retorîka lîberal li ser "şerê komarparêzan ji bo standina dengên jinan" terîf dike, zêdetir parçe bûyî ye; sala 2012an % 44ê ji jinan û tiştekî ecêb e, % 56ê jinên spî dengê xwe dan Romney.

Dîsa jî demokratên Obama li cem komên hejmara wan zêde ye pêşketineka mezin bidest xistin. Ciwan –**yên ji ber siyaseta wî ya lîberal di mijara mafên nêremoyan ji bo xwedî zarokbûnê, ji ber hewldanên wî ya nizimkirina bihayê perwerdeya li zanîngehan, û ji ber stîla wî ya modern, pişta Obama girtin** - şaşbûna peyva adetî ya li ser wan tê gotin û dibêje, hejmara wan a tevlîbûna hilbijartinan tu cara têrê nake ku têsîreka mezin li encaman bikin, du caran îspat kirin; hejmara ciwanên emrê wan di navbera 18 û 29an de bilindtir bû sala 2012an li gor 2008an (bêhtirî % 17ê dengan % 18 dengan ên ciwanan bûn) û piranîya wan dengê xwe dan Obama (% 60ê wan sala 2012an û % 66ê wan sala 2008an). Zêdebûna dengên asyewîyan ji bo Obama jî balkêş e, sala 2008an % 62yê wan dengê xwe dan wî û sala 2012an % 73yê wan. (Berîya demeka kurt, sala 1992yan, % 55ê amerîkîyên asyewî dengê xwe didan namzedê komarparêz).

Ango gelekî mimkin e ku dengdarên berîya bi deh salan xwe nêzîkî Judis û Teixera didîtin di *Piranîya Partîya Demokrat a nû Derket Holê* de –dengdarên endamên hindikayîyan, amerîkîyên reşik, latînî û asyewî tê de; jin, bi taybetî yên dişuxilin, yên ezeb in û yên perwerdeyeka li dibistanên bilind dîtin; û profesiyonel– niha koalîsîyonekê pêk tînin ya ku mimkin e serdest be di siberoja siyaseta amerîkî de. Kenê merivî bi vê yekê tê: tovên vê koalîsîyonê dawîya salên 1960î ji alîyê stratejîya başûrîyan ve hatin reşandin ya ku destûr dabû komarparêzan demeka ewqasî dirêj desthilatdar bimînin. Lê di çarçoveya demografîk a pir guhertî ya sedsala bîstûyekan de, spîbûna Partîya Komarparêz ( û wisa tê texmîn kirin ku % 98ê wezîfedarên Kongreya Neteweyî yê komarparêz ya 2012an spî bûn) bû sedema îhtîmala têkçûnê.

Sala 2008an, dema Obama ji bo ku bibe namzedê Partîya Demokrat kampanya li dijî Hillary Clinton dimeşand, ew li xwe mikur hat ku "Ronald Reagan rêya siyaseta amerîkî guhertibû…tiştekî ku Bill Clinton nekir" û îşaret dabû ku dixwest bibe serokdewletekî guhertinê pêk tîne. Tevî ku niha bûn çar sal ku Obama ketiye hundirê Qesra Spî jî, guhertineka bi vî rengî hê pêk neanîye. Heta bi reforma wî ya herî navdar sîstema tendûristîyê ("Obamacare"), ku li gor Buroya Kongreyî ya Budceyê dê sala 2022yan 30 mîlyon amerîkîyan bêyî sîgorteya tenduristîyî bihêle, ji destpêkê ve ferz bû ji ber tercîhkirina Obama ya stratejîyeka mohrkirina lihevkirinên veşartî bi pîşesazîyên dermanxaneyê û ya nexweşxaneyan, li şûna rû bi rû mana bi nerazîbûna wan re. Û Obama red kiribû ku cemidandineka taybet û biha ya bacan ji bo sektora fînansî pêk bîne, yan jî dadgehkirina yek jî ji rêveberên Wall Streetê ku ji berpirspîyarên krîzê bûn. (4) Obama ne wekî Theodore Roosevelt yan jî Franklin Roosevelt e, wan xwestibû li hemberî berjewendîyên aborî yên xwedî hêza herî mezin rabin da ku li pey mijarên di rojeva wan yê ferehtir de bigerin, ew gelekî bi tedbîr tevdigere der barê şaşîyên tê kirin dema bi şirketên mezin re têkildar e.

Ji sala 1920î heta 2008an, bi tenê pênc serok du caran li ser hev hatin hilbijartin û di dirêjîya du dewran de desthilatdar bûn: Franklin Delano Roosevelt, Dwight Eisenhower, Ronald Reagan, Bill Clinton, and George W. Bush. Charles Krauthammer ku quncik-nivîskar e, nû li xwe mikur hat ku bi tenê dudu ji wan - Roosevelt û Reagan – bi rastî serokên guhertin pêk anîn bûn, ew bûn sedema "guhertina mijarên îdeolojîk" ku dihat maneya guhertina siyasî ya dewletê (5) duduyên din –Eisenhower û Clinton— bi awayekî nakokane piştgirîya bilindbûna serokên berîya wan wezîfedar bûn kirin yên ku endamên partîya dijber bûn (Roosevelt û Reagan). Ev jî bi rêya destnedana guhertinên bingehîn yên binesazîyê û mîrasa wan a îdeolojîk kirin. Eger Obama bixwaze bibe serokdewletê guhertinê divê di dawîyê de li hemberî navendîbûna nedîtî ya hêza aborî û siyasî ku serdema me terîf dike, rabe.

* Jerome Karabel, profesorê civaknasîyê li University of California at Berkeley, û nivîskarê *The Chosen: The Hidden History of Admission and Exclusion at Harvard, Yale, and Princeton / Yên bijartî: Dîroka Veşartî ya Qebûlbûn yan jî Lidervehiştinê ya li Harvard, Yale û Princtonê.*

(1) Ji bo nîqaşeka baş a der barê konsepta guhertina siyasî de binêrîn li John Judis, û Ruy Teixeira. *The Emerging Democratic Majority (Piranîya Partîya Demokrat a nû derdikeve holê)*. New York City: Scribner, 2002.

(2) Ibid

(3) Michael S. Lewis Beck, Charles Tien, û Richard Nadeau. "Obama's Missed Landslide: A Racial Cost?." (Serketina bi piranîyeka mezin a Obama ji destê wî çû: gelo sedema wê nijadperestî ye?) *PS: Political Science and Politics* 43.1 (2010): 69.

(4) Congressional Budget Office, *Estimates for the Insurance Coverage Provisions of the Affordable Care Act Updated for the Recent Supreme Court Decision*. (Texmînên li ser mîqdara pereyê ji sîgortayê re veqetandî ya qanûna alîkarîya dikare were dan ku ji bo biryara nû ya Dadgeha Bilind hê nû hat rojanekirin) hezîrana 2012an. Li ser stratejîya Obama ya muzakerekirina bi komên berjewendîyên sîgortaya tenduristîyê diparêzin, pirtûka li jêr bixwîne: Paul Starr, *Remedy and Reaction (Çaresekirin û Bersivdan)*, New Haven: Yale University Press, 2011, rûpel 194-238.

(5) Charles Krauthammer. "The Choice." (Tercîh) *The Washington Post*, 1ê çirîya paşîna 2012an.

Wergera ji îngilîzî: Feryal Guladawiya

www.arsivakurdi.org

Gef û axaftinên hinekî hişk: hevdîtina li ser budceya 2014-2020î ya Yekîtîya Ewropayê bîst û heft welat ji hev parçe kirin. Erê bal li ser daxwaza brîtanî ye ya ku dixwaze "bihayê" dikeve ser milê xwe bişikîne, belê ya ku dihêje tevahîya projeya ewropî ye. Welatên bakur dema ku bi rik dixwazin budceya ku jixwe daketîye %1î hilberîna hundir a safî a Yekîtîyê kêmtir bikin bi welatên başûr re tên hemberî hev. Welatên başûr li ser navê piştgirîyê doza bêhtir navgînan dikin. Dîsa ya ku li dijî vê lîstikê li ber xwe dide Berlîn e.

### Ji piştgirîyê ber bi hikimranîyê ve

# Ewropaya li hemberî hegemonyaya alman

Perry Anderson *

Di rohnîya kesên ew girtî – Kissinger, Begin, Obama– de ji romannivîs Gabriel Garcia Marquez re adet bû ku ji bo Xelata Aştîyê ya Nobelê bibêje Xelata Nobelê ya Şer. Xelata îsal kêmtir şerxwaz e, lê belê dîsa wekî yên berê cihê henekpêkirinê ye. Yekîtîya Ewropayê bextxweş e ku xelata Nobelê ya ku meriv dikare wekî ya Narsîzmê bi nav bike, wergirt. Em hêvî dikin ku komîteya Nobelê tiştê rast bike û sala bê xelatê bide xwe bi xwe.

Dîsa jî, rûmeta dan Bruksel û Strasbourgê, ya ku niha ew li ser nîqaşê dikin, bi awayekî meriv nikaribe mandel bike di wexta xwe de bû. Di salên pêş yên sedsalê de, kibir û nefsmezinîya ewropî her zêde dibe. Ev ew salên ku meriv îdîa bike ku Yekîtîyê –bi peyvên T*ony Judt ên dawî, yên ku deng vedan bi gelek stûnên din ên zanetîya ewropî re – 'numûneyeka bêqusûr' a bipêşketina civakî û siyasî pêşkêşî tevahîya merivatîyê kiriye. Ji sala 2009an ve birîna dijwar a Qada Euroyê şiroveya xwe ya xedar li ser van firînên hestan ên xweşakirinê hişt. Lê belê tevî vê jî gelo ew ji holê rabûn? Heke meriv wisa bifikire, ev* ne fikreka gihayî ye, meriv dikare vê yekê bi xêra mînakeka meha tebaxê bibîne. Jürgen Habermas hê nû pirtûkeka din a li ser YEyê berîya demeka kurt weşand; pirtûka wî ya pêşî *Ach Europa / Ax Ewropa* (2008) – li jor behsa wê tê kirin– bû, ya piştre *Zur Verfassung Europas / Li ser Destûra Bingehîn a Ewropayê* (2011) bû. Beşa pirtûka wî ya herî balkêş û navendî ceribandineka bi navê 'Krîza Yekîtîya Ewropayê li ber Rohnîya Destûrîkirina Hiqûqa Navneteweyî' ye, ew resmekî hêja yê vegera li nav xwe ya întellektuel e. Nêzî şêst rûpelan dirêj e û tê de qederê sed referansan hene. Ji çar paran sisîyên wan ên nivîskarên alman in. Bi ser de jî hema hema nîvê van jî yan yên sisê alîkarên wî ne yên ku ew malavahîya wan dike, yan jî yên wî ne. Yên mayî bi tevahî anglo-amerîkî ne, di nav wan de yên serwer –ji sê paran yekê nivîsan – ên David Held in, heyranekî brîtanî yê navdarîya Qedafî ya berîya demeka kurt. (1) Tu çandeka din a ewropî di nav vê pêşandana herêmparêzî ya xwecihî de cihê xwe nagire.

Ya ku merivan bêhtir bi xwe ve girê dide mijara ceribandinê ye. Sala 2008an, Habermas êriş bire ser Peymana Lîzbonê ji ber ku jê nehat kêmbûna demokrasîyê ya YEyê telafî bike, yan jî tu asoyên exlaqî-siyasî pêşkêşî wê nekirin. Ew dinivîse ku; erêkirina wê bi tenê dikare "qelşa heyî ya di navbera elîtên siyasî û welatîyan de saxlem û mayînde bike" bêyî ku tu rêya erênî bide ber Ewropayê. Li şûna wê pêdivî bi referandûmeka ji bo tevahîya Yekîtîyê hebû da ku Yekîtîyê bi ahengdarîya civakî û bacî gurçûpêç bike, jêhatîbûna eskerî û –berîya hertiştî– bi serokatîyeka yekser hilbijartî ya ku bi tenê dikare parzemînê ji siberojeka "li ser xetên ortodoks neo-lîberal bicihbûyî" rizgar bike. Em ji bîr nekin ku ev kelecana ji bo derbirîna demokratîk a vîna gel gelekî dûr bû û wî qet tu nîşanên erêkirinê nedan li welatê xwe bi xwe; ji awira wî ya ji rêûresmê, min şirove kiribû heke Peymana Lîzbonê bi zorê bidin qebûlkirin, Habermas dê bêguman dîsa jî bi rehetî wê berde kîsê xwe. (2)

Ev pêşdîtin kêm bû. Ne bi tenê bi rehetî ji xwe re kir mal, lê belê bi awayekî bi mubalexe bi zengil û defan Peyman da nasîn, Habermas êdî bi ser ve bû ew tu qelşên di nav elît û welatîyan de saxlem nake, berevajî, ew ne kêmî peymaneka û gaveka ber bi pêş ve ya berê nehatîye dîtin di azadîya merivî de, ew sûretê hîmên serwerîya ewropî ne hem di warê welatîyên Yekîtîyê de û hem jî di yê gelên wê de –ne di yên dewletan de-, modela sereke ye ji bo parlemaneka dinyayê ya ku siberojê wê pêk were. Ewropaya Lîzbonê rê ber bi "pêvajoyeka şarezakirinê" ve dibe ya ku têkîlîyan di navbera dewletan de pasîf dike, bikaranîna hêzê ji bo cezakirina yên ku Mafê Merivan binpê dikin sînordar dike, xetekê dikişîne ji "civaka me ya navneteweyî" ya ku destjênabe û hê jî dikare were başkirin ya îro ber bi "civaka kozmopolît" a siberojê ve, fermaneka Yekîtîyê ye ya ku bi firehî tevahîya merivên dinyayê hembêz dike. (3) Di rewşên xewn û xeyalên bextewerîyê de narsîzma dehsalên rabihurîya nêz, ên ku hê dûr in ji serdema xwe ya zêrîn, gihiştin paroksîzmeka [rewşa krîzên bi carekê lê belê demî, nota wergêr] nû. Di sê referandûman de hat derbirîn ku Peymana Lîzbonê ne behsa gelan, lê belê ya dewletan dike; ji bo nekevin ber vîyana gelî, ew bi zorê dan qebûlkirin; yên ku tabiê wê ne ji strukturên ku ew wan dihewîne pir zêde gumanê dikin; û qet ne star e ji bo mafê merivan, Yekîtîya ku ew wê wekî sîstem bi gewde dike bi êşkence û dagîrkirinê re kete nav hevkarîyeka qirêj, dema ev kir jî xirêniyek jî ji neqş û pirpirkên wê nehat –ev hemû di nav jixweveçûneka heyranmayîna li xwe de winda dibin.

Yek hizra merivî bi tenê jî bi vî rengî nikare wekî dîmenekî bimîne. Niha Habermasê ku ewqas xelatên ewropî lê bar bûne wekî lastîk û pişkokên bi generalekî breznevî ve, hîç guman jê nayên kirin ku qismî be jî qurbanê navdengîya xwe bi xwe ye: wekî Rawlsê li pêşîya xwe, ew li cîhaneka zêhnî pêçayî ye ya ku gelek heyran û şopgerên wî lê hene, ew her diçe kêmtir dikare bi fikrên bêhtirî çend milîmetroyan ji yên xwe dûr re nîqaşê bike. Gelek caran navê wî wekî xelîfê hemdemî yê Kant tê hildan, lê belê tehlûke heye ku ew bibe Leibnizê modern, bi wejevanîyeka eqlê selîm avakirina îlahîyateka felsefî ya ku tê de şeytanên deregulasyona malî jî para wan di qudsîbûna hişyarbûna kozmopolît de heye (4) û Rojava jî şiverêya demokrasîyê û mafê merivan ber bi baxçeyekî behişta nîhaî yê rewatîyeka merivperwer ve paqij dike. Heta bi vir ew hem cihêtî û hem jî xirabûna bûyereka taybet pêşkêş dike. Lê belê adeta ku Ewropayê wekî rehberekê ji dinyayê re dibîne, bêyî ku bêhtir zanîna der barê jîyana heyî ya çandî yan jî siyasî ya tê de nîşan bide, hê jî wekî xwe ye, û dîyar e wê ne bi tenê rê li ber musîbetên pereyê hevpar veke.

## Ber bi baxçeyekî behiştê yê ku meriv nikare jê bibihure

Tevlîhevîya ku vê yekê Yekîtî xiste nav, ne lazim e li vir were binxêzkirin. Ewropa ji Şerê Cîhanê yê Duyem û vir ve di kûrtirîn û dirêjtirîn westarîya aborî re derbas dibe. Ji bo ku meriv rewşa gavanên wê fêm bike, maneyek lazim e ji bo dînamîka di krîza Qada Ewroyê de li ser kar e. Em bi awayekî hêsan bibêjin, ev encameka pêrgîhevbûna du rûdanên kujer ên serbixwe ye. Ya pêşî teqîna di hundirê xwe de ya giştî ya sermayeyê xeyalî ye, ew sermayeyê ku bazarên li seranserê cîhana bipêşketî her di dewra dirêj a fînansîyalîzasyonê de pê meşîyan, ya ku salên heştêyî dest pê kir dema ku sektora reel sînordar kar dianî ji ber zexta rikberîya navneteweyî û rêjeyên mezinbûna aborî yên ku her deshsal kêm bûn. Çerxa vê hêdîbûnê û di hundir de ya xebitînên sermayeyê bi xwe, bi awayekî hakimane kite bi kite li nav çîrokeka fermandêr a raveker a kapîtalîzma bi pêşketî ji şer û vir ve, ji alîyê Robert Brenner ve li ber çavan hatiye raxistin. (5) Di berdêla vê de bandorên wê di pir zêde belavbûna deynê taybet û ê dewletê de ne bi tenê destekê dide rêjeyên karê, belê herweha palpişta qabîlîyeta hatinhilbijartinê ye jî. Berîya demeka kurt Wolfgang Streeck ev yek rave kir. (6) Aborîya amerîkî vê rêyê bi zelalîyeka pradîgmatîk nîşan dide. Lê belê mentiqê wê tevahîya sîstemê digirt nav xwe.

Li Ewropayê bi xwe mentiqekî din kete nav tevgerê bi yekbûna Almanyayê û sêwirandina yekîtîya pere ya li Maastrichtê erêkirî re, li pey wê jî Peymana Îstîqrarê hat, her du jî li gor daxwazên Almanyayê pêk hatin. Ya ku wê pereyê hevpar bi rê ve bibira wê bibûya Bankeyeka Navendî ya li gor sêwirandina Hayekî, ya ku ne li beramberî dengdaran, ne jî li hemberî hikûmetan berpirsîyar e, bi tenê berpirsîyar e beramberî bihayên biîstîqrar. Serwerîya li qada pereyê nû wê bibûya aborîya wê ya herî mezin; êdî ber bi rojhilat ve firehbûyî xwedîya rezervûwareka mezin a karkerên erzan e, yên ku hema li alîyê din ên sînorên wê ne. Ji bo Almanyayê mesrefên yekbûnê zêde bûn, van mesrefan mezinbûna aborîya Almanyayê ber bi jêr ve kişandin. Ji bo ku vê yekê telafî bike, sermayeyê alman zoreka berê nehatîye dîtin ya der barê kêmkirina mûçeyan de ferz kir, ji ber gefxwarina ku Polonya, Slovakya yan jî wêdetir wê şûna wan bigire, karkerên alman ev zor qebûl kirin. Encamên aborî ji bo başûrê Ewropayê bi tevahî dikarîn werin pêşdîtin. (7) Dema ku hilberîna febrîkayan zêde bû û mesrefên li karkeran ên nisbî kêm bûn, pîşesazîya alman ji her demê bêhtir dikarî hevrikîyê bike, bi vê jî her diçe para xwe di bazarên qada Euroyê de zêdetir kir. Li alîyê din li kevîyên Qada Euroyê, kapasîteya reqabetê ya aborîyên herêmî hatibû rawestandin bi deynkirina sermayeyeka erzan ji rêjeyeka faîzê ku li gor pêşdîtina fermanên almanî divîyabû li tevahîya qada pereyê hevpar bibe yek.

Dema krîza giştî ya zêde-fînansîbûnê ya li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê destpêkirî gihîşt Ewropayê, bawerî pê anîna bi deynê kevîyan kêm bû û tehlûkeya destpêkirina xelekeka îflaskirinên dewletan belav kir. Dema ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, desteka dewletê bi mîqdarên billind ên alîkarîya aborî ji bankayên îflas dikirin re destûr da bankeyên îflaskirî, şirketên mezin ên sîgorteyê û şirket ji rûxîyanê bifilitin, daxwaza çapkirina pereyan ji alîyê Rezerva Federal ve karîbû were kontrolkirin. Lê li Ewropayê du tiştan rê li ber çareserkirinên demî yên bi vî rengî digirt. Ne bi tenê destûra Bankaya Navendî ya Ewropayê, ku di Peyama Maastricht de nivîsî ye û kirîna deynên dewletên endam qedexe dikir pêwîst bû, bi ser de jî tu *Schicksalsgemeinschaft* –ev "civata qedera wan yek e" ya neteweya Weberî ye –tunebû da ku li birêveber û birêveberîyan qadeka siyasî ya hevpar ferz bike, qadeka ku tê de birêveber wê cezayekî giran bidin ji bo bi temamî înkarkirina pêdivîyên bingehîn ên birêveberîyan.

Di federalîzma qelp a Ewropî de, tu îhtîmal tuneye da ku Ewropa bibe 'transfer union" [yekîtîyeka cîhguhertina pereyan, şandina pereyan ji welatekî dewlemend ber bi welatekî feqîr ve, nota wergêr] ya li gor fikrên amerîkî. Dema krîzek dest pê bike, ne lêçûnên civakî ne, yên ku dikarin yekbûna Qada Ewroyê pêk bînin, lê belê fermana siyasî ye –Almanyaya ku lîder e ji komek dewletên piçûk ên bakurî re, xurtkirina bernameyên jixwekêmkirinê yên hişk li kevîyên başûr ku edî nikarin bi rêya kêmkirina nirxê pereyê xwe kapasîteya xwe ya reqabetê bilind bikin ferz dike, ev tiştekî weha ye ku Almanya ji bo welatîyên xwe nikare lê bifikire.

Dewletên xwedî hikûmetên lawaz di bin zexteka wisa de ji hev ketin û rûxîyan. Mekanîzmayên siyasi guhertin. Li Îrlanda, Portugal û Spanyayê rejîmên heyî ku di destpêka krîzê de desthilatdar bûn bi rêya hilbijartinan hatin dûrxistin û birêveberên ku çareserîyên hişktir pêşdibînin, li şûna wan hatin bicihkirin. Li Îtalyayê, pûçbûna dewletê ji hundir ve û destêwerdana ji derve ve bûn sedema bicihkirina desteyeka wezîran a ji teknokratan pêk tê li şûna desteyeka wezîran a ji parlementeran pêk dihat, ev desteya wezîran ne pêwîst bû were hilbijartin jî.


Li Yûnanistanê, rejîmeka ji alîyê Berlîn, Parîs û Brukselê ve ferzkirî, welat xist nav rewşeka ku ya Awûsturyaya sala 1922yan tîne bîra merivan, hingê Ententê Komîsyonerekî Bilind şandibû Vîyanayê –li ser navê Lîga Neteweyan– da ku aborîyê li gor berjewendîyên xwe bi rê ve bibe. (8) Bi awayekî ne gerdûnî, fermanên ji bo ji nû ve geşkirina bawerîya bazarên fînansî bi herêmên di bin kontrola wan de tê maneya kêmkirina lêçûnên civakî, deregulasyona bazaran, arizîkirina milkên dewletê: ango tê maneya pêkanîna repertuwara standard aneo-lîberal, û li zêdekirina ferzên bacê yên girantir. Ji bo ku vê yekê bi temamî pêk bînin, Berlin û Parîsê biryara ferzkirina budceyeka lihevderketî li hivdeh neteweyên endamê Qada Euroyê dan – tiştekî bi vî rengî ji mêj ve li Amerîkâyê wekî slogana mafê bêaqilbûnê tê nirxandin.

Dermanên lihevçêkirî yên 2011an dê nexweşîyên Qada Euroyê baş nekin. Rewşa deynên mezinbûyî yên dewletan dê tucarî venegerin asta xwe ya berîya krîzê. Hejmara kesên bi tenê xwedî deyn jî wê kêm nebe – berevajîyê wê: li gor hin pêşdîtinan, deynên bankeyan yên ji alîyê dewletê ve nehatî misoger kirin, biqasî 1.3 trîlîyon dollaran in.

## Çarenûsên bi tevahî cuda

Pirsgirêk hê xirabtir in, derman jî bêtesîrtir in, desthilatdar jî lawaztir in, ji ya ku bi awayekî fermî tê qebûlkirin. Dema eşkeretir dibe ku şopa şaşîyan wê bimîne, îhtîmala domandina tedbîrên ji alîyê Merkel û Sarkozy ve hatî lihevçêkirin kêmtir dibe. Bêguman, hevkarîya di navbera her duyan de tu cara xebateka wekhev nemeşandin "dibe ku şiklên hişktir yên hêza alman, xurtkirina bazarê ku fermana kontrola bilind in, yan jî ya bankaya navendî ne, pêk werin". Berîya destpêka krîzê min nivîsî bû: "hê zû ye ji bo meriv behsa *Grossmacht*eka ("hêzeka mezin") a herêmî bike. (9) Almanya ji herkesî zêdetir behsa sedema dawî ya krîza ewroyê dike ya ku sîstemeka zor û zextê li ser mûçeyan li hundirê welêt ferz dike û ku li derveyî welet jî sermayeyê serbest dike. Almanya muhendîsa sereke ya hewldanên derxistina sûravkên krîzê di serê feqîran de ye, ew hewl dide berdêla krîzê bi xizanan bide dayîn. Bi vê maneyê dema hatina desthilatdareka nû ya ewropî hat. Pê re jî, yekem manîfestoya desthiladarîya biryardar a Almanyayê di nav Yekîtîyê de derket holê.

Di gotara herî bi têsîr a rêxistina raya entelektuelên Komara Federal de, hiqûqzanê konstanzî Christoph Schönberger, di *Merkurê* de rave dike ku şiklê hegemonyaya Almanya wê li Ewropayê pêk bîne, tu elaqeya wê bi "şîara axaftineka dij-împerpîyalîst ya bi awayê Gramsci " re nîne: ji bo meriv bikaribe fonksîyona sereke ya dewleta xwedî hêza herî mezin



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, mirekeb li ser kaxezê, 70 x 50 cm

di nav sîstema federal de dîyar bike, wekî ya Prûsya li Almanyaya sedsala 19an û destpêka sedsala 20î, divê di nav tevahîya maneya destûrî de ya ku Heinrich Triepel rave dike, mesele were fêmkirin. Yekîtîya Ewropayê sîstemeka wisa ye -ew zêdetir konsorsîyumeka nav-hikûmetî ye ku di Konseya Ewropayê de hatine cem hev, ku biryarê wan mitleq ji gel "veşartî"ne û bi tenê yek xeyala wê dikare hebe, ya bûna "kûlîlka şîn a demokrasîyê ku ji tevahîya çopên sazîyên cîhanê rizgarbûyî ye". (10) Lê ji ber ku mezinahî û giranîya dewletên di Konseya Ewropî de temsîla wan heye qet ne wekhev e, wê realîst nebe ku meriv bifikire ew ê bikaribin hevkarîyê di şert û mercên wekhev de bikin. Ji bo ku bixebite, pêdivîya Yekitîya Ewropayê bi dewleteke heye ku xwedî girîngîyeka cihê ye di warê serjimarê û di warê refah û dewlemendîyê de. Hegemonyaya Almanyayê ji Ewropayê re lazim e û divê alman êdî dev jê berdin ku şerm bikin dema ku vê yekê pêk tînin. Fransaya ku cebilxaneya wê nukleer û şûna wê ya li Konseya Ewlekarîyê êdî kêm girîng in, divê li gor vê rewşa xwe daxwazên xwe eyar bike. Wê baş be ku Almanya Fransayê bi rê ve bibe, çawa ku Bismarck elaqedarê Bavyerayê bû di vê sîstema din a federal a bi navê Kaisereichê de, yanî bi rêya xweşkirina dilê endamên herî lawaz bi xelatên sembolîk û tewazûnên burokratîk, çawa ku di dema serwerîya Prûsyayê de kiribû. (11)

Bersiva pirsa gelo dibe ku Fransa ewqasî bi lez piçûk bibe, heta ku dakeve statûya Bavyerayê di dema Reicha Duyem de, hê ne kifş e. Fikra Bismarck li ser bavyerayîyan tê zanîn: "di navbera awûsturyayîyekî û merivekî de". Dema ku meriv lê bifikire ku Parîsê li hemberî mijarên ji bo Berlînê li pêş serî tewand, di çarçoveya birêveberîya Sarkozy de, ev şibandin zêde ecêb nîne. Lê dibe ku meriv behsa paraleleka baştir bike, ev yek wê zêdetir nûjen be. Di van salên dawîyê de, tirsa çîna siyasî ya fransî ji mayîna li derveyî projeyên alman ên ji bo Yekîtîyê û daxwaza wê ya tevli bûna van projeyan, "têkîlîya taybet" a din her diçe zêdetir tîne bîra merivî, ew têkîlîya taybet a di navbera brîtanî û amerîkîyan de: Ingilîstan timî dixwaze bibe eskera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Dibe ku meriv jixwe bipirse gelo ev serîtewandina Fransayê wê heta kengî dewam bike, bêyî ku tu bersiv were dayîn. Sekreterîya Giştî ya Yekîtîya Xirîstîyan Demokrat pesnê xwe dide "niha Ewropa bi almanî dipeyive", lê belê ev yek ji xweşkirina dilan zêdetir rê li ber rabûna hêrsê vedike. Ji ber gelek sedeman, û zêdetir ji ber pir xirabbûna sîstema hilbijartînê ya fransî, di Yekîtîya Ewropayê de tu çîna siyasî bi qasî ya Fransayê xwedî nêrîneka bi tevahî konformîst tuneye. Ji Hollandayê hêvî kirin ku wê stratejîyeka serxwebûna aborî ji ya Sarkozy xurttir pêk bîne, wê bibe serketina hêvîyê û têkçûna tecribeyê. Ji ber heman sedemê jî tu weletê din tuneye ku lê qubûna di navbera fikra gel û teşwîqên fermî de ewqasî kûr û dewamî be.

### Têkîlîyeka nû ya "taybet"

Hollanda wekî Rajoy bû desthilatdar, ango bêyî ku dengên ji dil ên dengdaran bigire, ew hat hilbijartin lewra ew yekane alternatîfa di destê merivan de bû, û bi destpêkirina tedbîrên jixwekêmkirinê re bi hêsanî dikarî were lawazkirin. Di sîstema neolîberal a ewropî de, ku Hollanda bû birêveberê wê yê herêmî, pirsgirêkên girîng ên civakî li benda wî ne yên ku heta niha li Yûnanistanê xwe dane der,– herçiqasî hin nîşanên teqînê li Spanyayê derketibin holê jî. Li deverên din elît wê dengê girsêyan bibihîsin. Tecrûbeya me ya pasîfmayîna rûsî li hemberî felaketa desthilatdarîya Yeltsin, nîşan dide ku tu garantî nîne ku rejîmeka zor û zextê ya bi şidetê wê bibe sedema teqîna hêrsa gel û nebe sedema bêdengbûna wî. Lê gelên Yekîtîya Ewropayê biqasî gelê rûs belengaz nîne, û heke şert û merc gelekî xirabtir bibin, sebra wî dikare zûtir biqede. Tiştê ku tevahîya senaryoyan dîyar dikin mixabin ev rastî ye, heke krîza ewroyê bêyî ku berdêla wê li ser ên herî lawaz bikin bar were çareserkirin jî -ev îhtîmaleka pir piçûk e- wê berepaşçûna mezinbûna aborî ku sedema vê krîzê ye, bidome.

* Nivîskarê ceribandina Le Nouveau Vieux Monde. Sur le destin d'un auxiliaire de l'ordre américain / Cîhana nû ya kevin. Li ser çarenûsa alîkarekî nîzama amerîkî, Agone, Marseille, 2011.

(1) Held patron û kontrolvanê teza Seyf Qedafî bû li London School of Economicsê. Seyf li wir doktoraya xwe bi dest xist roja ku Lîbyayê bêşeka mezin weqfî zanîngehê kir, lê Seyf teza xwe nenivîsîbû. Dema ku skandal derkete holê Held neçar ma ji zanîngehê veqete û birêveberê LSEyê jî neçar ma îstîfa bike.

(2) Binêre li *Le Nouveau Vieux Monde / Cîhana Kevin a Nû*, Agone 2011, rûpel 651-655. Sala 2005an, Habermas bi awayekî bêsebir mudaxilî referandûma li Fransayê ya der barê Destûra Bingehîn a Ewropayê de bû. Wî hişyar dikir ku redkirina destûrê wê bibe felaketek. Pê re jî, ya rastî, berê li ser mijara Maastrichtê, li hemberî nebûna şewra bi gel re li ya Almanyayê bi tevahî bêdeng bû.

(3) *Zur Verfassung Europas/Derbarê destûra bingehîn a Ewropayê de*, Frankfurt 2011, rûpel 82-96.

(4) 'The cunning of economic reason / Jîrtîya mentiqê aborî': *Zur Verfassung Europas*, r. 77.

(5) Binêre li *The Economics of Global Turbulence / Aborîyên Keftûlefta Global*, London-New York 2006, û taking the story up to the crash of 2008 / Em serpêhatîyê bibin heta bi ketina borsayê ya 2008an, 'L'économie mondiale et la crise américaine / Aborîya cîhanî û krîza amerîkî', di *Crise financière globale ou triomphe du capitalisme?/Krîza malî ya global yan jî serketina kapîtalîzmê?*, *Agone* 49, 2012. Ji bo sempozyûmeka li ser karê Brenner ji alîyê rayedarên sereke yên ji qada ingilîzîaxêv, Ewropa û Japonyayê - Nicholas Crafts, Michel Aglietta û Kozo Yamamura – binêre li *New Left Review* 54, çirîya paşîn-kanûna pêşîn 2008, rûpel 49-85.

(6) 'The Crises of Democratic Capitalism / Krîza Kapîtalîzma Demokratîk', *New Left Review* 71, îlon-çirîya pêşîn 2011, rûpel 5-29

(7) Ji bo daneyên der barê bihayê mûçeyên alman di navbera 1998 û 2006an de û ji bo pêşdîtineka bandorên wan li ser aborîyên başûr, binêre li *Le Nouveau Vieux Monde / Cîhana Kevin a Nû*, rûpel 81-82 .

(8) Yê ji bo vî karî neqandî şaredarê rastgir ê Rotterdamê Alfred Zimmerman bû, dilsozekî jêbirina hewldaneka hollendî ya dixwest texlîdê şorişa çirîya paşîn a 1918an ya alman bike, ew heta sala 1926an di kontrolê de ma. 'Wî bi awayekî bêwestan rexne li hikûmetê girtin, kêmasîyên wê derxistin pêş, doza her diçe bêhtir sexbêrîtîyê, her diçe bêhtir fedakarîyê ji tevahîya çînên civakî kir' û zext kir 'li hikûmetê da ku budceya xwe biîstîqrar bike li qonaxa pir li jêrtir', bibe xwedî helwêst 'heta ku ev pêk were jî divê kontrolê dewam bikira': Charles Gulick, *Austria from Habsburg to Hitler / Ji Habsburgê heta bi Hitler Awûsturya*, Berkeley 1948, berg I, rûpel 700.

(9) *Le Nouveau Vieux Monde / Cîhana Kevn a Nû*, rûpel 82.

(10) Sembola Novalisê ya daxwaza bêdawîbûnê veguherî gotineka manedar a almanî.

(11) Christoph Schönberger, 'Hegemon wider Willen. Zur Stellung Deutschlands in der Europäische Union / Li hemberî daxwaza yê hegemon. Der barê cihê Almanyayê di Yekîtîya Ewropayê de', *Merkur*, hejmar 752, kanûna paşîn 2012, rûpel 1-8 – yekemîn hejmara rojnameyê di bin birêveberîya edîtorekî nû de. Îlhama zêhnî ya ji bo fikra çêkirî ya Schönber, hiqûqzanê dema navbera her du şerên cîhanê Henrich Triepel bû, ew ne bi tenê heyranekî Bismarckê Almanya dixist bin hegemonya Prûsyayê bû. Sala 1933yê wî bi binavkirina "şoreşa legal" bixêrhatina desthilatdarbûna Hitler kir û pirtûka xwe ya der barê hegemonyayê de sala 1938an qedand, di dawîya wê de jî nivîseka pesindayîna Führer dinivîse û pê Hitler wekî zilamê dewletê yê ku bi îlhaqkirina Awûsturya û Sudetenlandê di dawîyê de xewna ji berê de ya alman a dewleteka bi tevahî yekbûyî pêk anî, terîf dike: *Die Hegemonie. Ein Buch von führenden Staaten / Hegemonya. Pirtûkek li ser dewletên sereke*, Stuttgart 1938, rûpel 578.

Wergera ji îngilîzî: Feryal Guladawiya

# Mîrasgirên Blairîzmê

KIRASEITH DIXON

Havîna 2012an, bêyî ku tu kes bi vê yekê bi rastî kêfxweş bibe –alîgirên wî jî serê xwe pê neeşandin-, kevne-serokwezîrê brîtanî (di navbera 1997 û 2007an de desthilatdar bû) Anthony Blair daxwaza xwe ya vegera li siyasetê da zanîn. Weha xuya ye ku bi awayekî nakokane, da ku beşeka mîrasa blaîrîzmê bandora xwe li alîgirên partîya karker bidomîne divê qehremanê wan ê têkçûyî xwe dûr bixe. Ew û mîrasgirê wî Gordon Brown, kirin ku partîya wan di navbera 1998 û 2010an de 5 mîlyon dengan winda bikin. Lewra Edward Milibandê serokê partîyê yê îlona 2010an hilbijartî, dîplomasîya qutbûna ji Tony Blair bi kar tîne, û ji alîyê beşeka çapemenîyê ya îhtîmaleka mezin çavê wê baş nabîne ve wekî "Edê Sor" tê binavkirin. Lewra ji hingê ve, ev qutbûna behskirî zêdetir bi xêra redkirina serdema blaîrîst pêk tê li şûna ku bi rêya helwêsteka baş amadekirî biqewîme.

Jixwe, wekî ku bîyografîya Mehdi Hasan û James MacIntyre (1) bi bîr dixe, ew kurê yek ji teorîsyenên herî girîng ên marksîstên brîtanî bi navê –Ralph Miliband– e ku di nav qesra New Labour [Partîya Karker a Nû] de hat perwerdekirin û tu cara jê dûr nebû. Wekî gelek endamên hikûmetên dawî, Miliband perwerdeya xwe li Oxford û Harvardê diqedîne û xisleta anglo-amerîkî ku êdî naguhere ya elîta nû ya brîtanî nîşan dide. Bilindbûna wî di partîyê de bi piştgirîya Brown pêk hat, ew şewirmendê wî yê taybet bû ji bo karên aborî. Piştre ji 2007an û vir ve, di hejmara 10an a Downing Streetê de, ew bû yek ji hevkarên wî yên bawerîya xwe pê dianî.

Îhtîmaleka mezin ev agahîya detay a dawî ya karîyera Edward Miliband biryardarîya hin blaîrîstan xurt kir –yên nerazîbûna wan ji Brownê carininan zêde bandor li nêrîna wan a li ser cîhanê hebû– ji bo piştgirîya birayê wî David, di ketina wî ya nav rêveberîya partîyê de. David Miliband wekî mîrasgirê herî adetî dihat hesibandin, û mezintirîn rêxistinên karkeran didan zanîn ku ew ê piştgirîya wî mîrasgirên Milibandî bikin ê ku soza guhertina rêya partîyê bide. Ji wê demê ve, Edward Miliband ku dixwest îmaja xwe ya "namzedê rêhevalan" xira bike, redkirina wî ya "grevên bê berpirsîyarî" gelek caran dubare kir –bi awayekî ne seranser behsa "zivistana nerazîbûnê" ya 1978-1979an dike. Hingê hejmareka mezin a xwepêşandanan li dijî siyaseta jixwekêmkirinê ya hikûmeta Partîya Karker a wê demê pêk hatibûn. Di folkora blaîrîstê de ew sembola jirêderketina çepgir a tevgera karkerên brîtanî ye. Bi vî rengî Milliband bû wekî Alastair Darling. Ew di bîranîna xwe ya serdema wan "hezar rojên" navbera 2007 û 2010an de ya ku wî bi wezîfeya Wezîrê Aborîyê yê Qralîyetê derbas kiribû, pesnê "navendîbûna radîkal" a Partîya Karker a nû dide. Herçî fêmkirina berpirsîyarîya wî ya di nav pêkhatina krîza aborî ya 2007an de ye, ew di heman demê de korbûna alîgirên xwe piştrast dike.

Miliband ku bi adeta blaîrîst re dilsoz e, versîyona xwe ya "sêkoşebûna" siyasî [wextê namzedekî îdeolojîya xwe wekî tişteкî bilindtir ji dualîtîya çep û rastê, îdeolojîyeka ku di heman demê de çepgir û rastgir be, nota wergêr] da. Ev ew huner e ku destûrê dide ku partî di hilbijartinan de dengê dijminê xwe bistînin, vê yekê jî bi parastina fikra "*one nation*" (yek netewe) pêk tînin. Ev fikir berê ji alîyê serokwezîrê muhafezekar Benjamin Disraeli (1804-1881) ve dihat bipêşxistin, wî dixwest şiklekî bavkanîya muhafezekar biafirîne. Lê belê rojnamevan Seumas Milne, weha dinirxîne, "*çi yek netewe ye, çi jî na, tu eleqeya berjewendîyên bêkarên sektora avahîsazîyê bi yên îdareya fonên spekulatîf dimeşînin re tuneye*". (3)

Miliband îdia dike ku ew dengdarên ji wan dûrketî fêm dike. Wekî Darling, ew xwe dûrî siyaseta şerî ya Blair dike û heta sond dixwe, dibêje ku wî destwerdana li Iraqê ya anglo-amerîkî erê nekiriyê. Rojnivîskên birêveberê beşa ragihandinê ya buroya Blair, Alastair Campbell, tiştên dikin ku grîzok bi laşên merivî bigirin, eşkere kirin. (4) Wekî nivîsa Darling, bîyografîya Hasan û Macintyre jî bi bîr dixe ku rêya nû ya partîyê zehmetîyê dikşîne vîzyonekê biafirîne ku bibe alternatîfa ya bi tundî piştgirîya koalîsîyona David Cameron bi rê ve dibe dike. Jixwe Cameron heyranekê eşkere yê Blair e. Û mirov dikare bifikire ku Disraeli wê alîkarîya ji karkeran re bi rastî pêwîst e, nede wan…

(1) Mehdi Hasan û James MacIntyre, *Ed : The Milibands and the Making of a Labour Leader,* (*Miliband û avakirina lîderekî Partîya Kaker)* Biteback Publishing, London, 2012, 352 rûpel, 9,09 sterlîn.

(2) Alistair Darling, *Back from the Brink. 1000 Days at Number 11 (Vegera ji Brinkê. 1 000 rojên li hejmara 11an derbas kirî)*, Atlantic Books, London, 2011, 336 rûpel, 14 sterlîn.

(3) Seumas Milne, "Ed must move further and faster from New Labour" (Divê Ed ji Partîya Nû ya Karker bi leztir û dûrtir biçe), *The Guardian*, London, 3yê çirîya paşîna 2012an.

(4) Alastair Campbell, *The Burden of Power. Countdown to Iraq (Barê giran ê desthilatdarîyê. Hindik ma ji midaxaleya li Îraqê re)*, Hutchinson, London, 2012, 752 rûpel, 16,75 sterlîn.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

Li refên giran ên pirtûkxaneyên zanîngehan êdî pirbûneka kovarên li ser tevna Înternetê pisporbûyî zêde dibin, ew bêyî dereng bimînin û gelek caran bê astengên peredayînê encamên dawî yên labaratuwarên lêkolînan pêşkêş dikin. Ev veguherîn dike ku zanyar modelên xwe yên weşanê bixin ber lêpirsînê da ku wan bixin xizmeta zanîn û gelemperîyê.

# Lêkolîna bi pereyên gelemperîyê, kovarên taybet

RICHARD MONVOISIN *

Yan biweşîne, yan jî mirarî bibe": ev hevokeka zoolojîst Harold J. Coolidge (1) e ku jîyana lêkolînerekî bi kurtî terîf dike. Ji bo prestîja wî ya akademîk ne girîng e ku dersdarîya wî harîqulade be, xwendekarên wî baş bên perwerdekirin yan jî sibehan ji hevpîşeyên xwe re qehweyê çêbike: nirxandina xebata lêkolînê di dawîyê de bi tenê xwe dispêre kom û kalîteya gotarên di kovarên zanistî de weşandî. Di vê mijarê de ya kilît pêşkêşkirina encamên birêkûpêk in ku serî li xwendin û hûrûkûr lênerîna ji alîyê pisporên beşê ve –halê hazir jê re xwendina ji alîyê hempîşeyan ve tê gotin , yan jî *peer-review-*, tewandine.

Weşan li gor beşa lêkolînê dabeş û pispor bûne. Bi vî awayî pisporekî dîroka modern a Fransayê dikare ji nav deh heb kovarên li Fransayê yekê bineqîne û nêzî sed kovarên xebatên lêkolînê yên beşa fizîkê tên qebûlkirin. Ji bo meriv biryarê bide ka divê li derîyê kê bide, divê meriv hedefên xwe li gor faktora bandora kovarê eyar bike, ango li gor nirxê wê li ser bazara zanistê. Ev nirx xwe naspêre hejmara xwendevanan, lê belê xwe dispêre hejmara navînî ya jibergirtinên ji gotarên kovara navbirî di gotarên din ên zanistî de. (2) Çêtir e meriv xwe baş ji nîşanê bigire: heke pir li jêr be (kovareka kêm tê nasîn), û gotar hingê wê li gor nirxê xwe yê heq dike neyê nirxandin, elaqeya vê jî bi kalîteya wê re nîne; heke pir bilind be (weşanên pir baş), hingê dibe ku bi mehan di dema jinûvexwendinê de asê bibe û di dawîyê de jî were redkirin. Ji ber ku hevrikî di navbera komên lêkolînê de xurt e, ew tehlûke heye ku meriv berîya bigihêje armancê hinên din bidin pêşîya merivî.

Nivîskarê gotarê ti pereyan nastîne, bi ser de jî gelek caran labaratuwara wî mecbûr e tevlî dana lêçûnên sekreterî yan jî çapê bibe. Di berdêla vê de ya ew bi dest dixe sermayeya sembolîk (qebûlbûn, prestîj) e: mafê îşaretpêkirina navê gotarê –a ku li faktora xwe ya bandorê pêçayî ye– di jînegerîya xwe de. Heçî ji bo nirxandinê gotarê dixwîne ne, zanyarên anonîm in ku kovar vî karî dide wan; ew jî heqdest nastînin, bi tenê sermayeyeka sembolîk bi dest dixin. Dema lêkolînerek di beşeka pir zêde nazik de ji bo weşana nivîsekê serlêdanê dike, carinan dadgerên wî jî di heman pêşbazîya wekî wî de ne. Bêguman, duristî û niyeta baş serdest in, û heke mijar lihevnekirina berjewendîyên li ser patentê bin, hingê mimkin e meriv ji destpêkê ve kesekî nivîsê binirxîne, yê hevrik red bike. Lê belê şerên bandorê û lihevqelibîn bivênevê wê biqewimin. Lêkolîna modern xwe vediguherîne arenayeka ku tê de bi sedan cirdên çîyê dibezin ên ku mîna di klasîkên lîstikên vîdeoyê de, golikên dohn, qaşûlên mûzan û şemitandina piyan zêde dikin.

Ev mekanîka **ne-kooperatîf [?]** îro weha dîyar e ku "*bîhn lê çikîya be*" (3) û xwe dispêre kalîteya hilberîna zanînê. Kovarên mezin xitimîne; encamên bi dawî nebûyî, yên elaqeyeka navînî, carinan bi lez û bez tên weşandin; encamên neerênî –ango ên meriv bi hêsanî ji wan bawer nake– , tevî ku pir bikêr in jî qet nayên weşandin. (4)

Û sîstema *peer-review* bi xwe jî pir jê dûr e ku duristîya tevahîya weşanan misoger bike. Encamên bi hîle, ji bo ku balkêştir bin makyajkirî, heta bi tevahî lihevhatî anîn, bi awayekî birêkûpêk di vê fîltreyê re derbas dibin. Em dikarin behsa bûyera Jan Hendrik Schön fizîkvanê alman ê labaratuwarên Bellê bikin, ê ku sala 2001an lê hat eşkerekirin; em dikarin behsa bîyolojîstê ji Koreya Başûr Hwang Woo-suk ê sala 2005an ji erkên xwe bû, bikin; yan jî em dikarin behsa psîkolog Diederik Stapel ê sala 2011an îstîfakirî bikin. Piştî ku hivdeh mîlyon weşanên zanistî yên di navbera 1950 û 2007an de derketî, yên ku li gor Hîmê Agahîyan Medlineê îşaret bi wan hat kirin di ber çavan re derbas dikin, lêkolîner Murat Çokol, Fatih Ozbay û Raul Rodriguez-Esteban dibînin ku rêjeya redkirina gotaran ji alîyê kovaran ve "*zêde dibe*", û ji dema pêkhatina hetîketîyên pêşî yên salên 1970yî yên zanistî û vir ve pir darî çav e ev yek. Van hetîketîyan kiribû ku ofîsa hevgirtinê ya zanistê ya amerîkî Office of Research Integrity (ORI) were damezirandin. (5)

Nirxandina lêkolîneran jî derbekê dixwe: Lêgerîna li jibergirtinan awayekî bazirganîya bandorê derxist holê, ya ku, wekî mînak, dike ku meriv referansan bi hevalên xwe bike. Wekî din gotarên ku navên bi dehan kesan li bin danîne jî hene: navên lêkolînerên ciwan ên ku karê sereke dikin û navên birêveberên labaratuwaran ên ku bi awayekî zelal kêm tevlî xebatê dibin –berguhertina birêveçûneka ku dikare rewa be ji bo xebatên damezrêner ên ku bi rastî jî gelek beşdarên wê hene. Ango ya ku civaknas Robert K. Merton jê re "tesîra Matthieu" dibêje (Matthieu yê Xas: "*Ji ber ku em ê bidin wî yê ku ji xwe xwedî mal e, ew ê di nav dewlemendîyê de xerq bibe, lê belê yê ku malê wî nîne, em ê ya di destê wî de jî jê bistînin*") diqewime, ev girêdana xelek bi xelek a çerxan ên ku bi rêya wan ên herî zêde xwedî avantaj, yên herî zêde referans bi wan tê kirin, meyildar in avantaja xwe beramber ên din zêdetir bikin, ewên din wê stûnên kovarên navînî û kêm tên xwendin dagirin.

Ev sîstem wekî din ji bo civaka zanistê pir biha ye jî. Bacên welatî didin lêkolînekê fînanse dikin, zanyar wê di kovareka xwe dispêre şirketeka taybet de wê biweşîne –carinan jî li ser hesabê xwe– û lêkolînerên din wê bêyî peran bidin, bixwînin, lê zanîngeh divê wê bi bihayê zêrî bikirin. Di dawîyê de maneya wê dikare bibe, nivîs û weşanên zanistî biha ne. Nîvê budceya xebitîna pirtûkxaneyên zanîngehan ji abonemanan re diçe, ev yek jî bi carekê rêxistinên kêmtir dewlemend dixe rewşeka bi dezavantaj û tesîrê li xercên zanîngehê yên xwendekaran dike. (6)

Weşanxaneya bi navê Elsevier xurt dibe û balê dikişîne ser xwe. Dîroka wê ya li bajarê Belçîkayê Louvainê heta bi salên 1580yî diçe. Kesekî bi navê Lodewiejk Elzevir (1542-1617) ê topograf şirketeka weşan û belavkirina pirtûkan nexasim jî ya klasîkên latînî didamezrîne. Şirketa malbatê çend deh salan di nav xizanîyê de jîyana xwe dewam kir û paşê sala 1712an bi nûnerên dawî re bi tevahî vemirî. Sala 1880yî li Amsterdamê Elsevier ji bo rûmeta vê weşanxaneya kevin hat damezirandin. Di nav hinekî zêdeyî sedsalekê de wê beşeka mezin a weşanên zanistî yên cîhanê kirin ên xwe. Sala 1993yan fuzyona şirketên Reed Indernational û Elsevier PLC rê li ber avabûna Reed-Elsevier vekir, piştî Pearson di nav dêwên weşangerîya cîhanî de di rêza duyem de ye. (7) Elsevier a êdî xwedîya kovarên *Cell*, *Lancet*, ya koleksîyonên pirtûkên mîna *Gray's Anatomy*, salê du sed û çil hezar gotaran di hezar û du sed û pêncî kovaran de diweşîne. Kara wê sala 2011an nêzî mîlyarek euro bû. (8) Ji bo hin pirtûkxaneyan bihayê abonetîya salane ya kovarên vê weşanxaneyê nêzî 40000 dolaran e. Ji bo ku xweş darîçav be em vê mînakê jî bidin, ji bo sed û bîst û heft sazîyên fransî yên ku kirîna mafê abonetîya elektronîk ji alîyê Ajansa Pirtûkxaneyan a Xwendina Bilind ve tê birêvebirin, mesrefa li weşanên Elsevier sala 2010an çûyî 13.6 mîlyon euro bûn.

Heta niha li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, adeta Sazîyên Neteweyî yên Tendirustîyê bû ku ji lêkolîneran bixwazin ku encamên xebatên bi bacên welatîyan hatî fînansekirin, ji bo herkesî vekirî bin. Dema ku pêşnûma-qanûneka vê nêzîkatîyê qedexe dike kanûna sala 2011an li Kongreyê hat pêşnîyaz kirin, gelek zanyaran serî li ber rakir. 21ê kanûna paşîna 2012an matematîkvan Timothy Gowers ê sala 1998an madalyaya Fields wergirtî, da zanîn ku ew êdî Elsevier boykot dike. Li gor gotareka di *The Guardian*a li Londonê û paşê di *New York Times*ê de (9), sîh û çar matematîkvanên din jî dan ser rêya wî. Di demeka kurt de kampanyayeka îmzeyan a bi navê "The cost of knowledge" ("bihayê zanînê") a ku bêhtirî deh hezar lêkolînerên akademîk mohr kirî hat destpêkirin. Zanîngeha Parîs VIê ya ku salê milyonek euroyan dide abonetîyên xwe, boykot dewr girt. Pirtûkxaneyên bi abonetîyan ve girêdayî bi tenê vê yekê piştrast dikin; wekî mînak a Harvardê salê 3.75 mîlyon dolaran ji bo kirîna kovaran mesref dike, û konseya wê ya birêveber du hezar û sed profesor û lêkolînerên xwe teşwîq dike ku lêkolînên xwe li ser Înternetê belav bikin. (10) Birêveberê pirtûkxaneyê Robert Darnton got (11), "*ez hêvî dikim zanîngehên din jî wê heman tiştî bikin. Em hemû bi heman nakokîyê re rûbirû ne. Em lêkolînan dikin, gotaran dinivîsin, ji bo referanskirina gotaran ji alîyê lêkolînerên din ve em dixebitin, hemû jî bêpere...Û piştre, em encama xebata xwe bi bihayekî pir zêde dikirin.*"

Ji bo dema dirêj bêguman li pêşîya civaka lêkolîneran ji tercîha ku zorê bide sîstemê û çareserîyên xwe bi xwe bi pêş bixe, pêve wê kêm tercîhên din hebin. Ev çareserî jixwe hene, nexasim jî ji alîyê weşanên azad û ji bo xelkê vekirî (bi malperên PloS, HAL, arXiv...), û divê meriv li ser bixebite da ku kalîteya wê misoger bike.

* Lêkolîner, endamê Kolektîfa Lêkolînên Navdisîplînan Fikra Rexnegir û Zanistan (Cortecs), Grenoble.

(1) Harold Jefferson Coolidge, *Archibald Cary Coolidge : life and letters / Archibald Cary Coolidge : Jîyan û Name*, 1932.

(2) Faktora bandorê fikra Eugène Garfield e, ew damezrênerê Institute for Scientific Information e ku yekemîn *Science Citation Index*a wê sala 1963yan hat weşandin.

(3) Laurent Ségalat, *La Science à bout de souffle? / Bîhn li zanistê çikîya*, Seuil, Parîs, 2009.

(4) Brian Martinson, Melissa Anderson û Raymond de Vries, "Scientists behaving badly / Zanyar xirab tevdigerin", *Nature,* London, hejmar 435, 9ê hezîrana 2005an.

(5) Murat Çokol, Fatih Ozbay û Raul Rodriguez-Esteban, "Retraction rates are on the rise / Rêjeyên paşvekişandinê zêde dibin", *EMBO reports*, 2008.

(6) Gotara li jêr bixwîne: Isabelle Bruno, "Pourquoi les droits d'inscription universitaires s'envolent partout / Ji bo çi heqê qeydîya li zanîngehan li her derê pir zêde dibe", *Le Monde diplomatique,* îlona 2012an.

(7) *Livres Hebdo,* Parîs, 22yê hezîrana 2012an.


(8) Reed Elsevier, *Annual Reports and Financial Statements 2011*, www.elsevier.com/about/annual-reports

(9) "Scientists sign petition to boycott academic publisher Elsevier / Zanyar kampanyayeka îmzeyan mohr dikin da ku weşangerê akademîk Elsevier boykot bikin", *The Guardian,* London, 2yê sibata 2012an ; "Mathematicians Organize Boycott of a Publisher / Matematîkzan boykota weşangerekî organîze dikin", *The New York Times,* 13ê sibata 2012an.

(10) Faculty Advisory Council Memorandum on Journal Pricing, "Major Periodical Nikarin Werin Dewamkirin", 16ê nîsana 2012an, www.harvard.edu

(11) Gotara li jêr bixwîne: Robert Darnton, "La bibliothèque universelle, de Voltaire à Google / Pirtûkxaneya Gerdûnî ya Voltaire li ser Googleê", *Le Monde diplomatique,* adara 2009an.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxeza rengîn , 70 x 50 cm



Adar 2004

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ket dafikê

# Ji kurdên Iraqê re xweserîyeka çawa?

Michel Verrier *



Mohammad Ismail: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxeza rengîn , 50 x 70 cm

Di dema niqaşên pêşîn li ser nivîsîna destûrnameya nû ya Iraqê de, ji bilî rola Îslamê di birêvebirina dewletê de, statuya Kurdistanê astengeka mezin pêk tîne. Kurdan dev ji armanca serxwebûnê berdaye, lê bi şertê ku destûrnameya federalî xweserîya wan bêkêmasî piştrast bike. Ew her wisa daxwaza bajarê Kerkûkê dikin û dixwazin hêzên wan ên leşkerî, pêşmerge, bimînin. Redkirina van şertên kurdan dê şerê wan xurt bike.

Kurdistana Iraqê piştî şerê Kendavê yê sala 1991î hatibû rizgarkirin û şerê 2003yan, berovajî alîyên din ên wî welatî, ew herêm venegirt. Îcar ji meha nîsanê heta kanûna pêşîn merivî dikarî ji sînorê Îranê, di Silêmanîye û Hewlêrê re, xwe bigihîne sînorê Tirkiyeyê û di wê rêyê de hema bibêje tu serbazên amerîkî nebîne. Me yekem nobedarên leşkerî li Kerkûk û Musilê dîtin, du bajarên sereke yên bakurê Iraqê, ku di 10 û 11yê meha nîsana 2003yan de ji alîyê pêşmergeyan ve hatibûne rizgarkirin. Û her wisa cihên kontrolê yên Çemçemalê, bajarokê di navbera Silêmanîye û Kerkûkê de, niqteyên kontrolê hatine rakirin. Ew 10 sal bûn ku wan rêya kurdên ku dixwest biçin alîyên din ên Iraqê, an kesên ku ji alîyên din ên Iraqê dixwest werin çîyayên kurdan asê dikir.

Domandorên Çemçemalê girtin û ji sala 1991ê heta şerê vê dawîyê, leşkerê Iraqê li ser wan hatibû danîn. Selah Husên dibêje, *«Em ditirsîyan, wan serbazan gelek caran teqe li me dikir, gule li me dibarandin. Lê îro ew êdî nemaye.»* Meha nîsanê tu kes li ser cadeyan nebû, lê di dawîya çirîya paşîn de, zarokan li bin tavê, li nav kolanan bisîkletên xwe diajotin.

Selah Îsmaîlê ku li bazara wek morîstanekê bi tevger tiştên malê difroşe dibêje, *«Şer bi kêrî kurdan hat. Em ji rêbaza nehêlana kurdan a Partîya Beasê filitîn û em ê tu caran rewşeka ji wê xirabtir nebînin.»* Ew niha dixwaze vegere «mala xwe», Kerkûkê. Gelek malbatên Çemçemalê ji paytexta petrolê ya bakur, ji Kerkûkê ne û li dema dawîyê bi rêbaza «erebkirinê» ya Partîya Beasê ji cih û warên xwe hatine derxistin . Lê, vê gavê, *«rewş li wir ne ewle ye.»*

Lê li vir, li Çemçemalê, parastin ne pirsgirêka pêşîn e. Ev dever 12 sal in ku di bin destê pêşmerge, mîlîsên Yekîtîya Niştimanîya Kurdistanê (YNK) û Partîya Demokrata Kurdistanê (PDK) de ye û *«û gel jî hevkarîyê bi wan re dike, hema çawa ku tiştekî ecêb rû dide, polîs di cih de rê lê digire.»* Heta 1ê meha sibatê tu tirsa êrişê nebû. Li dema cejnê li Hewlêrê bêtir ji 100 merivan di coteka êrişên xwekuj ên wêranker de hatin kuştin û bêguman wan ew jixwebawerî piçek şikandiye. (1) Lê ew wek êrişên ji derve tên hesibandin û wan her wisa nasnameya taybetî ya herêmî jî xurt kiriye.

Li Silêmanîyeya paytexta herêma jêrkontrola YNKya Celal Talabanî, roxandina Sedam Husênî niştimanperwerîya kurdî vejandîye. Şênîyên vî bajarî bi awayekî xweristî *«xwe ji erebekî Bexdayê bêtir nêzîkî Kurdê Tirkiyeyê an Îranê hest dikin.»* Gelek welatî şik û gumanê ji hevpeymanîya bi salan a Talabanî li gel Civata Bilind a Şoreşa Îslamî li Iraqê (SCIRI) ya Ayetullah Mihemed el-Hekîm dibin. Xalid H. Xerîb, mazûvanê pirtûkxaneya çayxaneya rewşenbîran, dibêje, *«Ereb ji gelên din re, ji bo kêmanîyan û mafên wan, xeternak in. Ew li hember me xwe wek hêzeka dagîrker dibînin. Heke Şî'e jî di hikûmeta nû de gelek xwedî hêz bin, ew jî dê heman tiştî bikin. Bi tenê çareya kurdan ew e ku bibin xwedî dewlet.»*

Li van çend mehên dawîyê, bizaveka ji bo lidarxistina referandûmê dest pê kiriye. Gelek kesan daxwaznameya wê tevgerê mor kiriye, ku doza mafê dîyarkirina dahatîyê (self-determînasyonê) ji bo kurdan dike. Lê rastbînîya siyasî ya rêberên kurd Talabanî û Barzanî piştevanên wan radigire. Riza Ehmed li bazarê şîrînahîyê difroşe û wek werzişkarekî xuya dike, ew dibêje, *«Tu ji welatên cîran nahêlin ku Kurdistana Iraqê bibe dewletekaserbixwe. Em di nav çîyayan de asê mane. Iraqekê hevgirtî û federal dê vê gavê bibe tiştê herî baş.»*

Musil, mezintirîn bajarê bakur ê nêzîkî Sûrîye û Tirkîyeyê, dê nîşan bide ka kurd û ereb dê bikaribin bi hev re Iraqê ji nû ve ava bikin an na. Ji şênîyên wî bajarî % 40 kurd, % 10 turkmen û % 50 jî ereb in. Piranîya efser û rêberên leşkerê berê yê Iraqê ji vir in û reh û rîşeyên rejima berê, hem di warê siyasî, hem jî yê eşîrî de, li vî bajarî di kûr de ne.

Omer Ezo mamosteyê ingilîzî ye, ew endamê YNKyê ye û hêj nû vegerîyaye bajarê xwe ku sala 2000î jê revîbû. Ew dibêje, *«Ereban bi rastî gelek zilim li me kir.»* Li gor wî, wan heta salên 1980yî pişta rejima Sedam Husênî digirt. Bi dû re, şerê li dijî Îranê, şerê Kendavê yê 1991î û tepeserkirina siyasî li hember hemû alîyan her tiştî guhert. Hinek ji wan ên ku di wexta xwe de zulm lê hatibû kirin revîn û wan pena xwe anî Kurdistanê. *«Me alîkarîya mirovahîyê û diravî da wan. Ya ku ihtîmala hevpeymanîyeka di navbera ereb û kurdan de zêde dike, ev yek e.»*

Xeyrî Hesenê 60 salî, rûgulover e, porê wî kêm e û devê wî bêdidan e. Ew serokê partîya qencîyê ye, yek ji partîyên ereban ku li bi yên kurd, tirkmen û asûrîyên mesîhî re, tev li vejîna siyasî ya bajêr dibin. Ew mamosteyê ereb ê sunî, destpêka salên 1950yî di damezirandina Partîya Beas de beşdar bû: *«Me dixwest ji bo xizmeta gelî partîyeka nû ya gelerî bidamezrînin.»* Piştî pêşketina Sedam Husên û eşîreta wî, Hesen xwe gihande partîya Beas a alîgira Sûrîyeyê û sala 1969an kete zindanê. Ew di îşkenceyê de ma bêdidan. Hesen bi bawerî dibêje, *"Hebûna kurdan, cîhêrengîya etnîkî ya li vî welatî, ji yekîtîya Iraqê re ne xeter e. Pirsgirêk, siyaseta Partîya Beas bû, wê zordarî li xelkê dikir.»*

## Li helîkopterên amerîkî xistin

Hesen, Talabanî yekem car sala 1998an li devera Silêmanîyeyê dît, cîhê ku ew ê paşê şeş caran biçûya serêdanê. *«Ez bi peyatî, bi erebeyê û heta li kerî suwar bûm û çûm. Û careke kêm mabû ku ez dê ji alî yekîneyeka leşkerê iraqî ve hatibama kuştin.»* Ew dibêje, *«YNK serxwebûna Kurdistanê naxwaze. Rêberên wê partîyê dibêjin ku ew perçeyekî gelê Iraqê ne.»* Hesen doza Iraqeka hevgirtî dike, ku tu hesaba ferqên di navbera kurd, ereb û tirkmenan de nake, dibêje, *«Iraq ji bo Iraqîyan.»*

Lê hêzên dagîrker ên li deverê –Hêza 101em a veguhestina ji hewayê – ne bi wê dînamîkê re ne. General David H. Petraeus walîtîya wîlayeta Musilê daye Xenîm el-Baso, ku heta sala 1993yan rêberekî Beasê bû (2). Pişkeka giring a birêveberîya berê ya beasî dê li dorên wî li cihê xwe, li ser desthilatê bimîne.

Hêza dagîrker meha tebaxê Musil wek nimûneya birêveberîya amerîkî ya piştî şerî pêşkêş kir. Lê bi dû re, ew nimûne serûbin bû. Berpirsîyarekî parastinê yê YNKyê li dawîya meha çirîya paşîn got, *«Partîya Beas, tesîra wê hê li ser xelkê heye. Hucreyên wê hertim komdibin û êrişên bi bombeyan rêk dixin."* Payîzê gelek rêberên tundrêyan jî dê bihatan ku tora xwe li Musilê zexim û mukim bikin. Wan her du koman ê bi hev re xebat bikira û êrişên ku hema bibêje dê her roj Musilê bihejanda, encama wê xebata wan bûya.

Di destpêka meha çirîya paşîn de, yekem êrişên berxwedanê li dijî helîkopterên amerîkî rê da zêdekirina zora hêza dagîrker ji bo çavtirsandina gerîlayan



Erebekî sunî yê bi navê Arif dibêje, *"Amerîkî bi ser malan de digirin, mehremîyeta me pêpez dikin, pere û zîynetê me didizin. Ev şer ne tiştekî baş bû. Bi tenê qencîya wî ew bû ku Sedam êdî nemaye.»*

Di 1ê meha kanûna paşîn de, General Petraeus ragihand ku ji 12an bêtir rêberên Partîya Beas teslîm bûne. Girtina Sedam Husên a di 13yê kanûna pêşîn de li cihê ku wî li gundê el-Dawûr, nêzîkî Tikrîtê, xwe lê vedişart, qidûmên piştevanên wî şikandin. Serdarê hêza 101em a amerîkî ji bo wan beasîyan got, *«Ew dixwazin di Iraqa nû de beşdar bibin.»* Ji hezaran zêdetir endam û efserên dezgehê agahîyên nepenî yên rejima berê di 26ê kanûna paşîn de li rê û resmên seyr ên ku ji alîyê hêzên amerîkî yên dagîrker ve hatibûn amadekirin beşdar bûn û dest ji endamîya partîya Beas berdan û jê veqetîyan. (3)

Di nav van şertan de, wahabîyên tundrew yên îslamî tesîra xwe li taxên li qeraxa bakurê rûbarê Dîcleyê zêde dikin. Bi rûyê zirav û çavên ku diçirûsin, Mehdî el-Şemarî dibêje ew naxwaze ku şî'e hukmî lê bikin: *«Ev ne edetê min e. Bi tenê erebên sunî dikarin hikmî li welatî bikin: ew bi rêya dînî bi kurdan re girêdayî ne û her wisa ji ber erebbûnê jî bi şî'eyan re girêdayî ne. »*


Muwafaq el-Rube'î, berpirsîyarê berê yê partîya el-De'wa ku demeka dirêj li Londonê penaber bû û niha li Bexdayê endamê Civata Desthilatdar a Berwext e, dibêje, *«Ew propagandaya Sedamî bû. Lê berovajî wê gotinê, bi tenê hevpeymanîya di navbera kurd û şî'eyan de, ku piranîya welatî pêk tînin, dikare yekîtîyê biparêze. Bêyî Iraqeka demokratîk, bihevrejîyan ne mimkin e.»* Çawatîya wê bihevrejîyanê dê hêj were dîyarkirin.

Li Kerkûkê, navenda herêmî ya Partîya Sosyalîst a nasirî ku di vîllayeka sade de ye, bi wêneyekî Cemal Ebdilnasir hatiye xemilandin. Berpirsîyarê partîyê, Seîd Kemal Mihemed ji salên 1960î û pê de li dijî Beasê şer kir û sala 1991î peywendî bi partîyên kurdan re danî. *«Me jî wekî wan kul û kovan kişandin. Kurd perçeyek ji gelê Iraqê ne. Bawerîya me bi azadîya her kesî tê û mafê wan (kurdan) jî heye ku ya ku dixwazin hilbijêrin.»* Lê bi ya wî, di navbera *« miletê Iraqê û miletê ereb»* de tu ferq tuneye. Ew gotin, wek gotina «erebkirinê», bêhna kurdan teng dike!

Lê Kerkûk piştî rizgarbûnê, bi alaya kurdan a kesk-û-sor-û zer a ku roj di nîvekê de ye, hatiye xemilandin. Mihemed Kerîm Resûlê 50 salî yê xwedîyê xwaringehekê dibêje, *«Em ne li dijî ereban in. Em dixwazin bi wan re bijîn. Lê li paşeroja Iraqê, em kurd ê ji federalîzmê kêmtir tiştekî qebûl nekin. Em ê bibin xwedîyên herêma xwe û Kerkûk jî dê bibe paytextê wê.»* Mustefa Fetah Evdirehman, walîyê nû yê Kerkûkê ye. Ew por-qehweyî ye û bi simêl e û li pişt berçavkên xwe yên zêrîn rasterast li nav çavê merivî dinêre. Ew bi xwe jî kurd e. Evdirehman li piranîya dema xwe bi xebata nehêlana pevçûnên etnîk mijûl e. *«Divê ez kurd, ereb, tirkuman, asûrî... nûnerîya hemûyan bikim.»* Ew her wisa weha dibêje : *«Em hêvîdar in a ku Yûgoslavyayê nikarîbû bike em ê karibin li vir bikin: wisa bikin ku gelên cuda bi hev re bijîn.»*

*«Kerkûk, Kerkûk dilê Kurdistanê!»* Bi rêberîya YNK û PDKyê, bi hezaran kurd di 22yê kanûna pêşîn de li nav cade û kolanên Kerkûkê meşîyan. Rojên piştî wê, li kampusa zanîngehê, xwendekarên ereb û tirkmen bi ciwanên kurd re pev çûn ji ber ku kurdan red dikir ku alaya Iraqê bilind bikin. Xwenîşandaneka li dijî wê ya ereb û tirkmenan, di 31ê kanûna paşîn de, li dawîyê, li pêşîya avahîya YNKyê qulipî ser şerî û bi kêmî ve şeş kes tê de hatin kuştin. Xwenîşandaneka ecêb ku hogirên Sedam Husên ên ji gundên «erebkirî» bi wêneyên wî dîktatorî li nav bajêr anîn ba hev li gel nûnerên şîeyê radîkal Ayetullah Motesediq el-Sadr û hêzên Cepheya Tirkmen a Iraqî, rêkxistinek ku li bin rêberîya Enqereyê di nav refên tirkmenan de xebatê dike.

Sekreterê Giştî yê Partîya Gelerî ya Tirkmenên Iraqî û cihgirê walîyê Kerkûkê Irfan Kerkûklî dibêje, *«Tu peywendîya me bi Cepheya Tirkmen re tuneye. Em dizanin ku rewşa malbateka tirkmen a li herêma xweser a kurdan di van deh salan de ji ya malbateka Kerkûka li bin desthilata Sedam çêtir bû.»* Bi gotina wî, «mafê vegerê» yê qurbanîyên rêbaza erebkirinê ya rejimê, kurdan, wek tirkmenan, heye û ew maf nikare jê bê standin. Û erebên ku ji başûr hatibûn û li ser cîh û warê wan û malên wan rûniştibûn, *«ew ê vegerin.»* Paşê, Kerkûk dê dîsa bibe bajarekî bi piranî kurd û tirkmen.



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, mirekeb li ser kaxeza rengîn, 70 x 50 cm

Lê, niqaşa li ser paşeroja Iraqê li Bexdayê tê kirin. Li nav Civata Desthilatdar a Berwext, ku bi piranî ji kurd û şî'eyan pêk tê, sîstema federalî hatiye pejirandin. Lê niqaş li ser du bingehên cuda yên li dijî hev ên federalîyê ye. Yek li ser bingeha dabeşkirina dewleta Iraqê li ser herêmên federalî li gor sînorên cografîk e, sîstemeka wekî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Almanyayê. Ya din, sîstema federalî ya gel û komên nijadî yên cuda ye, bi awayê swîsrî, kanadî û brîtanî. Rêberên kurd bi tenê piştevanîya bijara dawîyê dikin. Kurdistana xweser a li nav Iraqê dê wekî *«Skodlanda li nav Brîtanyaya Mezin be.»* (4) Nebûna hevbîrîyeka li ser vê mijarê dê hestê niştimanperwerîyê yê kurdan xurttir bike. Ehmed Bamernî, ku bi demeka dirêj nûnerê YNKyê yê li Parîsê bû, dibêje, *«Em rûbirûyî imtihana herî zehmet a heta niha ne. Û gelek kêm kes serkeftina me dixwazin.»*

* Rojnamevan

(1) Komeke nêzîkî Ensar el-Îslamê bi berpirsîyarîya her du êrişan jî rabû. Ensar el-Îslam rêxistineke girêdayî el-Qaîdeyê ye û berî şerê 2003yê li dorên Helebceyê, li Kurdistana Iraqê, hatibû danîn.

(2) Sedam Husênî birayê wî û pismamê wî kuştibûn û eşîreta wan bêser hiştibû.

(3) Her yek ji wan bi Xwedê sond xwar ku Iraqê biparêze û ji nû ve ava bike û bi dû re got, «Ez ne bi partîya Beas ve girêdayî me û tu car dê tev lê nebim. Xwedê şahidê min e ku ez niha û pê de serbixwe me.»

(4) Derbarê vê mijarê de li ser malpera PDKyê bêtir bixwîne.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Kilic Tugan

## Di nav zehmetîyên Ajansa Navnetewî ya Enerjîya Atomî de

# Cendirmeyeka hêza nukleer a pir kêm serbixwe

Agnès Sinaï *

Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî ya ku jê nayê çûn û hatina madeyên fîsîl kontrol bike û li Îranê rê li ber meyandin û dewlemendkirina ûranyûmê bigre, du rûyên wê hene: Li alîyekî ew alîgira nukleera sîvîl e, li alîyê din jî cendirmeya nukleera askerî ye. Ew ê timî pesnê feydeyên atomê bide, li Fukuşîmayê jî, jixwe konferansa xwe ya wezîran a di navbera 15 û 17ê kanûna pêşîn de jî li wir li dar dixe.

Ajansa Navteweyî ya Enerjîya Atomî (ANEA) li paytextê Awusturyayê Vîyanayê, li derdoreka bajarê nû yê di navbera Danube (cihê ku rêyên dikevin otoban û jê derdikevin) û metroya li ser erdê de bi cih bûye. Li navenda van avahîyên dêw yên 4500 bûroyan dihewînin û derdora wan bi têlên rêsayî pêçayî ye, avahîya vala ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî piştî felaketa Fukuşîma (Japonya) ku adara 2011an qewimî, dêrîyê xwe li konferansa li ser ewlekarîya nukleer vekir. Hingê wesaîtên dîplomatîk li ber dêrî park kiribûn, komên kesên wezîfedar dikevin hundir û bi nêrdewanên elektrîkî bêdeng dadikevin qata binerdê. Li ser kursîya fermî li pêşîya guhdaran, dîplomatê japonî Amano Yukîya, ku ji 2009an ve rêveberê giştî yê ANEAyê ye, li hemberî girseya nûnerên 153 welatên endam diaxive. Wezîr, nûnerên Ajansên Neteweyî yên Nukleerê, serokên şirketên pîşesazîya atomê û pisporên xweparastina ji radioaktîvîteyê li hêvîya ji nû ve mezinbûna hêza nukleerê bûn, ya ku di salên 2000î de hatibû ragihandin, lê ew niha gumanan dikin ku piştî qezaya li Japonyayê pêk hatî ev pêvajo were sekinandin. Lê dîsa jî Amano xwedî hêvîya destpêkirina "serdemeka nû" ye, serdema xurtkirin û globalkirina pîvanên ewlekarîya santralên nukleer. Jixwe ji hezîrana 2011an ve , Ajansa Navneteweyî daxuyanîyan li ser rewşa her şeş reaktorên santrala Fukuşîmayê belav dike. Agahîyên di van daxuyanîyan de nivîsî ji liserhevkirina agahîyên din pêk tê, yên ji alîyê koma elektronukleer Tokyo Electric Power Company (Tepco) û ji alîyê otorîteya ewlekarîya nukleer a japonî Nuclear and Industrial Safety Agency (NISA)ve hatî ragihandin. Çavdêrîya çalakîyên nukleer û piştgirîya wan kirin: ev e kokteyla nakokane ya ku vê Ajansa ne wekî yên din e, terîf dike.

Xala 2. a destûra ANEAyê behsa armancên ajansê dike: "Ajans hewl dide feydeyên enerjîya atomîk li aştî, tendirustî û pêşketinê li tevahîya cîhanê zêdetir û bi leztir bike. Heta ji destê wê bê ajans hewl dide misoger bike ku alîkarîya ew dide, ya bi daxwaza wê tê dan, ya di bin rêveberîya wê de tê dan, yan jî ya di bin kontrola wê de tê dan, ji bo armancên askerî neyê bikaranîn." Pereyên ji welatan re tên veqetandin li gor giranîya nukleer a welêt û li gor rêzeka bi dorê ya dîplomatîk tên dayîn. Bingeha Ajansê xwe dispêre axaftineka bi navê "ji bo aştîyê Atom", a serokê amerîkî Dwight Eisenhower li peşberîya Civata Giştî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî sala 1953yan kirî: "meriv dikare hêzên talanker ên herî mezin biguherîne û wan veguherîne xêreka ji bo merivatîyê." Fikra "atoma ji bo aştîyê" ku bû slogana ajansê, hewl dide hovîtîya li Hîroşîma û li Nagazakîyê qewimî bide jibîrkirin, û wê fikrê peşnîyaz dike ku bikaranîna askerî û sîvîl a nukleerê tiştên ji hev cuda ne.

Berîya wêrankirina Hîroşîmayê di tebaxa 1945an de, bi tenê profesor Joseph Rotblat xwe ji projeya Manhattanê (navê kod ê bernameya bombeya atomîk bû) vekişandibû, wî li ser vê mijarê em hîşyar dikirin: "Alîyê aştîperest û yê eskerî yên enerjîya nukleer bi awayekî xwezayî girêdayî hev in û ne mimkin e meriv li reaktorên bi ûranyûmê dixebitin elektrîkê çêbike, bêyî ku di heman demê de plûtonyûmê hilberîne, ev made jî ji bo çekên nukleer tê bikaranîn. Ev tê maneya ku di encamê de yan şaristanî wê bê tunekirin yan jî divê meriv dev ji enerjîya nukleer a xwe dispêre perçebûna atomê berde. (1)

ANEA di 1957an de hat sazkirin. Mihendisên wê demê xeyala bereketeka ewqasî zêde ya elektrîkê dikirin ku "ji ber erzanbûna wê êdî wê ne hêja be meriv wê bipîve." ("too cheap to meter"). Utopyaya serdema atomî berpirsîyarîya misogerkirina belavkirineka adil a feydeyên enerjîya atomî di navbera tevahîya neteweyan de xist ser milê ANEAyê. Ev enerjî wekî enerjîyeka baş dihat nirxandin. Di heman demê de divîyabû Ajans çavdêrîya bêçekkirina cîhanê jî bike. Di sala 2012an de Ajans ji bo şuxilandina tevahîya beşên xwe xwedî 333 mîlyon ewroyan bû, ew xwedî budceyeka biqasî ya polêsa şaredarîya paytextê Awûsturyayê ye da ku neguherbarîya rêyên madeyên fîsîl di wan re diçin misoger bike. 2200 karkerên wê hene, nêzîkî 250 ji wan mufetîş in, tevî ku kontrolkirin bi tenê beşek ji çalakîyên Ajansê pêk tînin. Ev yek kêmbûna derfetên wê li hemberî giranîya erk û mîsyonên wê radixe ber çavan: komkirina agahîyan li ser rewşa 429 reaktorên nukleer ên li 31 welatan çalak in û li ser rewşa 145 reaktorên hatin sekinandin (2) û çavdêrîya 42.2 mîlyon metrekub çopên radyoaktîf ku 388 000 metrekub ji wan çopên bi tesîrên gelekî aktîf in (3). Ev çop li nêzîkî santralan û li navendên paqîjkirina çopê yên welatê xwedî hêza nukleer tên komkirin. (4)

Di teorîyê de, Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî qanûnên navneteweyî yên ewlekarîya nukleer amade dike: parastina merivan ji tehlûkeyên radyolojîk, pêşdîtina qezayan, pêşdîtina mudaxaleyên lezgîn. Lê ji ber ku di destûra xwe de girêdayî dewletên endam e, pirî caran divê kiryarên xwe heta mimkin e di çarçoveya herî teng a karên hevpar de bike. Gelo yên pesnê atomê didin, pêwîstîya zelalbûnê dubarê dikin, û behsa pêwîstîya misogerkirina agahdarkirina gel dikin? Lê belê ji rojnamevanan tê xwestin ku ji salonên nîqaş li ser mijarê hene, derkevin.

### Wezîfedarkirina pîromanan ji bo parastina ji şewatê

Li alîyekî timî tê binxêzkirin ku divê kesên ewlekarîya santralan kontrol dikin serbixwe bin, lê li alîyê din jî wisa xuya ye normal e têkilîya di navbera yê kontrol dike û yê kontrol dibe de bi tenê wekî tiştekî hundir be ku di avahîya ewlekarîyê de dimîne: Li gor Daniel Poneman, alîkarê wezîrê enerjîyê yê amerîkî "şirketên enerjîya nukleer û pîşesazîya nukleer ya navneteweyî wê dewam bikin û wê di pêşdîtin û çareserkirina qezayan de bi roleka dîyarker rabin (5)". Lewra di nav rêxistinên girêdayî Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de, Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî îstîsnayek e. Ji xeynî wê tu rêxistin ewqasî piştgirîya pîşesazîyeka ku ewqasî girêdayî wê ye, nake. Û pir caran, gumanên girêdayî aborîya nukleer ji amadekirina pîvanên ku divê çarçoveya wê sînordar bikin, li pêştir in. Ev pîvan li gor perspektîvên siberojê tên guhertin. Jixwe bi tenê dewletên "herî bipêşketî di teknolojîya atomî de" xwedî mafê endambûna buroya birêvebirên Ajansê ne. Di nav wan de Fransa xwedî gelek şirketên ku Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî temsîl dikin e, Buroya Ewlekarîya Nukleer (BEN) ku di destê Denis Flory de ye. Ew xelîfê Philippe Jamet e ku niha bû komîserê Birêveberîya Ewlekarîya Nukleer (BEN) ya neteweyî; Rêxistina Cîhanî ya Şirketên Nukleer (World Association of Nuclear Operators, WANO) ku Laurent Stricker wê bi rê ve dibe, wî beşeka mezin a karîyerê xwe di firmaya Electricité de France de domand; André-Claude Lacoste Rêxistina Mufetîşên Nukleer ên Ewropaya Rojava (Western European Nuclear Regulators'Association, WENRA) bi rê ve dibir û di heman demê de li Parîsê wezîfeya xwe ya serokatîya Ajansa Ewlekarîya Neteweyî heta 12ê çirîya paşîna bihurî didomand.

Li gor kevne-walîyê herêma Fukuşîmayê, Sato Eisaku, rêxîstineka bi vî rengî tê maneya wezîfedarkirina pîromanan [kesên şewatan didin destpêkirin, nota wergêr] ji bo parastina ji şewatê: ew destnîşan dike ku "yên ku pesnê nukleerê didin û yên ku divê çavdêrîya wê bikin, endamên heman wezaretê ne. Ez ji vê rexistinê re dibêjim, rêxistina ku tê de diz û polês bi hev re dixebitin."

Gelo ev e sedema danezana Gregory Jaczko? Belê di hezîrana 2011an de, Gregory Jaczko, birêveberê Nuclear Regulatory Commission (NRC), Birêveberîya Ewlekarîya Nukleer a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di konferansa wezîran ya Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî de dida zanîn ku şêwirmendên 104 reaktorên nukleer yên amerîkî sekinandina yek ji reaktoran jî pêwîst nedîtin – gelo ev jî sedema standina nota herî baş a santrala kalîfornîyayî ya bi navê Diablo Canyon e ku li ser derzeka mezin a erdhejê ye?

Yan jî gelo ev e sedema wezîfedarkirina birêveberîyên neteweyî bi kontrolên saxlembûna santralan (stress tests)? Western European Nuclear Regulators'Association ku bi fikir nêzî pîşesazîya nukleer e, vê birêveberîyê temsîl dike. Li şûna ku vê wezîfeyê bidin komeka pisporên ewropî yên serbixwe dan wê. Di pratîkê de, bi saya tevneka xwe-erêkirinê ya ku Ajansa Navneteweyî ya Ewlekarîya Nukleer destûra wê dide, pîvanên ewlekarîyê li gor daxwazê tên eyarkirin. Ji Çernobîlê heta bi Fukuşîmayê, heman fikra sabît heye: wisa dan bawerkirin ku sedema felaketan rewşeka taybet a welatê lê pêk tên e, û dan jibîrkirin ku sedemên girêdayî kêmasîyên binesazîyê hene. Bi gotineka din: Çernobîl bi tenê dikarîbû li Bloka Sovyetî pêk were û Fukuşîma bextreş bû lewra ew li ser rêya tsunamîyekê bû.

Li alîyekî din jî, Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî girêdayî Koma Dabînerên Nukleerê ye, ku wekî klubeka hevalbendên atomê ye ku 46 welatên madeyên fîsîl hildeberînin dicivîne. Ev rêxistina ne fermî ku sala 1974an hat damezirandin, bi armanca kêmkirina belavbûna nukleerê, bi xwe biryara şert û mercên li ser wan welatan ferz in, dîyar dike ji bo îtxalkirina made û ekîpmanên nukleer. Sala 2008an, rêxistinê destûra îstîsnayekê da: bi saya lihevkirineka di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Delhîya Nû de mohr kirî, wê destûra îtxalkirina teknolojîya nukleer da Hîndistanê. Lê belê Hîndistanê hê jî Peymana Belavnekirina Nukleerê (PBN) mohr nekiriye, lewra ew red dike serî bi temamî li hember sîstema misogerkirina Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî bitewîne. Mohamed El-Baradei, serokê giştî yê rêxistinê (ANEAyê) û xwedîyê xelata Nobelê, vê înîsîyatîva di navbera Hîndistan û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de erê dike: "Li gor min ev lihevkirin ji her du alîyan re bi feyde ye: ji pêşketinê re jî baş e, ji kontrolkirina çekdarbûnê re jî baş e. Ew ê bike ku Hindistan bibe xwedî teknolojîya nukleer a rojavayî bi avantajên wê di warê ewlekarîyê de – ev mijareka girîng e, lewra Hindistanê dixwest bibe xwedîya bernameyeka ku armanca wê pir bilind e. Tevî ku di encama vê lihevkirinê de Hindistan nabe endama PNByê jî, ew ê bike ku welat nêzîktirî konsepta Belavnekirina Nukleerê bibe, bi saya qebûlkirina garantîyên ferz yên ANEAyê ji bo avahîyên sîvîl dîyar kirin û bi xêra qebûlkirina endamtîya Koma Hilberînerên Nukleerê ya Hîndistanê (6)." Berî her tiştî ev lihevkirin ji pîşesazîyê re gelekî bi feyde ye: mesela ji şirketa Arevayê re ya ku xwedî reaktoreka ewropî ya bi zextê dixebite (REZ) ye, Toshiba û General Electric jî ketine dorê da ku sûdê ji vê rewşê werbigrin.

Xala çarem ya PBNyê mafê tevahîya gelan ê bipêşxistina enerjîya nukleer a sîvîl wekî "mafê nabe ji wan bê stendin" da zanîn: "Tu beşa vê peymanê wê wekî binpêkirina mafê nabe ji wan bê stendin yê tevahîya endaman ji bo pêşxistina lêkolîn, hilberîn û bikaranîna enerjîya nukleer ji bo armancên aştîxwaz, neyê şirovekirin." ANEAyê ku bi çapkirina danezanên fermî yê li ser Enerjîya Nukleer ya sîvîl wezîfedar e, di nav dudilîyê de maye, ew li cîhanê him cendirmeya him jî şîrîkê nebiqest ya belavkirina çekê nukleer e. Di encama hewldana ji nû ve çêkirina yekîneyên dewlemendkirina [ya ûranyûmê] li laboratuwara neteweyî ya Oak Ridge ya Wezareta Enerjîyê ya amerîkî, mimkin e her welatê xwedî reaktorên nukleer ên sîvîl, bi qaçaxî mîqdarek plutonyûmê bi kar bîne ji bo çekekî nukleer çêke – vê jî li derveyî çavdêrîya Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî bike.

### Rêveberekî zêdetir nêzîkî Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê

Di 18ê çirîya pêşîna 2011an de, Îranê yekem avahîya xwe ya nukleer ya sîvîl da nasîn, ya di 1975an li bajarê Buşehr avakirî. Şerê di navbera wê û Iraqê de (1980-1988) xebatên avakirina wê dabûn sekinandin. Ajansa Atomê ya Federal ya Rusî Rosatom karê nîvmayî qedand û lihevkirineka dualî di navbera herdu welatan de di bin rêveberîya ANEAyê de hat mohrkirin. Li gor telegrafekê di 9ê hezîrana 2009an de ji Sefareta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Vîyanayê şandî, serokê wezîfedar ê Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî Amano Yukîya dîyar dike ku ew ji serokê berîya dewra wî wezîfedar bû zêdetir nêzîkî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê ye. Ew serokê berê wekî "navcîyekî" di navbera Îran û ANEAyê de dinirxîne û xwe wekî "bêalî" dibîne. Telegrafa ku WikiLeaksê weşand ji alîyê Geoffrey Pyatt -hingê nunerê amerîkî li ANEAyê bû - ve mohrkirî ye. Di berdêla vê de jî Amano hêvî dike ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê alîkarîyeka fînansî ya zêdetir bidin Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî. Van mehên dawîyê, ANEAyê ragihandinên li ser operasyonên ku guman dike Îran dimeşîne, zêde kirin. 22yê sibata 2012an, Amano di daxuyanîyekê de "xemgînîya xwe" li hember destûrnedana Îranê ji bo ketina pisporên Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî nav sîta nukleer a Parçînê îfade dike. Ev helwêsta nû ya Îranê rê li ber zêdekirina propagandaya çapemenîyê ya amerîkî û îsraîlî li dijî rejîma Îranê vedike.

Di bin çavdêrîya rêvebera servîsa çapemenîyê de, ya ku axaftina me gotin bi gotin tomar dike, em hevdîtinekê bi pisporekî ku nexwest navê wî were eşkerekirin yê di Beşa Garantîyê ya Ajansê de dixebite, pêk tînin. Pispor ji me re rave dike ku Ajans xwe bi pêş dixe "di cîhana grî de ku tê de bidestxistina agahîya rast zehmet e, li hemberî zêdebûna hejmara agahîyên divê werin analîz kirin". Tenê sala 2010ê, Beşa Garantîyê ya Ajansê 17 000 rapor û daxuyanî kom kirin, qederê 44 000 agahîyên kirînûfirotinê û kirîna materielên nukleer qeyd kirin, bi sedan nimûne analîz kirin, 377 wêneyên satelîtê analîz kirin û 3000 nivîsên herkes dikarin bigihin wan weşandin. (7)

Dizîya teknolojîya santrîfûgasyonê ji bo dewlemendkirina ûranyûmê ji alîyê fîzîsyenê pakistanî Abdul Qadeer Xan di 1974an de -ev bûyer sala 2004an hat eşkerekirin- hebûna tevneka cîhanî ya şîrîkatîyan ku destûrê dide welatên wekî Lîbya, Îran û Koreya Bakur bi qaçaxî bibin xwedî mekîneyên santrîfûjê, nîşan dide. Di arşîvên wê yên li ser madeyên qaçax de, Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî ji 650 bûyeran zêdetir ên girêdayî qaçaxçîtîya madeyên nukleer ên di navbera 1993 û 2004ê de pêk hatî, qeyd kirine. Mezinbûna tehlûkeya girêdayî globalbûna madeyên fîsîl nebû sedema zêdekirina erkên ANEAyê, tevî ku wê kapasîte û navgînên xwe nû û zêde kirin yên wekî şuxilandina kesên gumrikan kontrol dikin. Ew doza avakirina xeteka aborî dike ya ku destûrê dide bidestxistina agahîyên li ser çûnûhatina madeyên fîsîl di bazirganîya navneteweyî de. Lê prensîpa desthilatdarîya dewletan rê li ber lêkolînên pispor digire ku bikevin nav sîtên nukleer. Bi tenê Konseya Ewlekarîyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dikare erkên Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî firehtir bike –Ew carinan vê yekê dike ji bo pêkanîna lêkolînên xwe li Îranê.

Di qatên jorîn yên avahîyên RNY yên li Vîyanayê ku dişibin firfirokekê, buroya Komîteya Zanistî ya Rêxisitna Neteweyên Yekbûyî li ser Têsîrên Radyasyonên Atomî (United Nations Scientific Committee on the Effects of Atomic Radiation, UNSCEAR) ya ku sala 1955an hat damezrandin heye. Serokê wê Wolfang Weiss rêbaza nirxandina têsîrên radyasyonê li ser tendirustîyê rave dike. Makîneya sievert (Sv), ku navê fîzîsyenê swêdî Rolf Sievert lê ye, li ber tîrêjên îyonîzeker mayînê dipîve. Li gor qanûnê li ber tîrêjên îyonîzeker mana karkerên (pîşesazîya nukleer û beşa radyolojîyê ji bo tendirustîyê) li Fransayê, sînor salê 20 milîsievert e (mSv/salê) û di demên lezgîn de ev mîqdar dikare heta 100 mSv/salê were zêdekirin.

Ji bo gel, ev sînor 1 mSv/salê ye. Lê li gor Weiss, eger mîqdar di bin 200 mSv/salê de be, tehlûkeyeka mezin tuneye: "em bawer dikin ku têkilîyeka bê sînor ku dişibe xeteka di navbera tehlûke û mîqdara tîrêjan [yên îyonîzeker] de heye". 1.000 mSv/salê tên maneya % 10 îhtîmala bi kanserê ketinê heye. Bi 100 mSv/salê ev îhtîmal bi tenê % 1 e. Yanî ji 100 karkerên li santrala Fukushîmayê dişuxilin û 100 mSv/salê li ber tîrêjên îyonîzeker dimînin, yek bi tenê wê bi nexweşîya kanserê bikeve." Ev hejimartineka ewqasî hêsan e ku meriv matmayî dihêle.

Komîteya Zanistî ya Rêxisitna Neteweyên Yekbûyî li ser Têsîrên Radyasyonên Atomî (UNSCEAR) hewl dide tehlûkeya demdirêj a van mîqdarên "kêm" piçûk bike. Di rapora xwe ya 2008an de li ser encamên felaketa Çernobîlê, li gor jimartinên komîteyê felaket bûbû sedema 6000 kanserên gûatirê ku 15 ji wan bûn sedema mirinê. Li gor Weiss, mirina bi kanserê re li herêmên nêzîkî cîhê felaketên nukleerê zêdetir nîne ji hejmara mirinên ji kansera gûatirê li herêmên dûrî felaketên nukleer. Herçî kesên di çopên Çernobîlê de dişuxilîn (8) UNSCEAR îdia dike ku ji 530 000 kesan bi tenê 28 kes ji ber zêde mayîna li ber tîrêjên radîyoaktîf mirine.

## Quretî di analîzkirina felaketan de

Da ku di dema dirêj de têsîrên radyasyonê analîz bike û lêkolînên epîdemîyolojîk [analîza faktorên bandorê li tendirustîyê dikin, nota wergêr] pêk bîne, Komîteya Zanistî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya li ser Têsîrên Radyasyonên Atomî (UNSCEAR) bi tenê çar kesan dixebitîne, û alîkarîya pisporên derve dixwaze. Ev komîteya veşartî di destpêkê de ji bo çavdêrîya tendirustîya girseya mexdûrên Hîroşîma û Nagazakî hat damezrandin. Yves Marignac, rêveberê WISE- Parîs weha dipeyive "Ji vê rewşa giran a mayîna pir zêde li ber tîrêjên radyasyonê, me tê derxist ku mîlîsievert tiştekî xirabker e, ku em di rewşên mayînên dewamî li ber tava tîrêjên radyasyonê, bi kar tînin. Kategorîyên di warê xweparastina ji radyasyonê yê heyî de ne li gor şert û mercên qezayên di santraleka nukleer de diqewimin hatin amadekirin, lewra têsîra van qezeyan dewam dike".

Li gor vî pisporê serbixwe, zanistên xwe parastina ji radyasyonê ji pencî salan û vir ve encamên mayîna dewamî li ber tava tîrêjên radyasyonê kêm dikin, divîya bû civaka navneteweyî vê pirsgirêkê derbixe pêş, lê nexwest vê yekê bike, ji ber ku meylên wê ji mêj ve dîyarkirî ne. Ew zorê dide xwe da ku paradîgma xwe li ser tehlûkeya mayîna dewamî li ber tava Radyasyonê neguhere. Lê belê rewşa tendirustîyê li tevahîya cîhên bi radyasyonê qirêjbûyî her diçe xirabtir dibe. Para radyasyonê çi ye di vê xirabûna tendirustîyê de? Gunehê civaka zanistî hewlnedana wê ya bersivdana vê pirsê ye." UNSCEAR e ya ku divê lêkolîneke bimeşîne li ser bilançoya radyoaktîvîte û bandorên radyasyonê li herêma Fukuşîmayê. Lê divê şênîyên vî bajarî li hêvîya rapora wê bimînin, ya ku wê di gulana 2013yan de eşkere bibe, da ku bizanibin dikarin çiqasî li ber tava radyasyonê bimînin û da ku xwedî fikreka giştî bin li ser hebûna radyasyonê di nav berhemên xwarinê de.

Xweparastina ji radyasyonê ku tiştekî pir girîng e ji bo mexdûrên qezayên nukleer, zanisteka xemilandî ye ji alîyê komîsyonên ku endamên wan nêzîkbûna xwe bi cîhana pîşesazîyê û bi ajansên pisporîyê yên fermî re nîşan didin. Komîsyona Navnete-weyî ya Xweparastina Radyolojîk (KNXPR), ya sala 1928an ji bo dîyarkirina pîvanan hatî sazkirin, îro bûye otorîteyeka ku sînorên mîqdara tava tîrêjên radyoaktîf dîyar dike yên gel û karkerên nukleer dikarin qebûl bikin. Sazîyên zanistî hene, belê endamên pîşesazîyê yên wekî Natalia Shandala, wezîfedara têkilîyên gelemperî ya Rosatomê (şirketa elektronukleerê ya rusî), Komîserîya Enerjîya Atomî û ya Enerjîyên Alternatîf (KEA), şirketa fransî EDFyê jî hene. Pîvanên parastina ji radyasyonê yên desthilatdarîya Japonî dîyar kirin û îlhama xwe ji Komîteya Navneteweyî ji bo Parastina ji Radyasyonê digire, sisttir in ji yên di bihara 1986an de li Rûsyayê hatî dîyarkirin.

Enstîtuya Belrad, ya li Mînskê (Belarûsya), dîyar dike ku nexweşîyên dil bi zarokên belarûsî re heye ji ber ku berhemên bi qasî 20 bekerel serê kîlogramekê (Bq/kg) qirêjbûyî xwarin. Navê fîzîsyenê fransî li vê yekane ye, ew hejmara guhertinên di cih de yan jî pûçbûnên di madeyeka radîyoaktîf de serê sanîyeyekê pêk tên dîyar dike. Di encama wan de radyasyon belav dibe. Berîya felaketê, sînorê mîqdara radyasyonê dihat qebûlkirin li Japonyayê serê kîloyek berhemên xwarinê 1 Bq bû. Lê piştî felaketê ev mîqdar 500 caran bilind bû, û 1ê nîsana 2012an daket 100 Bq'yî serê kîloyekê. Bi vî rengî, di destpêkê de birinc û şînayî, yanî piranîya wan, wekî ne qirêjbûyî hatin îlankirin: bi xêra vî sînorê bilind ew hê jî li bazaran tên firotin. Ev yek jî bi erêkirina sazîyên navneteweyî pêk tê, wekî Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî û Rêxistina Cîhanî ya Tendirustîyê (RCT). Jixwe RCT û ANEA ji sala 1959an ve bi xêra peymaneka taybet girêdayî hev in. Li gor kolektîfa serbixwe ya bi navê WHO (doza "serxwebûnê RCTyê" dike ), ev peyman dide fêmkirin ka çima RCTyê encamên Çernobîlê ji ya rastî kêmtir nîşan dan û piştre heman tişt bi encamên felaketa li Fukuşîmayê jî kir. Ew niha li hemberî vê pirsgirêka tendirustîya gelemperîyê pir belangaz e. Di nav bîstûpênc salan de "tu bernameya civakî û ji bo tendirustîyê li herêmên qirêjbûyî û jehrî yên Çernobîlê nehat amadekirin ", û "li welatê xwedî çekên nukleer, lêkolînên epîdemîyolojîk bi qasî ku tunebin, kêm in." (9)

Agahîyên li ser tehlûkeyên girêdayî nukleerê yên ji alîyê îdeolojîya fermî ve asêkirî, bi awayekî sîstematîk tê tevlîhevkirin. Û berpirsîyarên felaketên atomî nayên cezakirin.

* Rojnamevan, hev-afirînera Enstîtuya Momentuma li ser Antroposenê

(1) Joseph Rotblat, "Nuclear proliferation :Arrangements for international Control / Belavnekirina Nukleerê: Lihevkirinên ji bo Kontrola Navneteweyî", di *Nuclear Energy and NuclearWeapon Proliferation / Enerjîya Nukleer û Belavnekirina Çekên Nukleer,* Stockholm International Peace Research Institute, 1979.

(2) Mycle Schneider û Antony Froggatt (bi hevkarîya Julie Hazemann), "World nuclear industry status report 2012/ Rapora Rewşa Pîşesazîya Nukleer a Cîhanê 2012", Parîs-London, tîrmeh 2012, www.enerwebwatch.eu

(3) Li vir ya behsa wê tê kirin xwelîya ûranyûma 233 û 235an û telpika plutonyûmê ye, pir zêde radyoaktîf e û dema radyoaktîfbûna wê jî pir dirêj e.

(4) "Rapport d'ensemble sur la technologie nucléaire 2011 / Rapora Giştî li ser Teknolojîya Nukleer", AIEA, Vîyana, 29ê tîrmeha 2011an.

(5) Axaftina li civîna wezîran a ANEA, 20ê hezîrana 2011an.

(6) Mohamed El-Baradei, *The Age of Deception: Nuclear Diplomacy in Treacherous Times / Serdema bêhêvîmanê: Dîplomasîya Nukleer di Demên bi Tehlûke de,* Metropolitan Books, NewYork, 2011.

(7) "Annual report/Rapora Salane", ANEA, Vîyana, 2010.

(8). Navê ku li esker, agirkuj û teknîsyenan tê kirin ku wezîfeya wan vemirandina şewata li santralan û ewlekarîya deverê ye.

(9) http://independentwho.org/fr

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Peymana belavnekirina nukleerê

Peymana Belavnekirina Nukleerê (TNP) 1ê tîrmeha 1968an di çarçoveya şerê sar de hat mohrkirin û armanca wê pêşîlêgirtina belavbûna çek û teknolojîyên nukleer û teşwîqkirina bêçekbûnê bû, di heman demê de ji bo armancê pasîfîk mafê bikaranîna van teknolojîyan heta bi dawîyê dide tevahîya dewletên peyman mohrkirî.

Xala sêyem a TNPyê şert datîne pêşîya dewletên ne xwedî çekên nukleer ku ew e materîyal û teknolojîya nukleer bide wan bi tenê heke destûrê bidin ANEAyê ku kontrol bike ku bernameyên wan ên nukleer bi tenê ji bo armancên pasîfîk in. TNP have ("yên xemê nexwin") û have not ("yên bêzar") ji hev cihê dike: dewletên xwedî çekên nukleer (DXÇN) û hê jî mafê wan hene xwedîyên van çekan bin (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Rûsya, Meliktîya Yekbûyî, Fransa û Çîn) û Dewletên nexwedî çekên nukleer (DNÇN) in. Ev cihêkirin di nav hiqûqa navneteweyî de yekane ye, lewra di prensîpê de ev hiqûq tevahîya dewletan wekhev hikimran qebûl dike.

TNP pêş dibîne ku ew ne mitleq e. Qaîdeyên hişk ên belavnekirinê ji bo gelek dewletên xwedî bernameyeka nukleer a sîvîl bi tenê bi şertê ku DXÇN ji wan re bibin mînakên baş û angajmana xwe ya ji bo bêçekbûnê pêk bînin, dikarin werin qebûlkirin. Dîsa jî ev angajman pêk nehatin. Birêveberê Giştî yê ANEAyê di navbera 1981 û 1997an de Hans Blix banga peymaneka nû ji bo qedexekirina hilberandina materyalên fîsîl kir ên ku ji bo çekdarîbûnê û ji bo bicihanîneka gerdûnî ya TNPyê bi şertê ku DXÇN bibe mînak (1). Îsraîl, Hindistan û Pakistanê TNP qet mohr nekirin. Wan çekên nukleer çêkirin û wekî hevkarên bazirganîyê bi bîhnferehî tên qebûlkirin dema ku mijar bazara li ser bernameyên nukleer ên sîvîl e.

A. S.

(1) Hans Blix, *Why Nuclear Disarmament Matters / Ji bo çi Bêçekbûna Nukleer girîng e,* Massachusetts Institute of Technology Press, Cambridge, 2008.

## Çopên qazancbexş

Pirsên nikarin werin çareserkirin li pêşîya Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî (ANEA) hene. Meriv çi ji birêveberîya navbêynkar a çopên pir zêde radyoaktîf bike heta ku meriv wan bi awayekî jeolojîk mayînde muhafeze bike? Dema ku tu santralên nû neyên avakirin, 429 reaktorên heyî yên dixebitin wê salane lodên xwe yên çopên sotemenîyan hê jî hilberînin, ku ajans bi kelecanekê texmîn dike ku "mîqdara wan têra xwe neguherbar e" (1) Li hawuzên cemidandinê depokirî, di nav vê çopê de plûtonyûm heye ku li gor texmînan mîqdara wê li dinyayê qederê 250 tonan e, ango bi qasî tevahîya stokên plûtonyûma eskerî li cîhanê ku têra çêkirina 50000 serikên nukleer dike. (2)

Reaktoreka nukleer a 1000 megawattî dema bixebite salê 230-260 kîlogram plûtonyûmê hildiberîne û ji bo hilberandina çekekî nukleerî bi tenê 5 kîlogram bes in. Beşek ji vê plûtonyûmê ya ku jê re plûtonyûma 239an tê gotin ku nivê temenê radyoaktîvîteya wê bîst û çar hezar sal in (ango piştî vê demê radyoaktîvîteya wê nîvî bi nivî kêm dibe) û di nav sotemenîyên tevlîhev ên ji ûranyûma lawazkirî a oksîd û plûtonyûmê (MOX) de tê bikaranîn, ji bo hin reaktorên bi ava sivik yên wekî yekîneya sêyem a santrala Fukuşîmayê yan jî Reaktora bi Zextê ya Ewropî (EPR) ya siberojê li Flamanvilleyê. Ev sotemenî madeyeka gelekî bi jehr e ku Electricité de France (EDF) û COGEMAyê (3) salên 1980yî kirin malekî bazirganîyê û îro jî holdînga fransî Areva vî karî dike. Kişandina hewayê wê ya mîqdareka ji deh milîgramekî dibe sedema mirinê. (4)

Bi awayê fermî MOX bi kêrî ji nû ve bikaranîna stokên plûtonyûmê tê da ku kombûna wan hêdî bike û pîşesazîya ji nû ve bikaranînê rewa bike. Ew berîya her tiştî çalakîyeka qazancbexş e ji bo pîşesazîya nukleer, tevî rîska ku karkerên wê bikevin ber tesîra van madeyan, ev madde ji seranserê Ewropayê bi trênê û bi konteyneran di kêştîyan de jî dibin Japonyayê.

Stratejîya îxrackirina MOXê a Arevayê rîska neketina ber kontrolê jî zêde dike. Sala 1994an 70 kîlogram plûtonyûm ji ber kontrolê xilas bû, ya ku li înstalasyonên telemanîpulasyonê yên fabrîkeya hilberandina sotemenîyên MOXê ya Tokaiyê li Japonyayê hatî civandin. Bûyerên bi heman rengî sala 2009an li Cadaracheyê (herêma Bouches-du-Rhôneê) jî hatin tesbîtkirin, li wir bi dehan kîlogram di nav şûşeyên telemanîpulasyonê de man bêyî ku bikevin ber jimar û berpirsîyarîyê.

A.S.

(1) "Annual report / Rapora Salane", ANEA, Vîyana, 2010.

(2) Frank Barnaby û Shaun Burnie, "Planning proliferation: The global expansion of nuclear power and multinational approaches /Plankirina belavnekirinê: belavbûna global a hêza nukleer û nêzîkatîyên pirneteweyî", rapora ji bo Greenpeaceê, Amsterdam, gulana 2010an.

(3) Compagnie générale des matières nucléaires/Şirketa Giştî ya Maddeyên Nukleer, îro Areva NC (ji bo Nuclear Cycle/Dewra Nukleer), ye ku bi xwe baskekî Arevayê ye.

(4) Înstîtûta Parastina ji Radyoaktîvîteyê û Ewlekarîya Nukleer (ÎPREN), fîşa radyonukleîd ya plûtonyûmê, 2007.

Qada elektro-nukleerê hêvîyek îfade dikir : hêvîya kedîkirina agirê atomî. Li hemberî têrnebûna ji enerjîyê ya dinyaya pîşesazbûyî, ew pêşnîyaza çareserkirineka bi tesîr a girêdayî pêşketina teknolojîk bû. Dîsa jî ji xelk û şênîyên dinyayê re pirsgirêkeka ewlekarîyê ye û li welatên rojava jî pirsgirêka wê ya karanînê heye. Gelo welatê vê pîşesazîya stratejîk ber bi rojhilat ve dişemite?

### LI ROJAVA PAŞVEÇÛN, LI WELATÊN BIPÊŞDIKEVIN ÊN ASYAYÊ JI NÛVE BIRÊXISTINKIRIN

# Fukuşîmayê çawa kartên lîstika nukleerê yên cîhanê ji nû ve li nav hev xistin?

DENIS DELBECQ *

Piştî dehsaleka depresyonê, kanûna 2009ê, endustrîya nukleer ji *Konferansa Kopenhagê* ya li ser avhewayê, xurtbûyî derketibû. Hevalbendên endustrîya nukleer behsa vejîneka bi rastî dikirin. Lê belê qezaya li ***Fukuşîmayê*** encam serûbinî hev kir. Gelek welatan da zanîn ku ew projeyên xwe paş ve dixin. *Almanya* û *Swîsreya* ku hê doh jidil û can enerjîya atomê diparastin, biryar dan ku jêgerana wê bileztir bikin. Û *Îtalyayê* heta *demeka nedîyar* avakirina reaktora xwe ya yekem paş ve xist. Di encamê de fikra dinyayeka nukleer a li du beşan parkirî xurt dibe: Li alîyekî welatên pêşketî yên ku atom li wan bêqîmet dibe; li alîyê din welatên bi pêş dikevin yên ku –herweha– berê xwe didin nukleerê, û bi vê jî bazaran ji bo pîşesazên rojavayî vedikin.

Sala 1977an *Fransayê* bernameyeka bi heyecan a nukleer dayî destpêkirin, santrala xwe ya pêşî ya nifşê nû xebitand: Du reaktorên li ***Fessenheimê*** (Jora Reynê). Dem dema nîqaşên li ser serxwebûna di warê enerjîyê de bû –şoka pêşî ya petrolê li devê dêrî bû– û bang li zanîna pîşesazîyeka şeşkenarî dihat kirin ku li ser dinyayê hukim bike. Heman salê di Konferansa ji bo Paşerojeyeka Ne-Nukleer de ya li ***Salzbûrgê*** (Awûstûryayê) hatî organîze kirin, ekolojîstê amerîkî **Amory Lovins** wisa hişk diaxivî: "*Enerjîya nukleer enerjîyeka paşerojê ye ku aîdî rabihurîyê ye.*" Piştî felaketa japonî ku ji dema qezaya herî cidî a nukleer ango teqîna reaktoreka li ***Çernobîlê*** ya sala 1986an ve, qezaya herî mezin a nukleer e, ev slogan dikare dîsa bibe xwedîya tevahîya hêza xwe. Êdî mewzûbehs nîne ku mirov xwe li pişt argûmana pîrbûna pîşesazîya împaratorîyeka sovyetan a pûç dibe, veşêre. Japonya di warê teknolojîyê de yek ji welatên herî pêşketî ye, û bersivên siyasî yên erdheja 11ê adarê, bi awayekî cidî avahîyên pîşesazîya nukleer hejandin.

Serê pêşî ji ber ku navenda giranîya enerjîya nukleer a cografî cihê xwe diguhere. Li gor raporeka nû ya *Enstîtûta Worldwatchê* ya li ser rewşa pîşesazîya nukleer, yekê nîsana bihurî li dinyayê çarsed û sîhûheft reaktor hene. (1) Ev reaktor li sîh welatan in –li gor salên derbasbûyî welatek kêm bûye, lewra *Yekîtîya Ewropayê* li ser *Lîtwanyayê* sala 2010an ferz kir ku reaktora xwe ya dawî bigire, ku ji nifşê reaktora *Çernobîlê* bû. Sala 2009an sê salan li ser hev hilberîna elektrîka nukleer li dinyayê kêm bû (2), û para wê ya di elektrîka cîhanê de ji sala 2000î ve kêm dibe; sala 2009an bi tenê %13.8 bû, li hemberî vê rêjeyê di dehsala 1990î de ku çaxê zêrîn ê atomê bû, bi awayekî navincî ev rêje %17 bû. (3)

Li alîyekî hejmara reaktorên nukleer hew zêde dibe, li alîyê din xerckirina enerjîyê bi tesîra mezinbûna aborî ya başûr –di serî de *Çîn, Hindistan û Brezîlya*– pir zêde dibe. Ji bo dema di navbera 2008-2035 ê de di çapa dawî ya rapora xwe ya salane ya siberoja enerjîyê de pisporên *Ajansa Navneteweyî ya Enerjîyê* (IEA) pêş dibînin ku welatên ne endamên *Rêxistina Hevgirtin û Pêşketina Aborî* (OECD) wê % 80yê zêdebûna daxwaza elektrîkê pêk bînin. (4) Û Çîn a ku wê daxwaza xerckirina enerjîya elektrîkê di heman dewrê de sê caran ji ya berê zêdetir bibe, dest bi bernameyeka bi îhtîras a nukleer kir. Di çarçoveya vê bernameyê de bîstûheft reaktor niha tên avakirin û çil reaktor jî projeyên wan amade ne. Di heman demê de ji bo ku stokên xwe çêke, li ser bazara dinyayê ya uranyûmê derketiye seyd û nêçîrê: Li gor aktorekî bazirganîya cewher, ji 70 000 tonên par li dinyayê hatî firotin Çînê 17 000 ton kirîne. (5)

### Li gorî fermîyetê ji sala … 1972an ve tê avakirin

Ev perspektîf dikin ku dilê partîzanên nukleer hilavêje û vejîneka rastî ya pîşesazîya xwe ragihînin. Komîserîya Enerjîya Atomî û Enerjîyên tên Nûkirin (CEA) sazîya dewletê, pîşesazî û bazirganîyê ye ku erka wê birêvebirina lêkolînên nukleer en li Fransayê ye û ev sazî di heman demê de hisedara sereke yê AREVAyê ye jî. Birêveberê giştî yê CEAyê **Bernard Bigot** ji me re weha dipeyive "*ji sê yan jî çar salan ve nêzî çil welatan serî li me da. Dînamîkeka nabe were înkarkirin, heye*". Ya rastî hin welat dest pê dikin lê bifikirin, wekî *Mîrnişînên Ereb ên Yekbûyî* ku sala 2009an tercîha *reaktora APR 1400* a Koreya Başûrî erê kirin û reaktora zexta wê hevseng a ewropî (RZHE) ya AREVAya fransî tercîh nekirin. Li *Erebîstana Seûdîyê* jî pirsa nukleerê di rojevê de ye: Daxwaza enerjîyê ya li nav welêt pir zêde dibe, û ev yek îxrackirina petrolê ango çavkanîya sereke ya dahatîya meliktîyê jî dixe tehlûkeyê. (6)

Hejmareka her diçe zêde dibe ya welatan alternatîfa nukleer li ber destê wan jî be, ev dînamîk xwe bi hejmarên heyî nade der. Li gor *Ajansa Navneteweyî ya Enerjîya Atomî* (IAEA) ya ser bi *Neteweyên Yekbûyî* ve, îsal şêstûçar reaktorên nukleer ên tên avakirin, li tevahîya dinyayê hene. Îcar vê bigrin li ber sed û bîst reaktorên dawîya sala 1987an jimartî dihatin avakirin û heta li ber dused û sîhûsê reaktorên sala 1979a dihatin avakirin; sala 1979an di dîroka atoma sîvîl de sala rekorê ye. Nexasim çawa *Enstîtûya Worldwatchê* jî tesbît dike, hin ji avahîsazîyên pêk tên ên ku IAEAyê ew jimartî, hê xeyalî ne: Duwazdeh ji wan ji bîst salan bêhtir e ku li ser vê lîsteyê ne, rekora projeya herî kevin jî di destê Watts Bar-2 ya amerîkî de ye, bi awayekî fermî ji sala 1972an ve tê "avakirin"; duduyên din jî (li Taywanê) ji deh salan bêhtir e ku tên avakirin. Dawîya dawî, ji çar paran sisiyê reaktorên tên avakirin yên çar welatan in: Çîn, Hindistan, Rûsya û Koreya Başûr. Pisporekî pîşesazîya nukleer hişyar dike "*bi ser de jî, Rûsya hin projeyên nînin jî dide zanîn*".

Di wê navberê de ku hinek difikirin û hinek ava dikin –carinan bi derengmana pir girîng ên wekî avakirinên reaktorên RZHEyê li Fînlandayê û li Fransayê –qada reaktorên nukleerê kevin dibe. Li gor IAEAyê temenê navikî yê reaktorên nukleer li dinyayê 27 sal in (ji bo yên li qada fransî 25 sal); bêhtirî ji sedî 40ê wan îro sîh salî yan jî kevintir in. Û heke em ji Enstîtûta Worldwatchê bawer bikin, hejmara reaktorên ku wê karê wan were rawestandin, ji sala 2015an pê ve ji ya yên ku wê nû bikevin xizmetê, bibihure. Dirêjkirina dema jîyana reaktoran ji çil salan zêdetir, wê ji bilî derengxistina vê fenomê û wê de tu encamê nede.

Gelek welat dibe ku wekî din li projeyên xwe yên dirêjkirina demê vegerin, wekî *Almanyaya* ku piştî qezaya li **Fukuşîmayê** heft santralên xwe yên herî kevin girtin, paşê dawîya gulanê da zanîn ku bêyî ku lê vegere ji niha heta 2020ê ew ê ji nukleerê bi tevahî qut bibe. Analîza çavkanîyeka malî ya nêzî dosyayê weha ye: "*ya rastî ev biryar li gor dilê yên ku van santralan dixebitînin e jî. Di nav hejdeh mehan de bihayê brut yê di van santralan de ji 10-12 euroyan serê megawatsaetê (MWs) dakete 2 euroyan serê MWs. Di vê astê de êdî mimkin nîne kar were kirin.*" Sedema vê yekê bacek e gihiştî 2.3 milyar doleran e ku hikûmeta alman di berdêla dirêjkirina temenê santralên wan de li ser şirketên santralên nukleer dixebitînin ferz kir. Heke pîşesaz plana veqetîna ji enerjîya nukleer a hikûmeta **Angela Merkel**ê biryarê wê dayî qebûl bikin, ev bac wê betal bibe. Gulana 2011an hikûmeta Swîsî jî ragihand ku ew ê cihê pênc reaktorên xwe yên nukleer danegire û dawîya xebitandina wan jî wekî 2034 ferz kir.

### Li deverên din ên Ewropayê jî siberoj ji bo vê pîşesazîyê pir bi xêr xuya nake

Li deverên din ên Ewropayê jî siberoj ji bo vê pîşesazîyê pir xweş û bi xêr xuya nake, heke em projeyên Polonyayê biryara wan dayî (ji niha heta 2030î sê reaktor) û yên *Tirkiyê* nehesibînin. Li Tirkiyê projeya reaktora *Akkuyuyê* –ji salên 1960ê ve pêncem hewldana bernameyeka nukleer e– rastî muxalefeteka xurt tê. Îtalyayê sala 1987an di encama referandûmekê de destê xwe ji enerjîya atomî kişandibû, û wekî yek ji nîşanên ronesansê hatibû nîşandan: Sala 2008an parlemanê biryar-qanûnûnek erê kir ku armanca wê pêkanîna bernameyekê ye ku wê ji sedî 25ê pêdivîya elektrîkê ya welêt ji niha heta 2030î bi nukleerê hilberîne. Lê belê ji hingê ve muxalifan pêkanîna referandûmeka nû di 12 û 13ê hezîrana 2011an de bi dest xist; **Silvio Berlusconi** yê ji piçûkketinê ditirsiya, berîya referandûm pêk were, qanûneka biryara wî ya sala 2008an betal dike da zanîn: Ango Îtalya wê xwe bi santralên nukleer gurçûpêç neke (divê were rojanekirin).

Meliktîya Yekbûyî jî reaktorên nû plan kiribûn. *Electricité de France* (EDF) ji bo ku çar RZHEyan ava bike namzed e. Lê belê reaktora AREVAyê û hevrika wê ya japon-amerîkî AP1000 hê ji destûr ji *Sazîya Ewlekarîya Nukleer a Brîtanî* wernegirtiye, vê sazîyê biryara xwe ya ku diviyabû hezîrana bihurî bihata eşkerekirin paş xist da ku li gor rûdanên li ***Fukuşîmayê*** dosyayan ji nû ve lê bikole. Pisporekî malî weha texmîn dike: "*dibe ku projeyên brîtanî pêk neyên. Di dema dirêj de zêde şik û guman hene ku li ber bibin asteng ku pîşesazek bikeve nav vê projeyê*". Londonê bêguman garantî (tesbîtkirina sînorê jêr ê biha, serê tona $CO_2$yê li dijî hilberîna bi komir û gazê, di dema dirêj de garantîya li ser bihayê firotina elektrîkê) pêşniyaz kirine da ku dilê muteşebîsan rehet bike. Lê belê, wekî tevahîya welatên ewropî, hikûmetê mîqdara berpirsiyarîya şirketên ku santralên nukleer dixebitînin ên brîtanî ji nû ve di ber çavan re derbas kir: Bi mîqdareka ku herî zêde wê bigihêje 1.4 milyar euroyan, ew divê ziranên ji ber qezayekê tezmîn bikin. (7)

### Her tişt îşaret pê dike ku hestên qezaya li Fukuşîmayê bû sedem, wê neke ku raya giştî alîgirîya vejîna atomê bike

Her tişt îşaret pê dike ku hestên qezaya li ***Fukuşîma***yê bû sedem, wê neke ku raya giştî alîgirîya vejîna atomê bike. Analîstê malî weha pêş dibîne: "*Ji bilî du reaktorên RZHEyê yên li Fînland û Fransayê tên avakirin, ez texmîn nakim ku tu reaktoreka din heta sala 2020î li Ewropayê were avakirin. Ez bawer nakim ku projeya RZHEyê a li **Penly**ê (Seine-Maritime) berçav bibe.*" Şirketa Total jî bi % 8.33yê di vê projeya EDF wê hildigire de cîh digire. Birêveberê giştî yê şirketa ***Total***ê **Christophe de Margerie** jî analîstê li jor navbirî piştrast dike: "*Fikirîna li ser projeyê xuya ye rawestiyaye. Teqwîmeka demên muhtemel hebû, ew teqwîm êdî nîne.*" (8) Wezîrê pîşesazîyê yê ku bi awayekî hişk nukleera Fransayê diparêze, **Eric Besson** ev axaftin tekzîb kirin.

Li Japonyayê serokwezîr meha gulanê, devjêberdana bernameyekê ragihand ku armanca wê zêdekirina para atomê di hilberîna elektrîkê ya welêt de % 30î derxe % 50yî bû. **Kan Naoto** amadekirina planeka ku teserûfa enerjîyê û pêşxistina çavkanîyên enerjîya xwe nû dike, da zanîn. Ev bername pêşnîyar dike ku li ser tevahîya xanîyên nû bê ferzkirin ku bi lewhayên enerjîya rojê techîzkirî bin. Li *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* sala 2000î serokê welêt **George W. Bush** ji hilberînerê elektirîkê xwestibû atomê ji nû ve bidin destpêkirin, santraleka pêşî sala 2010an kete xizmetê. Patronê *WISE-Parisê*, şirketeka pisporîyê ya serbixwe ya li ser nukleerê, **Yves Marignac** vê weha şîrove dike: "*Li wir bi tenê medya ji vê bawer kir. Deh salan piştre, tevî desteka ku birêveberîya Obama ji nû ve diyar kir jî, tu projeyan dest pê nekiriye.*" Kongreyê bixwe sala 2005an budceyeka 17.5 milyar dolarî veqetand ji bo ku deynan misoger bike û rîskên malî yên operatoran kêm bike. Şeş salan piştre bi tenê nîvê fonan hatin bikaranîn û tu avahîsazîyê dest pê nekir, belê **Barack Obama** pêş dibîne ku 35 milyar doleran li budceya sala 2012an zêde bike. (9) Karekî pûç û vala ye, qet nebe di dema navîn de, lewra bikaranîna bileztir û zêdetir a çavkanîyên amerîkî yên gaza xwezayî kir ku bihayê gaza xwezayî li bakurê parzemîna Amerîkayê kêm bibe: Vê jî kir ku hilberîner ji ***uranyûmê*** rûyê xwe badin û gazê tercîh bikin. (10)

### «Bi tenê medya û çapemeniyê jê bawer kir»

Dema mirov ji nêz ve li mijarê dinihêre, weha xuya ye ku deregulasyona bazarên enerjîyê di dara endustrîya nukleer de ji rêxistinên ekolojîst bêhtir bi rola neyînî radibin. **Bigot** rave dike "*divê*

*mirov baş pê zanibe ku ketina nav karê nukleerê envestîsmaneka gelekî demdirêj e. Ji dayîna biryarê heta bi jihevdexistina santralan a di dawîya emrê wan de, sedsalek derbas dibe. Bi pererazandinên giran ên destpêkê û hatinên madî yên li salan belavbûyî.*" Demên dirêj bi daxwazên kara bi lez a bazarên malî yên di aborîyên lîberal de li hev nakin. Ser-ekonomîstê IAEAyê û berpirsîyarê rapora ajansê ya li ser siberoja enerjîyê **Fatih Birol** weha vê yekê ji me re piştrast dike: "*ya rastî heke çarçoveyeka saxlem nebe, ya ku dewletê ji bo kêmkirina fikar û gumanan danî, ya ku giranîya xwe dide ser bikaranînê, zehmet e mirov bikeve nav envestîsmanên bi vî rengî. Ev yek ji wan sedeman e ku rave dike ka ji bo çi mezinbûna nukleer para bêhtir li derveyî welatên endamê OECDyê pêk tê.*" Li derveyî ekonomîyên plankirî yan jî sektorên birêvebirî, gelo di dema dirêj de wê ti silametî ji vê teknolojîyê re nebe? Bersiva **Birol**: "*Heke enerjî bi tenê girêdayî bazaran be, û tedbîrên teşwîqkirinê yên hikûmetan nebin, wê êdî pêşketina nukleer nemîne.*"

## Heke enerjî bi tenê girêdayî bazaran be, û tedbîrên teşwîqkirinê yên hikûmetan nebin, wê êdî pêşketina nukleer nemîne

Birêveberê giştî yê *Înstîtûya Parastina ji Radyoaktîvîteyê û Ewlekarîya Nukleer* (IRSN), **Jacques Repussard** jî bi **Birol** re hemfikr e. IRSN sazîyeka dewletê ya fransî ye û bi rayedarên gelek welatan re hevkarîyê dike. **Repussard** dibêje "*Wekî mînak, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê niha pir zehmetîyê dikişîne ku guh bide tevnên xwe yên nîv-dewletî yên elektrîkê tedarîk dikin. Di ekonomîyên lîberal de êdî siyasetên envestîsmanên mezin ên dewletê nemane; hingê jî yên ku dikarin vîzyoneka dema dirêj garantî bikin, yan jî nekin bazar in. Û tevî ku gelek welat nukleerê wekî bivênevê dibînin jî, zehmet e ev vîzyon li derveyî çarçoveya aborîyan li wan hatiye danîn yên mîna Fransaya sala 1970yî bernameya xwe dayî destpêkirin, yan jî mîna Çîn û Hindistana roja me ya îro.*" Li welatên rojava halê hazir tevahîya nakokîyê ev e: Elîtên ku pesnê atomê didin ji bo ku girêdana bi enerjîyên fosîlî re kêm bikin û ewlehîya tedarîkkirinê zêde bikin –lewra hêsan e sotemenîya ji bo enerjîya atomê ji bo gelek salan were stokkirin– ji ber nebûna birêveberîya ekonomîk, di pêkanîna bawerîya xwe de bi bin dikevin.

## Bazar û hisedar hîç meyldar xuya nakin ku şûna reaktorên kevin dibin, bi yên nû dagirin

Ya rastî, heke ji wan were çarçoveyeka "bawerîyê dide" bi riya tedbîrên rîskên malî ji bo pîşesazan kêm bikin, biafirînin jî ya ku stratejîya pîşesazan diyar dike berîya hertiştî daxwaza hisedaran û bazaran e, ku li pey kara dema kurt û dema navîn in. Û ew hîç meyldar xuya nakin ku şûna reaktorên kevin dibin, bi yên nû dagirin. Hewesa kêm a EDFyê – tevî ku dewleta fransî wê kontrol dike jî –ya ji bo avakirina reaktora duyem a RZHEyê ya ku Sarkozy xwest li Penlyê were avakirin, nîşana vê yekê ya herî baş e. Heke vegera ber bi bêhtir kontrolparêzîyê û ber bi awayekî plankirina aborî nebe, xurtkirina para nukleerê di nav enerjîya welatên pêşketî de wê xewnek be, tevî argumana –dikare were bihîstin– ya şerê li dijî germbûna avhewayê jî.

Ji dawîya salên 1990ê ve, avhewa kete nav nîqaşê: Ev awayê hilberîna enerjîyê pir kêm gazên karbonîk berdide atmosferê. Argumaneka xurt û xwedî giranî, ku Fransayê di guftûgoyên li Neteweyên Yekbûyî bi dengekî bilind îfade kir, nexasim di ***Konferansa Kopenhagê*** ya sala 2009an de û di civînên li raya giştî girtî yên Yekîtîya Ewropayê de: Bi tenê bipêşxistineka gelekî zêde ya nukleer destûrê wê bide bersivdayîna pirsgirêka şerê li dijî germbûna avhewayê. Li gor zanyaran ji bo biîstîqrarkirina avhewayê divê dinya gazên xwe yên tesîra serayê dikin, ji niha heta 2050yê du caran ji berê kêmtir bike û heta ji bo aborîyên herî pêşketî çar caran ji berê kêmtir bibe. **Birol** IAEAyê weha hişyar dike: "*Para enerjîya nukleer li dinyayê were kêmkirin, ev ê bibe nûçeyeka xirab a ku sê alîyên wê hene. Serê pêşî ji bo ewlekarîya tedarîkkirinê, lewra ji bo cihê wê were dagirtin, mirov wê berê xwe bidin enerjîyên fosîl ku bi xwe sînordar in. Ya diduyan, lewma bihayê hilberîna elektrîkê wê zêde bibe, nukleer wê alternatîfa herî erzan bimîne. Û bêguman ji bo şerê li dijî germbûna avhewayê. Bi tenê du awayên hilberîna elektrîkê ya bê karbon hene: Bi enerjîyên nû ku ji ber bihayê xwe û neliberdestbûna xwe pirsgirêk in, û bi nukleerê.*" Ev fikir serokê komeleya ***Global Chance***, ekonomîst **Benjamin Dessus** qaneh nakin: "*IAEA di senaryoya xwe ya ji bo dinyayeka ji karbonê paqijkirî ya li asoyê 2050yê de bi tenê % 4 ta 5ê gazên wê werin kêmkirin dixe para xêra atomê, li hemberî vê % 60 bi xêra teserûfa enerjîyê wê kêm bibin, % 20 bi xêra enerjîyên dikarin werin nûkirin û % 15 jî bi emînkirina gazên karbonîk yên ji şewitandina komir û enerjîyên fosîl peyda dibin. Ango em dikarin bi rihetî dev ji nukleerê berdin, lewma ji bilî pênc welatan, ew bi tenê pareka pir piçûk a hilberîna elektrîkê li welatên wê bi kar tînin, pêk tîne.*" (11)

## Tercîhên ji bo sedsalekê

Bisporên CEAyê **Dessus** û **Philippe Girard** sala 2006an ji bo asoyê 2030ê senaryoyeka siberojê ya bi navê **Sunburnê** amade kiribûn. Li gor vê senaryoyê sîh welatên din wê derbasî nukleera sîvîl bibûna û ji niha heta sala 2030î wê hilberîna elektirîka nukleer bigihîne serê saetê 8900 TWyan; li gor texmîna bisporên IAEAyê bixwe ev mîqdar wê serê saetê 4900 TW be. (12) Ev senaryoyeka pir "xweşbîn" e –berdêla wê avakirina şeşsed reaktorên RZHEyê ye, ango ji 2015an heta 2030î her sal divê çil unîte bikevin xizmetê–, lê belê di encama wê de li gor senaryoya IAEAyê sala 2030î bi tenê dike ku ji sedî 9ê gazên karbonî yên dinyayê kêm bibin. (13) Ya ji vê jî xirabtir ev e: Di senaryoya **Sunburnê** de gazên tesîra serayê dikin, dema mirov li ber projeksîyona IAEAyê bigire, li ser hev di perîyoda di navbera 2006-2030î de bi tenê wê % 2.9 kêm bibin.. Kurt û kurmancî, pêşdebirineka nukleerê ya li tevahîya cîhanê ya gelekî bi hewas jî wê destûrê nede ku bi awayekî encamgir şerê germbûna avhewayê were kirin. **Bigot** vê bersivê dide "*pêşdebirineka pir zêde ya bikaranîna elektrîka ji nukleerê, wekî mînak belavbûn û giştîbûna wesaîtên bi elektrîkê dixebitin, wê destûrê bide ku encameka pir baştir were bidestxistin. Û atom di warê bihukûha de avantajeka bi rastî ye. Bi bilindbûna kûrên petrolê, îro êdî xewn nîne ku mirov lê bifikire bihayê lîtreyeka benzînê bi 3 yan jî 4 euroyan be, maşîneka bi elektrîk îro serê sedkîlometroyî bi euroyekê elektirîkê xerc dike. Em bixwazin jî û nexwazin jî, heta heke em enerjîyên nû dibin, bi bayê bezê bi pêş jî bixin, em nikarin dev ji enerjîya nukleer berdin.*"

* Rojnamevan

(1) Nuclear Power in a Post-Fukushima World, nîsana 2011an. www.worldwatch.org/end-nuclear. L'AIEA behsa 443yan dike, bêyî ku şeş reaktorên li Fukuşîma Daîçîyê bihesibîne.

(2) Statîstîkên sala 2010an hê nehatine eşkerekirin.

(3) World Nuclear Association, hezîrana 2011an.

(4) World Energy Outlook 2010, çirîya paşîn a 2010an.

(5) Di nav rewşa aloz a piştî Fukuşîmayê de gelek pispor û kadroyên pîşesazîya nukleer ên ku di çarçoveya vê lêkolînê de hevpeyvîn bi wan re hat kirin, bi şertê ku nasnameya wan neyê eşkerekirin, hevpeyvîn qebûl kirin.

(6) Binêre li Kate Dourian, «Saudi Arabia sees output at 10.8 million b/d by 2030: official (Erebîstana Suûdî ji bo sala 2030î hilberînê wekî rojê 10.8 milyon varîl dibîne)», 20ê nîsana 2011an, www.platts.com.

(7) *The Observer*, London, 23ê kanûna paşîn 2011an. Li Fransayê mîqdara herî bilind wê bigihêje 700 milyon euroyan.

(8) *Challenges*, Paris, 5ê gulana an

(9) *New York Times*, 29 nîsana 2011an.

(10) Kêmbûna bihayê gazê bi awayekî neyekser, kara hilberînerên petrola ne konvensîyonel ên Kanadayê baştir kir, lewra ji bo bi destxistina varîlek petrola ji xîza bi titum, bîst metrokub gaz divê.

(11) Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Fransa, Japonya, Almanya û Kore di nav xwe de ji sedî 80yî hilberîna elektrîka nukleer par ve dikin.

(12) Serê saetê TW nîşana serê saetê mîlyarek kilowattî ye.

(13) *Cahiers de Global Chance,* Meudon (Franse), hejmar 21, gulana 2006an.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxeza rengîn , 50 x 70 cm

Li Ouagadougouyê (Burkina Faso) ku lê navbêynkarîyeka navneteweyî tê organîzekirin, berdevkê serhildêran Bilal Aga Şerîf di 16ê çirîya paşîn de da zanîn ku ew “alîgirê hevdîtinê û peydakirina çareserîyeka mayînde ye di vê pirsgirêka di navbera Malî û Azawadê de”. Neteweyên Yekbûyî bi xwe li alîyê xwe destwerdaneka eskerî guftûgo dikin. Parçebûna di pratîkê de ya Malîyê nazikbûna sînorên afrîkî ku ji dawîhatina li şerê sar û vir ve marke ye, nîşan dide

LI BAKURÊ MALÎYÊ ŞER, LI SÛDANÊ PARÇEBÛN…

# Çi ji ber sînorên welatên afrîkî ma?

ANNE-CÉCILE ROBERT

Bûyera eşkerenebûyî ya teqîna li fabrîkaya çekan a Yarmoukê di 23yê çirîya paşîn de li nêzîkî Xartûmê, hê jî dibe sedema alozîyan di navbera Sûdan, welatên cîran û rêxistinên navneteweyî de. Li gor navenda lêkolînan ya swîsrî bi navê Small Arms Survey, avahîyên jihevdeketî yên firmayê, ku çekên sivik lê dihatin hilberandin, di heman demê de bi kêrî depokirina çekên ji Çînê îtxalkirî dihatin. (1) Beyî ku karibe vê yekê îsbat bike, Xartûm li hemberî Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY), Îsraîlê gunehbar dike bi sabotekirin û heta bi bombebarandina ser fabrîqeya çekan de. Tê fikirkirin ku ev firma beşdarî kirîn û firotina wan çekan e ku dişînin Xezze û Îranê.

Sûdan welatekî erdên wê 1.9 mîlyon kîlometre kare fireh e û li Rojhilatê welêt serhiladana Darfûrê diqewime. (2) Bi ser de jî, ji tîrmeha 2011an ve, beşek ji erdên Sûdanê yên li başûrê welêt jê qut bûn. Piştî şerekî navxweyî ya bi dehan salan, yên dixwestin ji Sûdanê qut bibin gihîştin serxwebûnê û navê Sûdana Başûr li xwe kirin. Tevî ku gelek lihevkirinên li ser eşkerekirina xeta sînoran û belavkirina çavkanîyan hatin mohrkirin, herdu welatan hê jî aştî pêk neanî ne, û dûrî vê rêyê ne. (3)

Rewşa Sûdanê, ku pevçûn lê diqewimin û ji alîyê tevgerên ji bo parastina hêza navendî ve gef lê tên xwarin, li parzemîna reş ne îstîsnayeka îzolebûyî ye. Tevî ku alozîyên li Sahelê diqewîmin tevahîya bala dîplomasîyê û ya çapemenîyê dikşîne ser xwe, li herêmên din yên Afrîkayê bûyerên bi heman rengî rûdidin: daxwazên xweserîxwaz, serhildanên çekdarî, nehatina ji destê desthilatdarîyan ku ewlekarîyê misoger bikin, kirîn û firotina navneteweyî ya çek û cebilxaneyê, şaşîyên birêveberîya welatên xerîb, pêşbazîya kontrolkirina çavkanîyên xwezayî, hwd. Dewletên ku lawaz dibin êdî nikarin “herêmên grî” kontrol bikin. Ev herêm li dûrî paytextan in û pir caran rêveberîya wan di destê sûcdaran de ye. Bi vî rengî, di navbera Nîjer û Nîjeryayê de erdekî bi sih yan jî çil kîlometre dirêj heye ku Niamey û Lagos nikarin kontrol bikin. Carinan sînorên di dema kolonîyan de dîyarkirî êdî di rastîyê de tunene, lewra hejmara koçberan, rêwîyan û bazirganan yên van sînoran nas nakin, pir bilind e.

## Dewleteka de facto ya ku eşîr wê bi rê ve dibin

Bi hejmareka bilind a mirinan, a penaber û ya ji rêderketinên bêdawî, Komara Demokratîk a Kongoyê (KDK) dibe sembola van bûyerên ku têsîrên xirab li derdorê dikin. Bi heman rengî, meriv dikare bibîne ku Somalî ji hev dikeve: beşeka erdê wê, Somalîland, gihîşt şiklekî îstîqrarê ku di bin desthilatdarîya elîteka herêmê ya li Îngilistanê perwerdebûyî de ye. Li alîyê din, li başûrê Mogadîşû, li Puntlandê dewletek heye ku ji alîyê welatên din ve nehatiye qebûlkirin û lê eşîrên debara xwe bi rêya talanê dikin, bi rê ve dibin, hene. Li Afrîkaya Rojava, piranîya welatan di nav aştîyê de bijîn jî, sedemên krîzên belavbûyî lê gelek in û îhtîmalên rûdana beîstîqrarîyê rewşa van krîzên belavbûyî girantir dike: Li herêmeka Senagalê a li ser sînorê bi Gambî û bi Gîne Bîsawê re ye ya bi navê Kasamansê, çalakîyên bi şidet yên ji bo xweserîyê (suîkast, revandin) timî diqewimin; li deltaya Nîjerê, komên çekdarî bacê li ser şirketan ferz dikin û karê avahîyên petrolî yên Nîjeryayê sabote dikin. Ev yek têsîr li Kamerûn, Togo, û Benînê dike; li welatên Yekitîya Çemê Manoyê (YÇM) (ango li Peravên Îvorî, Lîberya û Sierra Leonê), hê şopa şerên dawî pêkhatî dimînin. (4) Herçî herêma Saharo-sahelî ye, ew qada çalakîyên tevgerên sûc û krîmînel, ya komên îslamîst û ya daxwazên tuaregan e, ew jî di pratîkê de dibin sedema parçebûna Malîyê. (5) Wisa xuya ye ku beşa başûr a parzemînê, ku giranîya Afrîkaya Başûr lê heye, li derveyî vê meyla jihevdeketina welatan dimîne.

Wisa xuya ye ku prensîba destnedana sînoran, ya di sala 1963yan de di peymana Rêxistina Yekitîya Afrîkî (RYA) de hatî nivîsîn, bi rastî tê binpêkirin. Di gulana 1963yan de, ango ji mêj ve, serxwebûna Erîtreya ku ji Etyopyayê qut bû, ev prensîp bin pê kir. Lê belê, welatên nû afirandî li gor sînorên di dema kolonîyan de dîyarkirî avabûn, ango di çarçoveyekê de ku dema bihurî, di qada navteweyî de hat qebûlkirin, ava bûn. Lê meriv dikare çi bibêje der barê qutbûna Sûdana Başûr de, ku hema piştî serxwebûnê ji alîyê “civaka navneteweyî” ve hat naskirin, gelo wê ev bûyer amade kiribû? Belê rast e, soza xweserîya vê herêmê di dema serxwebûnê de, di 1956an de, di çarçoveya dewleteka federal de hatibû dayîn. Lê belê Xartûm tu cara ev soza xwe bi cih neanî û bû sedema serhildaneka çekdar ku tevahîya du şerên navxweyî domand.(6)

Di wan deman de ku zext li ser sînoran zêdetir dibe, divê meriv çi bersivê bide yên serxwebûna Sahelê dixwazin? Di daxuyanîya 17ê sibata 2012an de, serokdewletên Civaka Dewletên Afrîkaya Rojava (Cedeao) bi awayekî cidî girêdayîbûna xwe bi desthilatdarîya Malîya kontrola bakur ji dest dayî ve dan zanîn. Lê piranîya wan (Nîjerya, Peravên Îvorîyê (7), hwd.) bi krîzên li ber teqînê yan jî bi krîzên destpêkirî re rû bi rû ne. Ev krîz ji sînorên welatên xwe dibihurin û otoriteya wan dixin ber lêpirsînê.

“Sîstemên pevçûnê” li Afrîkaya Rojava, Rojhilat û Navîn bi rastî bi cih bûn. Li gor siyasetnas Michel Luntumbue (8), piranîya van navendên alozîyê “li ser xetên sînoran pêk tên, dînamîkên wan yên hundirîn bi piranî dibin sedema belavbûn, an jî mezinbûna krîzan”. Bûyerên bi vî rengî li Ewropaya Navîn û Rojhilat jî qewimîbûn (cihêbûna Komara Çek û Slovakyayê, parçebûna Yugoslavyayê), lê belê li Afrîka ev tişt di çarçoveya taybet a Dewletên Afrîkî yên lawazbûyî de pêk tên, yan jî di çarçoveya dewletên ji ber ku nikarîbûn bipêşketina welêt misoger bikin ketine nav pêvajoyeka jihevdeketinê de diqewimin. Projeyên neteweyî ji bo bipêşketinê yên elîtên serbixwe bi derbên otorîtarîzm û bi bertîlxwarîyê betal bûn. Birêveberîya rêxistinên aborî yên navneteweyî piştgirîya lawazbûna desthilatdarîya dewletan dike, heta ku dewlet bibin wekî zarokan.

Li parzemîna reş, şideta newekhevîyên civakî nîqaşên nasnameyî/neteweperestî bi gewde dike. Ew wekî yekane rêya bilindbûnê di nav civakê de tê hesibandin: dema xort wekî endamên “civakeka” olî, çandî yan jî etnîk xwedî dozeka taybet tên hesiban, hesta aîdîyetê bi wan re çêdibe û çekan hildigrin da ku mafê xwe û yê miletê xwe bixwazin, ev yek jî zirarê li mafên welêt bi giştî dike. Li alîyê din, her diçe zêdetir ciwan ji nehatina ser rêya baş a mezinên xwe gilî dikin, yên ku bi desthilatdarîyê ve zeliqî ne û pirî caran berjewendîyên gel ji bîr dikin. Li gor Luntumbue, di nav wan civakan de ku di demokrasîyên baş de bicihnebûyî ne, qutbûna eşkere ya lihevkirina civakî di navbera herdu nifşan de, “çandeka xweranegirtinê” bi gewde dike. Wekî nimûne, komên çekdarî yên deltaya Nigerê, endamên tîpîk ên ciwanîyeka bêhêvîmayî û çavbirçî ne ji bo ku ji bereketa petrolê para xwe bistînin. Daxwaza xweserîyê ya herêma cîran Bakaasî, li Kamerûnê, tê maneya liberrabûna rewabûna dewletek jê naye bixapîne û bide bawerkirin ku dewlemendîyên welêt bi gel re parve dike.

Ev pevçûn, ku sedemên wan heq in, pir caran ji ber bûyereka li derveyî welêt qewimî derdikevin holê. Bi vî rengî mudaxaleya Rojava li Lîbyayê di bihara 2011an de, kir ku çekên şerî yên ji cebilxaneya general Muemer Qedafî belav bibin û herwiha piştgirîya paraşûtvanên franko-brîtanî kir. Ev çek birin herêmeka li jixwe lê helwêsta cîhada îslamê belav dibû, di wê demê de agirê şerên di navbera paytextan (Bamako û Niamey) û serhildêrên tuaregî de gur dibû di bin sîya bertîlxwarî û zexta zorê de. Li alîyekî din jî em pê dizanin ku şîrketên mezin ên pirneteweyî şerên bi vî rengî bi kar tînin, heta wan bi rê ve dibin da ku dest biavêjin dewlemendîyên kanan. (9)

Wê demê, parzemîn dikeve nav xelekeka bêdawî ya şidetê, lewra pir caran Dewlet neçar dimînin ji bo çareserkirina krîzên wan ditirsînin, alîkarîyê ji derve bixwazin. Bi vî rengî ew dibin sedema piştrastkirina sûcê li wan tê barkirin, yê bêkerbûn û nerewatîyê. Bi ser de jî, hin çavdêr ji encamên ne li rê, yên mudaxaleya rêxistinên mafê merivan ditirsin: li gor siyasetnasê kamerûnî Achille Mbembe, ew dibin sedema tevlîhevbûna stûnên desthilatdarîya dewletê, lewra herêmên parastî *“di pratîkê de vediguherin herêmên derveyî sînorên welêt”*. (10)

Ji xeynî şerên ji bo erd ên di navbera dewletan de diqewimin, ji salên 1990î û vir ve hejmara şerên navxweyî qat bi qat zêde dibe. Ev şerên navxweyî bi rengê siyaseî-etnîk in û li derveyî sînorên welêt jî tesîrê dikin (Lîberya, Sierra Leone, Peravên Îvorî, Malî, hwd.). Tevî ku globalbûna aborî û fînansî beşek ji planên jeopolîtîk ji nû ve dîyar dikir jî, bi dawîkirina şerê sar ê di navbera herdu blokan de, destûr da dawxazên kevn dengê xwe hildin. Pêkanîna sûcên pirneteweyî wekî kirînûfirotina çekan, ya narkotîkan yan jî ya însanan dibe sedema bêîstîqrarkirina dewletan. Gîneya Bîsaw, ku fêrî darbeyan bûye, bû derîyekî vekirî ji bo hatina kokaîna ji Amerîkaya Başûr û ji bo eroîna ji Efganistanê. Van narkotîkan ji wir dişînin Ewropa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Tevî vê yekê vê herêmê şahidî li pêlên koçberîyê jî kirin, yên armanca wan karkirina di sektorên cotkarî û masîgirîyê de (Burkina Faso, Ghana, Benîn, Gîne-Konakrî, hwd.). Li gor Fona Neteweyên Yekbûyî ji bo Zarokan (Unicef), wisa tê fikirîn ku du sed hezar zarok li Afrîkaya Rojava û li Komara Demokratîk a Kongoyê mexdûrên vê danûstandinê ne. (11)

**“Krîza nasnameyê”**

Gelek kom û tevger gazinan ji kombûna şideta rewa ya dewletê dikin, hevgirtinên li gor berjewendîyên xwe yên demkin pêk tînin û sînorên qulqulî jî ne xema wan in. Bi vî rengî, li Bakurê Malîyê El-Qaîde, li Mexreba îslamî (AQMI) Ansar el-Dîne, li Afrîka Rojava Tevgera Yekitîya Cîhadê (TYC) û komên koçber ên tuareg, ku xwedî daxwazên kevin in, hevkarîyê dikin ji bo ku li dijî otorîteya Bamako têbikoşin. Lê ew di heman demê de girêdayî bazirganên narkotîkê ne, ku pere û alîkarîyê didin wan û bi wan re didin û distînin. Hevkarîyên bi vî rengî bi lez pêk tên û bi lez betal dibin. Xetên sînor ji alîyê aktorên herêmî ve tên dîyarkirin û li şûna wan behsa herêmên cîran û “walatên cîran” tê kirin. Carinan dewletê hewl da bersiva tehlûkeya jihevdeketinê bide û reformên ji bo parastina sazîyên xwe pêk anî, wekî desantralkirina li Malîyê, yan jî wekî pêkanîna federasyonekê li Nîjerîyayê. Lê meylên xirabker hê têsîrê dikin. Di vê çarçoveyê de kevne-serokdewletê Malîyê Alpha Oumar Konaré difikire ku ev reform ji bo pêvajoya heyî çareserî ne: bi saya wan *“rêya aştîyê xuya dike, ango ya demokrasîyê, ya bipêşketinê »*, lewra *“wexta sînor mijara şer in, yan jî wexta îtîraz li wan tên kirin, di çarçoveyekê de ku tirsa ji cîrên yekane tişta hevpar e ya meriv parve dike hingê aştî nikare pêk were»*. (12)

Li gor dîroknasê ji Peravên Îvorîyê Pierre Kipré, Afrîka di *“krîzeka nasnameyî”* de ye ku kokên xwe berdide nav dîroka kevin. Li gor fikra wî eger rast be ku sînorên ji alîyê hêzên kolonyal ve çêkirî bin di dema konferansa Berlînê ya salên 1884-1885an de û eger rast be ku rastîyên civakî û merivî li ber çavên xwe negirtibin, ev kêmasîyeka civakê bixwe ye. Li gor wî sedema alozîyan ev e*: “beşdarnebûna hêzên siyasî yên Afrîkî di avakirina cografyaya herêmê de, û nehesibandina tevnên civakî wekî parçeyekî girîng ê desthilatdarîyê”.* (13) Têkoşîna li dijî kolonîyalîzmê sînorên ku xelkê Ewropî di dawîya sedsala bîstan de dîyarkiribûn, nexistin ber lêpirsînê. Bi heman rengî, dewletên serbixwe ku bi bicihkirina otorîteya xwe ya nû ve mijûl bûn, bêdudilî şerê hev kirin. Bi ser de jî, rejîmên yekpartî ên ku carinan encama wan têkoşînên eskerî bûn yên ku rêbazên otorîter bi kar dianîn, wisa îdîa dikirin ku ew dê daxwazên cihê yên gelan tune bikin ji bo bipêşketina “neteweyî” misoger bikin.

Dîyarkirina xetên sînor ên hişk ne adeteka Afrîkî ye. Li gor adetê, hevdîtîna gel, parvekirin, danûstandin çêtir e. Konaré behsa “sînorên diguherin” dike ku têsîra wan wekî ya “xalên girêdanê” ye. “Xizimparêzî” û henekên ku bi wan sînoran tên kirin, adetek e ku tevî van bûyeran jî hê zindî ye. Serbixwebûna dewletan di salên 1960î de hat bidestxistin, hingê gel herêm û sînorên siyasî yên berîya heştî salan ji alîyê Berlînê ve hatî dîyarkirin, fêm nekiribû.

Gelo divê meriv li “kontr-kongreya Berlînê” bifikire? Sala 1994an nivîskarê nîjeryayî Wole Soyinka wisa digot: *“divê em rûnin, bi pergal û rastekê sînorên neteweyên afrîkî ji nû ve xêz bikin .”* (14) Di demeka nêzîktir de, berîya serdana xwe ya herêmê ya sala 2009an bi çend hefteyan, Nicolas Sarkozy ji bo Komara Demokratîk a Kongoyê wisa peşnîyaz kir: *“rojeka wê bêguman dîyalogek pêk were, yekê ku ne bi sedema konjonkturê be, ew ê bibe dîyalogeka binesazîyê ku bersiva vê pirsê bide: di wê herêma cîhanê de meriv çawa wargehekê parve dike, dewlemendîyan parve dike û qebûl dike ku qanûneka cografyayê heye, ku welat kêm caran navnîşana xwe lê diguherin û çawa fêm dike ku divê meriv fêrî jîyana bi hev re, li cem hev bibe?”* (15) Danezaneka bi vî rengî bû sedema fikaran li ser herêma Golên Mezin, ku lê tirsa li vegera sînorên “kevin” heye. Lê ji xeynî şewazê şîyarker ê serokdewletê fransî, ev fikra wî dibe sedema gumanan di mejîyê gelek entelektuel û birêveberên afrîkî de. Siyasetnasê Kenyayî Alî Mazruî wisa dinivîse *“Di sedsala li pêşîya me de, şiklê heyî yê dewletên afrîkî wê biguhere. Yek tişt dikare pêk were: yan serxwebûna etnîk wê bibe sedema avakirina dewletên piçûktir, wekî parçebûna Erître û Etyopyayê; yan jî wê entegrasyona herêmî bibe sedema yekitîyên siyasî û aborî yên ferehtir.»* (16)

Wisa xuya ye ku rêveberên afrîkî yên ketine nav pêşbazîyekê da ku ji zemên bi leztir bibin, alternatîfa duyem bijartine. Wê sînor werin parastin, lê wê sazîyên herêmî çarçoveyeka aştîxwaz bi cih bikin. Sala 2002yan, Rêxistina Yekitîya Afrîkî bû Yekîtîya Afrîkî. Binesazîya wê xurtir e û xwedî maqamekî biryardayînê yê daîmî û xwedî Konseyeka ji bo Aştî û Ewlekarîyê ye. Ew biryara rêzeka cezakirinan da, ji bo Nîjerya, Peravên Diranê Fîlê û Malîyê ku bûn bizina gunehên wê: cemidandina beşdarîya wan ya di Yekîtîyê de, ambargo, cemidandina milkên fînansî, hwd. Li alîyekî din jî, hin înîsîyatîfên din jî kirin dest xwe, wekî plana çalakvanîyê li dijî narkotîkê û ya tedbîrên li dijî sûcdarîyê. Herçî Civaka Dewletên Afrîkaya Rojava ye, wê hevgirtina -panzdeh dewletên endamên wê ne-, di mijarên bijartî de xurt kir: narkotîk, çek, firotina koçberan. (17) Divê ev rêxistin bibe ya ku destwerdana bê ya li Bakurê Malîyê bi rê ve dibe, eger Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî destûrê bide.

Li gor aborînas Mamadou Lamine Diallo, ferz e ku meriv dev ji “stratejîyên bersivdanê” berde; (18) û herwiha divê dev ji fikrên bi tenê ewlekarîyê li ber çavên xwe digirin jî were berdan, ew bi tenê dikarin beşeka armancê bi dest bixin. Pirsgirêk ji nû ve dîtina şiklên rewatîyê yên desthilatdarîyê ye ku xwe dispêrin rastîyên civakên afrîkî, lewra sedema jihevdeketina dewletan dûrbûna wan ji gel e.

Konaré îdîa dike *“Li şûna ku li cem gel bimeşin, ew hewl didin li şûna afrîkîyan tevbigerin, ev tê maneya ku divê dev ji mentiqê biryardana ji bo herkesî berdin, em bibêjin divê xwe*

*nêzîkî mentiqekî desthilatdarîyê yê hevpar bikin, ber bi mentiqekî her diçe kêmtir mijara şermezarkirinê ye û kêmtir tê şermezar kirin ve: mentiqekî desthilatdarîyeka bihevre ku bi fêdetir e ji monopolên xerîb ên dixwazin hin welatên afrîkî xwe bi pêş ve bixin, û bibin xwedî pîşesazîyê. Li gor wan hin welatên din yên afrîkî jî wê neçar bimînin bi tenê bibin bazareka ji rêzê, yan jî wê bi tenê bibin hilberînerên madeyên xav.”* (19) Bê guman rêya herî baş a xwe bipêşxistina parzemînê rêya xurtkirina sazîyên birêkûpêkkirinê yên herêmî ye. Divê ev xurtkirin xwe bispêre “civakên bingehîn” ên ku her roj kapasîteya xwe ya aş kirina alozîyên li gelek herêmên tampon ên Afrîkayê îspat dikin

(1) Small Arms Survey, daxuyanî, Cenevre, 25ê çirîya pêşîna 2012an.

(2) Hovîtîya tepisandinê ya ku pêk tîne dibe sedema biryardana girtina serokdewlet Omar El-Beşîr ji alîyê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî (DCN) ve.

(3) Gotara li jêr bixwîne: Jean-Baptiste Gallopin, “Amer divorce des deux Soudans” (Ji hev veqetîna tal a her du Sûdanan), *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2012an

(4) Armanca Yekîtîya Çemê Manoyê ku di 1973yan de hat damezrandin, xurtkirina danûstandinên bazirganîyê ye.

(5) Gotara li jêr bixwîne: Jacques Delcroze, “Effondrement du rêve démocratique au Mali” (Ji demokrasîyê bêhêvîbûna li Malîyê), *Le Monde diplomatique,* îlona 2012an.

(6)Ji 1955an heta 1972yan û pişt re ji 1983yan heta 2005an.

(7) Gotara li jêr bixwîne: Fanny Pigeaud, “Guerre pour le cacao dans l’Ouest ivoirien” (Şerê ji bo kakaoyê li Rojavayê Peravên Îvorî, *Le Monde diplomatique,* îlona 2012yan.

(8) Michel Luntumbue, “Groupes armés, conflits et gouvernance en Afrique de l’Ouest: une grille de lecture” (Komên çekdar, şer, birêveberîya desthilatdarîyê li Afrîkaya Rojava: dîtinek), encama analîza Koma Lêkolîn û Ragihandinê li ser Aştî û Ewlekarîyê (KLRAE), Bruksel, 27ê çileya 2012ê.

(9) Gotara li jêr bixwîne: Colette Braeckman, *Les Nouveaux Prédateurs. Politique des puissances en Afrique centrale (Dirindeyên nû. Siyaseta hêzan li Afrîkaya Navîn),* Fayard, Parîs, 2003.

(10) Achille Mbembe, “Vers une nouvelle géopolitique africaine” (Ber bi jeopolîtîkeka nû ya Afrîkî ve) , di “Afriques en renaissance” (Ji nû ve jidayikbûna Afrîkayan) de , *Manière de voir,* hejmar 51, gulan-hezîran 2000.

(11) Rapora li jêr bixwîne: “La traite d’enfants en Afrique de l’Ouest” (Firotina zarokan li Afrîkaya Rojava), Navenda Lekolînan bi navê Innocenti ya Unicefê, Buroya herêmî ya Unicefê ji bo Afrîkaya Rojava û Navîn, nîsana 2002yan.

(12) Alpha Oumar Konaré, axaftina destpêkê, “Des frontières en Afrique du XIIe siècle au XXesiècle” (Sînor li Afrîkaya sedsala ji sedsala 12an heta bi sedsala 20î), Rexistina Neteweyên Yekbûyî ji bo Perwerde, Zanist û Çandê (UNESCO), Parîs, 2005.

(13) Pierre Kipré, “Frontières africaines et intégration régionale: au sujet de la crise d’identité nationale en Afrique de l’Ouest à la fin du XXe siècle” (Sînorên afrîkî û entegrasyona herêmî: li ser krîza nasnameyî li Afrîkaya Rojava di dawîya sedesala 20î de), di “Des frontières en Afrique du XIIe siècle au XXe siècle” (Sînor li Afrîka ji sedsala 12an heta bi sedsala 20î) de, *li jor navbihurî.*

(14) Wole Soyinka, “Blood soaked quilt of Africa”, *The Guardian*, London, 17ê gulana 1994an.

(15) Nicolas Sarkozy, mesaja sersalê ji Sefîran re, 16ê çileya 2009an.

(16) Ali Mazrui, "The Bondage of Boundaries", (sînorê sînoran) di “The Future Surveyed:150 Economist Years” (Lêkolîn li ser siberojê: 150mîn Salên Ekonomîst) , hejmara taybet ya *The Economistê,* London, 11ê îlona 1993yan.

(17) *Binêre li* nivîsa “Restructuration de la Cedeao” (Ji nû ve birêkûpêkkirina Civaka Dewletên Afrîkaya Rojava) li ser www.ecowas.int

(18) Mamadou Lamine Diallo, “L’Afrique dans la nouvelle géopolitique mondiale” (Afrîka di jeopolîtîkaya nû ya cîhanê de), Fondation Gabriel Péri, Pantin, 24ê çileya 2008an.

(19) “Sînorên li Afrîkayê...”, jêdera li jor navbirî.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

## Afrîkaya Başûr a împaratorî

Gelo Afrîkaya Başûr li derveyî tevgera “bêerdkirinê” ya parzemînê dimîne? Ew xwedî dewletekê ye ku ji alîyê sîstema îdarî ya Apartheidê ya bi şidet ve hatiye birêxistinkirin. Hilweşandina vê rejîma nijadperest hebûna Afrîkaya Başûr a xwedî dewlemendîyên dêwane ye rewa dike. Ew ji bêîstîqrarbûna sazîyên welatên cîran (Mozambîk,Welatê Swazî, hwd.) sûdê werdigre û wan vediguherîne bazarên cazib. Bi ser de jî, ew hewl dide heta ji destê wê tê ji beşdarîya xwe ya di koma BRICSê (BRHÇ) ku tê de hevkarîyê bi Brezîlya, Rûsya, Hindistan û Çînê re dike, sûdê werbigire. Pretoriya ku sala 2013yan dê welatên endam vexwîne civîna bilind a ku ew organîze dike, peşnîyaza lihevkirinên li ser danûstandinan dike. Bi dîtina siyasetnasê kamerunî Achille Mbembe, “neteweya keskesor” ku her diçe zêdetir wekî hêzeka împeryal tevdigere, astengên girêdayî sînoran nas nake û bi vî rengî piştgirîya ji holê rakirina wan dike. Petroria ku di qada aborî de li tevahîya vê beşa-herêmê serdest e, li ber çavên wê bûye wekî stûna welêt, ew şirketên xwe yên ewlekarîyê dibe û wan li derveyî welêt li Malî, li Ghana û li Gîneyê bi cih dike. Şirketên Afrîkaya Başûr beşdarî bazirganîya çekan dibin – bi awayê fermî û ne fermî jî – li herêmên grî yên kirînûfirotinên navneteweyî yên nefermîbûyî.

Afrîkaya Başûr weka hêzeka parzemînî tevdigere. Tîrmeha 2012an, hemwelatîyeka welêt, xanim Nokosazana Dlamini-Zuma, kevne-jina serokdewlet Jacob Zuma, hat hilbijartin û li hember Jean Pingê Gabonî bû seroka Komîsyona Yekîtîya Afrîkî. Şer dirêj ajot û zehmet bû ; Pretoria bêdudilî bandordarîya xwe ya giran û xeşîm bi kar anî, û «fêdeyên» hevalbendîya xwe bi bîr xistin. Li gor Mbembe, li Bakurê welêt, “sînorê xeyalî” yê Afrîkaya Başûr niha nêzîkî Katangayê ye (başûr-rojavayê Komara Demokratîk a Kongoyê). (1) Li alîyê din jî wisa tê îdîakirin ku ew dikeve nav herêma cazib a Deryaya Hind û ya Asyayê.

Lê sibereoja dêwa Afrîkaya Başûrî dîsa jî bi mij û dûman e. Alozîyên civakî ku tepisandina greva Marikana (2) temsîla wan dike, şerên ji bo deshilatdarîyê li nav African National Congress (ANC), li wir rexneyên li ser bertîlxwarîya Zuma deng vedidin û lawazbûnên girîng û hin nakokîyan eşkere dikin. Bi vî rengî bihara 2008an, herîkîna ji nişka ve ya koçberên aborî yên welatên cîran bû sedema bersivdaneka tund ji alîyê gel ve û bû sedema bi dehan mirinan. Wekî ku ji holê rakirina sînoran diviyabû bi tenê bi kêrî şirketan were…

A.-C. R.

(1) Achille Mbembe, “Vers une nouvelle géopolitique africaine” (Ber bi jeopolîtîkeke nû ya Afrîkî ve), di “Afriques en renaissance” (Ji nû ve jidayikbûna afrîkayan) de, *Manière de voir,* hejmar 51, gulan-hezîran 2000.

(2) Bixwîne Greg Marinovich, “Une tuerie comme au temps de l’apartheid” (Komkûjîyeka wekî di dema apartheidê de) , *Le Monde diplomatique,* çirîya peşîna 2012an.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, kolaja bi mirekeb li ser kaxezê, 70 x 50 cm



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav** (Detay), kolaja bi mirekeb li ser kaxeza rengîn, 70 x 50 cm

www.arsivakurd.org

### Ji êrişa li dijî Xezzeyê ber bi şerê li Neteweyên Yekbûyî ve

# Dema ku Filistîn red dike ji holê rabe

LEILA FARSAKH *

**Li alîyekî agirbesta li Xezzeyê ya ku Misirê navbeynkarîya wê kir, rewşa Hamasê hem li qada herêmî û hem jî li hundir xurt kir, li alîyê din Neteweyên Yekbûyî serlêdana Filistînê wekî dewleta neendam a ku serok Mahmûd Ebbas pêşnîyaz kirî, nirxand. Ebbasê pir lawazbûyî li bin guhê Îsraîlê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, gelek dewletên ewropî û her weha gumanbarîya filistînîyan bi xwe ket.**

Di civîna giştî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya 23yê îlona 2011an pêkhatî de, birêveberê PLO (Rêxistina Rizgarîya Filistînê) û serokê Birêveberîya Neteweyî ya Filistînî Mahmûd Ebbas li pêşîya girseyeka navneteweyî ya bi kelecan ev îdîa kir "di demekê de ku gelê ereb dengê daxwaza xwe ya azadîyê dide bihîstin –bihara erebî– niha dem dema bihara filistînî ye, dema serxwebûnê ye". Salekê paşê, tevî ku Ebbas dîsa derket ser heman dikê, ev serxwebûn ji her carê dûrtir xuya dike. Wexta meriv li Şerîa Rojava û li Xezzeyê binêre, wisa dîyar e ku cihê filistînîyan neguherîye û ew hewl didin rojeva siyasî ya Filistînê ji nû ve terîf bikin.

## Bihara erebî û Filistînî

Bihara erebî serdemeka daxwaza demokrasîyê ya nedîtî li Rojhilata Navîn derxist holê. Tevî ku biserketina bihara erebî di hilweşandina rejîman de bi Misir û Tûnisê sînordar bû, ew bû sedema afirandina zimanekî nû yê siyaseteka ku armanca wê guhertina têkîlîya di navbera dewlet û hemwelatîyan de ye, zimanekî ku mafê wan yê azadbûnê û rûmeta wan li pêş dibîne. Hêza vî zimanî herçend lawaz bûbe jî, ji ber şideta şûna protestoyên aştîyane girt nexasim li Sûrîye û li Lîbyayê, dîsa jî gelekî bi têsîr e di nav çalakvanên biryara parastina mafên xwe û gunehbarkirina hikûmetên xwe dan.

Li alîyê filistînî, tevî ku bihara erebî rê li ber hilweşandina PNAyê (Rêveberîya Neteweyî ya Filistînê) venekiribe jî, ew bû sedema daxwaza gelê filistînî ya ji nû ve di ber çavan re derbaskirina Rêjîma Pêvajoya Aştîyê ya Osloyê û pê re jî ya çareserîya bi rêya avakirina du dewletên cihê. Li alîyekî, wê pevçûneka dewamî ya di navbera ciwanan û gel de derxist pêş û li alîyê din jî pevçûneka di navbera birêveberîya siyasî û elîtan de li ser mijara terîfkirina naveroka daxwaza gel û siberoja têkoşîna siyasî ya filistînî. Meriv dikare bibêje ku pêşnîyaza Rêveberîya Neteweyî ya Filistînê ya endametîya Filistînê li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, ku di 1988an de hat îlankirin û Mahmud Ebbas sala 2011 û 2012an dubare kir, hewldaneka RNFyê ye ji bo bersivdana hêrsa gel a her diçe mezin dibe. Ev peşnîyaz di heman demê de hewldanek e ji bo balkişandina ser nîqaşa der barê wê pirsê de ka gelo di çarçoveya filistînî de kîjan mafên wan hene û divê çawa wan bi dest bixin.

## Devjêberdana "pêvajoya aştîyê"

Ji mêj ve, di sibata 2011an de, filistînî daketin kolanan ji bo pişta şorişa misirî bigirin. Ya ku hema piştre bi navê tevgera 15ê adarê dihat naskirin, çalakîyeka ku dawîanîna li perçebûna siyasî ya Filistînê di navbera El-Fetîhê û Hamasê de ku ji 2007an ve kontrolkirina Şerîa Rojavayê dida El-Fetîhê û ya kontrolkirina Xezzeyê dida Hamasê. (1) Komên ciwanan, siyasetmedarên serbixwe û hejmareka zêde ya Rêxistinên ne Hikimî tevlî vê tevgerê bûbûn û li kolanên Ramallahê, li yên Xezzeyê, li yên Nablûsê û li yên bajarên din jî meşîyan. El-Fetîh û Hamasê bersiva vê daxwazê dan, bi mohrkirina sê peymanên lihevkirinê ji gulana 2012an ve. Van peymanan rewabûna Hamasê, mezintirîn partîya îslamî, di sîstema siyasî ya filistînî de erê kir. Welatên din ên ereb jî bi heman rengî tevlîbûna partîyên îslamî di nav siyasetê de normalîze kirin. Lê heta niha ji wan nehat ku hakûmeteka yekîtîya neteweyî pêk bînin û qutbûna ji gel hê xirabtir kirin.

Pîştî gulana 2011an, filistînî hê dadiketin kolanan, tevlî meşên li dîjî Al-Muqataya dibûn, ber bi Kalndîya dimeşîyan, kampanyayên xwe bi rêya medyaya civakî pêk dianîn, û li hemberî zêdebûna bihayê xwarinê radibûn. Daxwazên wan li ser sê pirsgirêkên sereke bûn.

Berî her tiştî wan banga parastina mafên neteweyî yên filîstînî kir. Li gor wan ev maf ne bi tênê mafê xwedîbûna dewletekê ye, lê nexasim mafê vegera li gundên xwe û wekhevîya mafên siyasî ye. Di dema bibîranîna salvegera Nakbayê [jicihûwarkirina filistînîyan; nota wergêr] 15 gulana 2011an de, ciwanên filistînî xwepêşandanên li hemberî cihên kontrolê û li hember Dîwarê Parçekirinê yê îsraîlî organîze kirin; bi hevkarîya Stop the Wall Campaign, ya PNGOê (tevgera filistînî ya Rêxistinên nehikûmetî) û ya komîteyên gel ên li gelek gundên di bin kontrola Şerîa Rojava de ne. Armanca van xwepêşandanan ji nû ve bibîrxistina mafê vegera li gundan ê filistînîyan bû. Di heman demê de bi alîkarîya filistînîyên li nav Îsraîlê dijîn, wan lîstikên şanoyê yên bîranînê li dar xistin li çendekan ji gundên sala 1948an xirakirî de. Ne di çarçoveya fermanên ji qadên bilind tên, filistînî li derveyî welêt û Îsraîlê tevlî hêzên koma ciwanan bûn da ku bi rêya çalakvanîyeka gel, bi rêya sînorên Sûrîye, Urdun û Libnanê bikevin nav Îsraîlê û girîngîya mafê vegera li gundên xwe yê filistînîyan ji nû ve bidin bihîstin.

Daxwaza duyem a xwepêşandêran derdixist pêş, ji bo ji nû ve destpêkirina pêvajoya demokratîk di desthilatdarîya filistînî bi giştî de banga pêkanîna hilbijartinên nû bû. Daxwaza protestovanan ya pêkanîna hilbijartinên nû, ne bi tenê yên Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî û yên Konseya Hiqûqî ya Filistînî (KHF) li herêmên Şerîa Rojava û Xezzeyê ye. El-Herake el-Şebabî, filistînîyên ji bo Rûmetê û komên ciwan yên din, bi taybetî banga lidarxistina hilbijartinên nû yên Konseya Neteweyî ya Filistînî (KNF) kir. Ev beşa hiqûqî ya Rêxisitina Rizgarîya Filistînê (PLO) ye ku tevahîya filistînîyên li nav û li derveyî erdên dagîrkirî temsîl dike. Ew penaberên filistînî, yên li dîyasporayê û filistînîyên li Îsraîlê dijîn jî temsîl dike. Konseya Neteweyî ya Filistînî ji 1988an ve necivîya û ji ber Pêvajoya Aşitîyê ya Osloyê li derveyî siyasetê ma. Bi xwestina ji nû ve xebitandina vê rêxistinê, tevgera ciwanan a Şerîa Rojava û Xezzeyê daxwazên hin komên filistînî yên dîyasoporayê didin bihîstin û dikin ku hevkarîyek di nav wan de pêk were (2), ji bo hewl bidin yekîtîyê pêkbînin di nav tevgera siyasî ya filistînî de ku Pêvajoya Aşitîyê ya Osloyê ew parçe parçe kiribû. Ew herweha hewldana ji binî ve xurtkirina pêvajoya demokratîk e û ya dengdana rêxistinên filistînî yên cihê ye ku Osloyê ew lal kiribûn.

## Mahmûd Ebbas dengê xwe hişktir kir

Daxwaza sêyem ku çalakvanên filistînî li Şerîa Rojava û li Xezzeyê bi pêş xistin dawîlêanîna Pêvajoya Aşitîyê ya Osloyê û li hevkarîya bi Îsraîlê re ye. Ciwanên filistînî li dijî destpêkirina dîyalogên ne seranser ên di navbera îsraîlî û nûnerên filistînî de li Ammanê destpêka 2012an pêk hatin, xwepêşandan li dar xistin. Ew herweha hevdîtinên çalakvanên aştîyê yên filistînî û Îsraîlî yên li Quds û li Ramallahê çileya 2012an pêkhatî protesto dikin û banga tevlîbûna çalakîyên li dijî-normalîzekirinê dikin heta ku Îsraîl dawîyê li dagîrkirinê bîne. (3) Ji havîna 2012an ve filistînîyan grevek da destpêkirin û xwepêşandan li dar xistin li dijî siyaseta jixwekêmkirinê ya Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî û gelek bangên îstîfakirina wê kirin.

Lewra di dema rûdana bihara erebî de, çalakvanên filistînî hewl didin ji bo doza têkoşîna filistînîyan çarçoveyeka nû ava bikin, bi maneya têkoşîneka ji bo mafên filistînîyan û ne ji bo serxwebûnê bixwe. Çalakvanên filistînî li ser rêya kampanîyayên boykot, tecrîtkirin û cezakirinê yên sala 2005an ji alîyê 170 rêxistinên sîvîl hatî destpêkirin dimeşin. Ew îro dubare dikin ku têkoşîna filistînî serhildana li hemberî rejîma apartheid a îsraîlî ye û ji doza parastina sê mafên bingehîn pêk tê: Dawîlêanîna dagîrkirina erdên filistînî, mafê vegera li gundên xwe û mafê wekhevîyê li nav Îsraîlê.

## Tevlîbûna li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

Biryara Rêveberîya Neteweyî ya Filistînê ya serîlêdana li endametîya li RNYyê ya dewleta filistînî jî hewldaneka çareserkirina girêka muzakereyên îsraîlî-filistînî zêdetir, dikare wekî hewldaneka din were fêm kirin, ya bersivdana nerazîbûna gel ji Peymana Aşitîyê ya Osloyê û ya ji desthilatdarîya Hamas û El-Fetîhê. Dema meriv axaftina Ebbas ya sala 2012an li hemberî civata giştî ya RNYê û ya 2011an li ber hev bigire, pir eşkere xuya ye ku Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî hewl dide di heman demê de dilê xwepêşandêran xweş bike û balê bikşîne ser rojeva siyasî ya filistînî.

Armanca axaftinên Ebbas ên 2011 û 2012an li pêşîya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, mohrkirina Bihara Filistînî bi daxwaza serxwebûnê û ya avakirina dewletekê ye, armanca wî ne mafê qebqebûyê ye li hemberî Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî, ne jî kirina doza demokrasîyê ye. Armanca her du axaftinan desttêwerdana civata navneteweyî ye, ji bo vê yekê jê dixwaze ku wezîfeya xwe ya ji bo gelê filistînî bi cîh bîne. Sala 2011an Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî serî li endametîyeka bi temamî ya li RNYyê da.

Ew di pêkanîna vê stratejîyê de têk çû lewra înîsîyatîfa filistînî tevahîya neh dengên pêwîst ji bo serlêdana fermî li Konseya Ewlekarîyê bi dest nexist, sedema vê jî berî hertiştî redkirina Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye. Sala 2012an, Abbas serî li statuya dewleta ne-endam da, eger qebûl bibe wê ev yek Filistînê bibe qadeka bilindtir û wê bike ku ji statuya çavdêrê ne-dewlet derbasî statuya dewleta ne-endam bibe. Eger qebûl bibe wê destûrê bide dewleta filistînî da ku bibe endama ICJ (Dadgeha Navneteweyî ya Adaletê), ya ICC (Odeya Bazirganîyê ya Navneteweyî) û ya ajansên din yên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û wê destûrê bide Rêxistina Rizgarîya Filistînê da ku Îsraîlê bi sedema pêkanîna sûcên şerî û yên binpêkirinên mafên din dadgeh bike. Di 2005an de, Filistînê bi heman rengî stratejîya hiqûqî bi kar anîbû li hemberî ICJ (Dadgeha Navneteweyi ya Adaletê) ji bo redkirina avakirina dîwarê qutbûnê di nav herêma Şerîa Rojava de ji alîyê Îsraîlê ve li şûna ku li gor xeta kesk a 1967an ve were avakirin. Lê belê ev bilindbûna statuya Filistînê wê pirsgirêka dagîrkirina bi vî rengî bi dawî neke , yan jî wê mafê vegera erdên xwe ya filistînîyan misoger neke.

Sedema sereke ya serlêdana li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya Rêveberîya Neteweyî ya Filistînê binxêzkirina mafê filistînîyan ê avakirina dewleteka serbixwe ye ku di dîrokê de % 22yê erdê Filistînê pêk tîne. Dewleteka ku wê herêmên Şerîa Rojava û Xezze bihewîne û Qudsa Rojhilat bike paytexta xwe, ango tevahîya erdên ku li gor biryara 242yê ya Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî bi tevahîya erdên dagîrkirî ne. Abbas sala 2011an û ya 2012an dubare dike ku wê ev dewlet hinekî adaletê bîne Nakbayê; ew berdêla pêwîst e ji bo pêkanîna aştîyê bi Îsraîlê re û ji bo li hev bikin bi daxwaza navneteweyî ya parçekirina Filistînê ji dema Biryara 181î ya Neteweyên Yekbûyî ve. Ew ji bo guhdarên xwe yên filistînî bi bîr dixe ku ev dewlet e ya ku Rêxistina Rizgarîya Filistînê û Konseya Neteweyî ya Filistînê di danezana serxwebûnê ya 1988an de hilbijartin. Bi vî rengî Ebbas rewabûna Projeya Avakirina Dewleteka Filistînî binxêz dike. Ew îdîa dike ku ev rêya herî baş e ji bo parastina mafên filistînîyan, mafê vegera li erdên xwe, yê azadî û bipêşketina aborî û yê wekhevîyê. Bi ser de jî îdîa dike ku ne Rêveberîya Neteweyî ya Filistînê ye ya serî li Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dide, lê belê Rêxistina Rizgarîya Fîllîstînê ye. Ew bi vî rengî bersiva pirsa temsîlkirina wî ya tevahîya filistînîyan dide. Ebbas yekîtîya gelê filistînî dubare dike û di her du axaftinên xwe de behsa penaber û yên di bin fermana hêzên dagîrker de dijin, welatîyên filistînî yên li Îsraîlê dijin û yên li dîyasporayê ne dike. Ew mafên wan ê vegera li ser erdên xwe li gor biryara 194ê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) tevî mafên wan ê wekhevîyê û azadîyê bi bîr dixe.

Tiştê nû di axaftina Ebbas li pêşîya RNYyê de, hewldana wî ya ji nû ve navneteweyîkirina şerê di navbera Îsraîl û Filistînê de ye. Ew hewl dide kontrola pêvajoya aştîyê ji destê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bigire, yan jî lawaztir bike û vê erkê ji nû ve bide Rêxistina Neteweyên Yekbûyî. Wekî ku ew dibêje: "Pirsgirêka Filistînê gelekî girêdayî RNYyê ye, bi rêya biryarên gelek ajans û beşên wê…Em roleka mezintir û bikêrhatîtir ya RNYyê dixwazin û li pey vê yekê digerin da ku hewl bide aştîyeka adil û mayînde li herêma me pêk bîne. Aştîyeka ku mafên rewa yên neteweyî ku nayên înkarkirin yên gelê filistînî misoger bike, wekî ku li nav Biryarên Rewabûna Navneteweyî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de nivîsî ye." (4) Lê belê di navbera axaftina 2011an û ya 2012an de guhertineka helwêst û bilindîya deng heye.

Di yê dawî de, Ebbas bi awayekî eşkere şiklê axaftinê ya protestovanên filistînî bi kar tîne. Ew Îsraîlê ne bi tenê wekî "dagîrkera kolonîyal" terîf dike çawa ku di axaftina 2011an de kiribû, lê belê wê bi pêkanîna tedbîrên "apartheid" û pêkanîna "paqijîya etnîk " li Qudsa Rojhilat û li erdên mayî yên dagîrkirî terîf dike. Heta wê demê Ebbas hewl dida van peyvan bi lêv neke. Heta 2011an wî hewl dida destê xwe "dirêjî hikûmeta Îsraîlî û gelê Îsraîlê bike daku aştîyê pêk bînin…aştîyeka xwe dispêre mafê wekhevîtîya her du dewletên cîran –Filistîn û Îsraîlê". Sala 2012an ew yekser hikûmeta îsraîlî gunehbar dike bi "redkirina çareserîya bi du dewletên cihê" û bi " pûçkirina maneya lihevkirinên Osloyê". Ew lê zêde dike ku Îsraîlê birêveberîya filistînî lawaz kir, û jê jî xirabtir Îsraîlê soza felaketeka nû da filistînîyan, soza Nakbayeka nû". (5)

Bi nêzîkatîyeka bi vî rengî, Ebbas bersiva rabûna hêrsa gel li hember Peymana Osloyê û li hemberî besîtbûna ketina nav muzakereyan bi Îsraîlê re da tevî ku erdên filistînî hê dagîrkirî bûn. Hildana dengê xwe di 2012an de, herweha îşareta dilşkestina wî ye li hemberî hişkbûna Îsraîlê ku ji ya xwe daneket xwar, di cîvîna dawîyê ya muzakereyên ne fermî de ku bi destekdana Urdunê kanûna paşîn a 2012an pêk hat, tevî ku avakirina xanîyên nû ji bo dagîrkirinê hê didomandin. Di vê civîna dawîyê de Îsraîlê redkirina parvekirina Qudsê û redkirina wê ya jidestdana kontrola deşta Urdunê dubare kiribû, di heman demê de, cara yekem Îsraîl behsa daxwaza xwe ya standina ji destê Filistînê ya tevahîya taxên mezin ên cihû lê dijin li herêma Şerîa Rojavayê kiribû, eger dewleteka fîlîstinî li wir bi cih bibe. Li gor agahdarkirina Ebbas li RNYyê di axaftina 2012an de, plana dawî ya sînorên filistînî ku Îsraîl amade ye bide wan, planeka "taxên filistînî …yên bi temamî di bin kontrola dagîrkirina kolonyal ya leşkerî de ne û navên nû li wan hatine kirin, wekî plana yekalî ji bo qaşo dewletê bi sînorên dem kin". (6) Ev redkirina peşnîyaza Netanyahu, herweha tê maneya bi awayekî neyekser redkirina nexşeya rê ya li qada navneteweyî hatî dîyarkirin e, ew dewleteka filistînî ya xwedî sînorên demkin qebûl dike.

Axaftina Ebbas a sala 2012an, herweha nîşana hêrsa wî ye li dijî civata navneteweyî û bi awayekî ne yekser li dijî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Ev dengê bilind, di axaftina wî ya 2011an de tunebû, wê demê hêvîyên ku serhildanên ereban sedema wan bûn hebûn, lê ew êdî neman. Tevî ku di axaftina xwe ya 2011an de Ebbas ji bo bi roleka girîngtir rabe û pêvajoya aştîyê ji nû ve bide destpêkirin civata navneteweyî vedixwend, ew civata navneteweyî gunehbar dike bi "destûrdana Îsraîlê da ku timî bêberpirsîyar tevbigere û bêceza bimîne", bi dayîna di pratîkê de ya "destûreka ji dagîrkirinê re da ku siyasetên xwe yên standina erdan ji destê filistînîyan dewam bike û… bicîhkirina sîstemeka apartheid li dijî gelê filistînî pêk bîne". Ew bang li civaka navneteweyî dike da ku berpirsîyarîyên xwe bigire ser milên xwe û biryarên girtî pêk bîne ji bo avakirina dewleteka filistînî ya World Bank (bankaya Cîhanê) û IMF (Fona Pereyan ya Navneteweyî) mimkinbûna wê piştrast dikin.

Belkî ya herî balkêş e ku cara yekem e Ebbas dibêje, yekane rêya aştîyê ew e, "divê berî her tiştî li ser fikra şermezarkirina kolonîzekirinê bi rêya bicihkirina malbatên ji etnîsîteyeka din, divê were cezakirin û boykotkirin da ku bi temamî were rawestandin". (7) Di vê çarçoveyê de weha dîyar e ku wî banga civaka sîvîl a filistînî ji bo boykot, destûrnedan û cezakirina Îsraîlê bihîstîye. Ew ji dubarekirina xwe ya 2011an ya dilsozîya filistnîyan bi têkoşîna zexm û bê şidet wêdetir çû.

**Tu bi ku ve diçî ?**

Pirsa hê divê bersiva wê were dayîn ev e, çi fêdeyên siyasî yên serlêdana li RNYyê hene ji bo Rêveberîya Neteweyî ya Filistînî û gelo ew dê kîjan rêyên fermî bi kar bîne ji bo bike ku RNY biryara cezakirina navneteweyî ya Îsraîlê bide? Wisa xuya ye ku filistînîyên herêmê ev erk dane rêveberîya xwe. Hilbijartinên şaredarîyê yên di çirîya paşîn de li Şerîa Rojavayê li dar xistî, piştrast kirin ku rewabûna El-Fetîhê kêm dibe; li bajarên mezin wekî Nablus, Ramallah û Jenin bi ser ket bi namzedên serbixwe. Dîsa jî hejmara bilind a dengdana di hilbijartinan de nîşana biryardarîya fîlîstinîyan e ji bo mafên xwe yên azadî û rûmetê biparêzin, projeyeka dewletbûnê hebe jî tune be jî.

*Zanîngeha Massachusetts li Bostonê

(1) Leila Farsakh, *Searching for the Arab Spring in Ramallah / Lêgerîna li Bihara Erebî li Ramallahê*, Jadaliyya magazine at http://www.jadalîyya.c.jadalîyya.com/pages/index/4438/searching-for-the-arab-spring-in-ramallah

(2) Binêre li Karma Nabulsi, "The single demand that can unite the Palestinian people / Yek daxwaza ku dikare filistînîyan bike yek", *The Guardian*, 28ê Adara 2011an, Maan, "Youth Gather for Global Meet on PLO Elections / Ciwan ji bo serferberîya giştî ya ji bo hilbijartina Rêxistina Rizgarîya Filistînê dicivin) 9ê kanûna paşîna 2012an li ser malpera http://www.maannews.net/eng/ViewDetails.aspx?ID=451284 û https://www.facebook.com/events/129824823801784/

(3) Binêre li danezana El-Herake El-Şebabî û li PNGOFê di 24ê kanûna paşîna 2012an de weşandî li ser malpera http://www.facebook.com/Herak.Shababi û palestiniansfordignity@gmail.com

(4) Axaftina Mahmûd Ebbas li Civata Giştî ya RNYyê 23yê îlona 2011an li ser malpera http://www.haaretz.com/news/diplomacy-defense/full-transcript-of-abbas-speech-at-un-general-assembly-1.386385.

(5) Axaftina Mahmûd Ebbas li Civata Giştî ya RNYyê 27 îlona 2012an li ser malpera http://english.wafa.ps/index.php?action=detail&id=17480

(6) jêdera li jor navbirî.

(7) jêdera li jor navbirî.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

# Siberoja Çînê

## MARTINE BULARD

Heke destnîşankirina koma nû ya birêveber a çînî wisa dîyar e daxwazeka pêkanîna reforman derbibire jî, dîsa jî perdeya sir û razê ya li ser rêya ku Pekîn wê bikaribe (yan jî bixwaze) bide ber xwe bi temamî li pêşîya me ye. Ev blokajên heyî û yên mimkin e pêk werin ên ku di malzarokê de bi pêş dikevin, ji wan mijaran in ku *Rêya Çînî* (1) ya Michel Aglietta û Guo Bai daye ber xwe da ku wan ji hev derxe; Aglietta aborîzanekî zanîngeha Parîs X-Nanterê yê dinyadîtî û xwedî rûmet e û yê din jî doktoranteki ciwan e û ji zanîngeha Pekînê mezûn bûye. Ev ceribandin wekî romaneka polêsî nayê xwendin, lê belê ew dîsa jî referansek e, lewra nivîskaran xwe berdaye heta bi binê dîroka çandî siyasî ya Çînê da ku li dagîrkirina dika cîhanî ji alîyê Çînê ve serwext bibin û derfetên wê yên nûkirin û nûbûnê binirxînin.

Yek ji xalên herî hêja yên vê berhemê ew e ku ji wê wergera pîroz xwe xelas kirîye, ya ku dibêje birêveberên çînî welat xistine nav kapîtalîzma hov, van jî bi enerjîya yên nû îman bi kapîtalîzmê anîn û kulma dîktatoran kirin. Agiliettayê ku dilsoz e bi xebatên xwe yên berê yên der barê sererastkirinê de bi bîr dixe ku bazar xwe bi kapîtalîzmê îfade nake, her du pir zêde girêdayî hev jî bin. Nivîskar henekên xwe bi şirovekeran dike yên ku "*bawer dikin Çîn qulibîye û îman bi kapîtalîzma bazarê anîye*" ya ku mebesta wê ew e ku bivênevê ber bi "*demokrasîya bi nûnerîyê ya rojavayî*" ve bibe: "dawîya dîrokê" versîyona çînî... Ew îşaret pê dikin ku aborîya bazarê li Çînê ji sedsala 9an û pêve daye der û kapîtalîzmê jî xwe li wir bi cih nekiriye, sîstema împaratorîyê û burokrasîya wê pêşî lê digirtin ku pere werin berhevkirin. "*Di împaratorîyê de çînên civakî nebûn*", û "*amadekirina mal û milkên kolektîf hevgirtina neteweyî misoger dikirin*".

Pêla pêşî ya pîşesazîyê ya di bin birêveberîya Mao Zedong de, tevî dramên siyasî jî wê şahidî bikira li rêjeyên mezinbûnê yên ku nisbî têra xwe zexm û xurt bûn, siyasetên tendirustî û perwerdeyê bi xwe rê li ber encamên pir hêja vekirin (sala 1952yan % 80yê xelkê welêt nexwende bû, ev rêje sala 1978an daketibû % 16an). Çawa ku doh împarator û mandarînên wî dikirin, êdî Mao û komunîstan yekîtîya neteweyî dihunand. Birêveberên ku sala 1978an reform ji gundewarîyê dan destpêkirin xwe dispartin vê rastîyê. Asta jîyanê ya gundî û cotkaran wê bilindtir bibûya, vê jî wê rêyên partîyê dayî ber xwe rewa bikira. Nivîskar weha rave dikin ku ya ku hingê serketin misoger dikir ne vegera li bazarê bû lê belê struktûrên sosyalîst bûn.

Lê belê dema mijar ne gundewarî belê bajar bûn, yan jî bi awayekî tekûztir meriv derbibire, mijar ji birêveberîyan çêkirina şirketên tîcarî û bihayên veguherandî karan bûn, hingê nakokî pir zêde dibin: înflasyon, daketina dahata reel... Partî li vir bi ser nakeve. Tankên tepisandinê berîya ku ji sala 1992yan û pêve reform ji nû ve dest pê bikin, xurt dike; ji bo qonaxeka duyemîn berê xwe dide derve, a ku bi krîza malî ya cîhanê ya salên 2007-2008an bi dawî bû. Sêsed milyon meriv ji perîşanîyê rizgar dibin; Çîn dibe hêza duyemîn xurt a aborî ya cîhanê, lê belê berdêla vê hevnegirtinên bi tehlûke bûn: newekhevîyên civakî, zirarên li hawîrdorê, deyndarîya kolektîvîteyên xwecihî...

Bi her halî dewletê amûrên desttêwerdanê (bacstendin, fînans, lêkolîn...) parastin û heta ava kirin, ev jî dibe ku destûrê bidinê ku xwe biqevêze qonaxa bê. Lewra li gor nivîskaran armanc ne piçûkkirina dewletê ye, belê ew e ku cihekî orîjînal û bikêrhatî bidin dewletê li kêleka sektoreka taybet a ku li gor usûlê birêkûpêkkirî ye, da ku aborîyeka têkelhev a ku tê de motorên sereke wê bipêşxistina "sermayeya insanî", mezinbûna ekolojîk û bajarbûna kontrolkirî bin. Serketin wê bi kêrî "*demokrasîya bi rastî*" were, a ku "*destûrê dide welatîyan misêwa tevlî rewşên darîçav ên jîyana rojane bibin*"...

François Godement di *Çîn çi dixwaze?* (2) de dîagnostîkeka bi heman rengî nake. Dîrokzan û pisporê qebûlbûyî yê vî welatî û herêmê bi deqîqîyeka mezin koz û astengîyan analîz dike. Bi vî awayî ew tevahîya bipêşketinên aborî û civakî yên deh salên desthilatdarîya serokkomarê Çînê yê berê Hu Jintao qebûl dike, lê belê ew nîşan dide ka çima "*ev dehsaleka ji destdayî*" bû ji bo reformên siyasî, tevî ku civak hişyar dibe, a ku tecrûbeyên wê yên dijberî û tevlîbûnê terîf dike. Di dawîyê de ew ji sed rûpelekî werçerxa dîplomasîya çînî ya sala 2009ê dineqîne, armancên wê, dengvedanên wê di nav xelkê de, tehlûkeyên wê...


(1) Michel Aglietta û Guo Bai, *La Voie chinoise,* Odile Jacob, Parîs, 2012, 432 rûpel, 39.90 euro.

(2) François Godement, *Que veut la Chine ? De Mao au capitalisme / Çin çi dixwaze? Ji Mao ber bi Kapîtalîzmê ve*, Odile Jacob, Parîs, 2012, 283 rûpel 22.90 euro.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



MOHAMMAD ISMAIL: **Bênav**, boyaxa akrîl li ser tûwalê, 50 x 70 cm




# NAVEROK
## KANÛNA PÊŞÎN 2012



Bihara ereban, Sûrîye û kurd
DOÇ. DR. ABDULLAH KIRAN
▶ R. 1

Salih Muslim: Hêzên me ji bo her cure geşepêdanê amade ne!
ALÎ GÜLER
▶ R. 1

Li Xezzeyê her tişt hêsan e...
SERGE HALIMI
▶ R. 2

Jacques Rancière, huner û siyaset
ALIOCHA WALD LASOWSKI
▶ R. 2

Dawîya "stratejîya başûrparêz" li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê
JEROME KARABEL
▶ R. 6

Ewropaya li hemberî hegemonyaya alman
PERRY ANDERSON
▶ R. 7

Mîrasgirên Blairîzmê
KIRASEITH DIXON
▶ R. 8

Lêkolîna bi pereyên gelemperîyê, kovarên taybet
RICHARD MONVOISIN
▶ R. 9

Ji kurdên Iraqê re xweserîyeka çawa?
MICHEL VERRIER
▶ R. 10

Cendirmeyeka hêza nukleer a pir kêm serbixwe
AGNÈS SINAÏ
▶ R. 12

Fukuşîmayê çawa kartên lîstika nukleerê yên cîhanê ji nû ve li nav hev xistin?
DENIS DELBECQ
▶ R. 14

Çi ji ber sînorên welatên afrîkî ma?
ANNE-CÉCILE ROBERT
▶ R. 16

Dema ku Filistîn red dike ji holê rabe
LEILA FARSAKH
▶ R. 18

Siberoja Çînê
MARTINE BULARD
▶ R. 19

ÇAND Û HUNER
▶ R. 20

LE MONDE
*diplomatique*
*kurdî*

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €
(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

# ÇAND Û HUNER

## "Ristika Morîkan" ango ristika bindestîyê

ŞENGUL OGUR

Meriv bi tenê bi naveroka hunerê xwe nagihîne bingehên wê yên sosyo-polîtîk, lê herwiha bi forma hunerê jî meriv dikare xwe bigihîne bingehên hunerê yên sosyo-polîtîk û xwendineka sosyolojîk li ser forma wê bike. Ji ber vê jî Fredric Jameson di berhema bi navê *Marksîzm* û *Form*ê de, rexneyeka li rexneya marksîst dike ku bi tenê xwe li ser analîza naverokê ava kiriye: '' Bi vî awayî Engels, weha ji dîroka civaka fransiz a ku bi destê Balzac hatîye xêzkirin behs dike , ''di kitekitên wê yên ekonomîk de jî (mînak, piştî şorişê belavkirina mulkîyeta rasteqîn û taybet) ji dîrokzanên profesyonel yên wê demê û îstatîskvanên wê demê hemûyan bêhtir hînî tiştan bûm'' piştî vê gotina Engels, Jameson weha dibêje; ''Lê rexneya marksîst a hevçax tiştê ku Engels ji naverokê hîn bûye, divê bikaribe nîşan bike ku di forma wê de jî veşartiye''.

Tiştê ku Jameson di derbarê rexneya marksîst de gotî ji bo rexneya me jî derbas dibe, ango divê em jî bikaribin forma ku di hunera kurdî de xwe nîşan dide li ser sosyo-polîtîkaya Kurdistanê bidin rûniştandin. Loma bi ya min bandorên rewşa real a sosyo-polîtîkaya Kurdistanê niha ji naverokê bêhtir xwe di formê de nîşan dide. Di nav vê çarçoveyê de dema ku em bi vî çavî li berhema Ristika Morîkan a Fatma Savci binêrin, ez dikarim bibêjim ku di vê pirtûkê de naverok di formê de terisîye, xwe bi formê derkiriye. Jixwe Hegel jî di berhema bi navê Estetîkê de vê dibêje; ''Her naverokeka nû di formeka nû de diterise''

Ristîya Morîkan a Fatma Savci jî di vê formê de diterise. Forma ku di vê berhemê de hatiye bikaranîn xewn e û awayê derbirîna xewnê jî sembol in. Di çîroka pêşîn a Ristika Morîkan de vebêja çîrokê, hevala xwe ya bi navê Êvar vedixwîne malê, dema ku Êvar tê mala vebêj û Êvar lênûska li ser maseya mitbexê dibîne, ji vebêj dipirse: '' Ev rojnivîsk e nexwe? Dibeşişim û dibêjim: Na, ev xewnnivîsk e.'' û Êvar dipirse bê ew dikare vê ''xewnnivîskê'' bixwîne yan na û piştî bersiva erênî Êvar dest bi xwendina ''xwennivîskê'' dike. Çîroka pêşî nîvco dimîne û çîroka pêşî ya nîvco mayî bi çîroka dawî ya bi navê ''Xewna Nîvco'' diqede. Di navbera çîroka pêşî û ya dawîyê de 10 çîrok hatine bicihkirin. Em jî ji vê berhema Ristika Morîkan re ku vebêj jê re ''xewnivîsk'' gotiye, dikarin xewnnivîsk bibêjin. Loma hemû çîrokên di vê berhemê de xewn in. Bi hêmayên xewnê, bi sembolan hatine nivîsin.

Freud di berhema bi navê Şiroveya Xewnan de ji Burdach weha radigîne: '' Bi kêferat, hez, kêfxweşî û êşên xwe, jîyana rojane di xewnan de qet dubare nake. Berovajî vê, armanca xewnan ew e ku me ji jîyana rojane bi dûr bixîne. Dema ku hişê me bi temamî li ser tiştekî hûr dibe, dema ku meriv dikeve nav kul û xemên kûr, yan jî dema ku hemû hêza me ya hişî bi pirsgirêkekê mijûl dibe jî, xewn xwe bera gîyanê meriv didin û ji bilî bi rêya sembolan derbirîna rasteqînîyê tiştekî din jî nakin.''

Bandorên şer û bindestîya domdirêj a Kurdistanê helbet di hemû beşên hunera kurdî de wê xwe bidana nîşandan û gav bi gav em di wêjeya kurdî de rastî li şopên travmayên bindestîyê, rastî psîkolojîya şer tên.

Di berhema bi navê Ristika Morîkan de, em bi qelema jineka kurd, bi devê vebêjeka jin , bi rêya xewnan, bi sembolên ku hatine bikaranîn, rastî êşên bindestîyê tên ku çawa gîyanê me hatîye kerîkerîkirin, ku çawa jîyana me ya rojene li me bûye şevreşkek. Ji bo vê jî berhema bi navê Ristika Morîkan terisîna sosyo-polîtîkaya Kurdistanê, a li qada wêjeyê, bi rêya formê ye.

Vebêj, di çîroka Mûm û Fîstanê de, wekî ku bixwaze êdî dawî li bindestîya Kurdistanê were piştî ku jinên ku bi çiçikên xwe mûman vêdixin dibîne, piştî ku qesrên ji diranan lêkirî dibîne û êdî hew dikare vê xewnê ragire, di dawîya çîrokê de weha dibêje; ''Ev çi xewna demûşî bû? Hêrs dibim, dibaecim. Xwe neçar hîs dikim. Bîn çikîyayî û devê min ziwa, heya ji min tê car din diqêrim: Hewar e! Min ji vê xewnê xelas bikin!''

Fatma Savci
Ristika Morîkan
Avesta 2012

www.arsivakurd.org